Feqi Huseyn Sağnıç

Hêmana

RÊZIMANÊ KURDÎ

Institut kurde de Paris

MELSA Yayınları

Institut kurde de Paris

Feqi Huseyn Sağnıç

Hêmana RÊZIMANÊ KURDİ

Institut kurde de Paris

MELSA Yayınları

MELSA Yayınları : 10

Birinci Baskı: Mart 1991
Dizgi: DİZ Basın Yayın 512 36 68
Kapak ve İç Baskı: GÜLŞAH Matbaası

MELSA Yayınları
Mustafa Kemalpaşa Cad. Yıldırım Palas Han No: 17/9
Aksaray / İstanbul

Institut kurde de Paris

Feqi Huseyn Sağnıç

LIV KL 22 703
18/07/2017
812 SAG HEM

Hêmana

RÊZIMANÊ KURDÎ

INSTITUT KURDE de PARIS • BIBLIOTHÈQUE •

Institut kurde de Paris

MELSA Yayınları

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS • BIBLIOTHÈQUE

Institut kurde de Paris

Ocak 1991'de birinci baskısını yaptığımız ve ardından hemen toplatılan Kürtçe Öğrenme Metodu adlı kitabın da yazarı olan Feqi Huseyn Sağnıç'ın bu eseri, ilk çalışması olmasına rağmen, bazı yasal zorluklar nedeniyle ancak ikinci kitabından sonra yayınlanabildi. Kürt dili ve kültürü üzerine çalışmalarıyla tanınan Feqi'nin bu eserini yayınlamakla Kürt dilinin öğrenimi ve gelişimine katkıda bulunduğumuza inanıyoruz.

MELSA Yayınları

Institut kurde de Paris

Pêşgotın

Zman jı çar endamên netewi (zman, welat, çand û bazar) endameki jı gişkan gringtıre. Zman çeka serbesti, serxwebûn û serfıraziya gel û netewiye. Zman neynıka çand, pişe, dilan, wêje, afırandın û pêşve çûnêye. Zman pergala peyıvin, hev nasin, hev serwext krın, nvisin, xwendın, hin bûn û hin krınêye. Zman rêçenasê rêzani, peyman, danıstan, lêkhatın, lêkanin û gişk tevgerên mrofaniye. Bı kurtasi bıbêjin merıf çı heyinên xwe wında bıke hınde heyinan wında dıke, lê gava zman wında bıke gişk heyinên xwe wında dıke. Çı heyinên netewi ji wında bıbıt zman dıkare wê vegerine lê gava zman wında bıbıt tu heyin nıkare wi vegerine.

Şxwe tête zanin ku pşafker, dema alaziya pşaftına geleki û neteweki bıkın, pêşi radıhıjne zmên. Lewra ew gelek rınd dızanın ku dema zman pşıvi ew gel û netewe bê çek, bê neynık, bê pergal û bê rêçenas dımine, êdi nıkane tu şeri bıke û dı cida dımıre.

Neteweyên Dni bı sedan sal emek lı zmanê xwe dane, wêjeya xwe zengin, xezina peyvan freh, teknıka zmên tekûs krıne û bı pêkanina van zanin, pişe, tevger û şehrezayi pêşda brıne. Me heta nha jı zmanê xwe zêdetır emek lı zmanê biyaniyan daye û hê ji dıdin. İro ji gelekên jı me zmanê biyaniyan jı yê xwe çêtır dızanın. Qey ne bese.

Me lı jorin "neteweyên Dni teknıka zmanê xwe tekûs krıne" go-

tıbû. Heçi zmanê me tekûs krın naxwaze. Lewra tekûsiya teknıki dı hêmana zmênda heye. Teni pêgeran dıxwaze. Bı şanazi dıbêjım ew qaydên dı vi rêzımanida ci gırtıne, bı lêgeranên curbecur me jı hêmana zmên derêxıstıne. Jı ali mınve yek qayde ji ne hatiye çêkırın. Disa bı şanazi dıkarım bı bêjım jı ali teknıka zmênve zmanê me pır dewlemende. Şxwe çend sed salın ev şerê gran me hıştiye ser mlê zman heta iro ji berxwedan û jı şer krına wi ji dewlemendiya wi tê zanin. Dıvê jı vê dewlemendiyê em wec bı binin û wec bıdine zmanên biyaniyan ji. Ew ji pzo bı xebatên hêjayi pêktên. Çawan me pêkanina şolan gişk hıştiye hêviya cwanan, ev ji wlo maye hêviya wan. Gumandarım cwanên me vê xebata hêjayi ji dê pêkbinın.

Dı temenê sêzdehêda bûm, sala 1938 an çûme medresê. Mın dit ku graniya wanên qutabiyan rêzımanê Erebiye. Mın jı hevalan pırsa rêzımanê kurdi dıkır lê bersıvek qenc ne dıstand. Hnekan "em nızanin", Hnekan "me ne bhistiye" û hnekan ji "ne guncane rêzımanê Kurdi hebıt û bıbıt ji" dı gotın...

Lı ser vê yekê jı wê rojê vırda hêdi hêdi mın dest avête rêzıman û peyvan. Dı pri demanda mın dabaşa cvatan dıfetılande ser qaydên rêzımên û zanina peyvan. Pışti 1960 an xebata Kemal Badıllı ser rêzımên mın bıhist û gava mın xebata wi dit gelek şah bûm û bı dlek xweş û geş mın notên xwe gişk danê ku xebata xwe baştır û tekûstır bıke. Misoger Badıllı gorê guncanên wê rojê rêzımanek qenc nvisi û çapand.

Pışti 1970 êyê hınde heval lı ser mın pır sekının û jı mınra "dı demên borida xebata te ser zmanê Kurdi hebû. Heke hınde ji xwe bıwestini tuyê rêzımanek qenc bıkarıbi çêki û chê vala mayi tji bıki" Hındekan ji "jıbıl nvisandına rêzımên û ferhengê tu kêri tu şolê nayê" dıgotın.

Lı ser vê yekê gelek ponıjim û mın bıryara xwe da ku alikari jı zanan bıxwazım û dest bı rêzımên bıkım. Gava mın dit ne welê bû. Jı zanayên dı gumana mıda heyi mın wecek kêr hati ne dit. Bı teni Mele ismet wecê mın gırt, hım alikari hım ji dı çewti drıst krınêda gelek kêrê mın hat. Bı vê rewşê ketım nav vê xebata piroz.

Gava mın bergerana xwe pêkani û dest bı nvisandınê kır, xwiya

Institut kurde de Paris

ku ev ji ne hêsane. Lewma metnên bı Kurdi nvisandi şxwe kêm peyda dıbın, qasi heyi ji û jı nvisandına xwe ya rojek beri ji bı hêsani mın ne dıkariya wec bıbinım. Lewra geleke ne lı bal mın bûna. Bı vi tırs û weywelê nvisandına vi rêzımani sala 1978 an qeda. Vêca lı çara çapandınê geram.

Jı xwendevanan xwestına mın: Ne bı rık û ne ji bı bexşendeyi lı vê pırtûkê menêrın. Bı ponıjinek gran qenc bıxwinın, qenc fehm bıkın, paşi kêmasiyên dı pırtûkêda heyi û rexnê xwe jı mınra bışinın. Vê yekê eger hûn jı mıra bıkın dê pır dılxweş û bextiyar bım.

Dabaşekê gring ewe ku dı vi rêzımanida hınde rasnıvis û qaydên qlasiki hatıne guherandın. Dı hezra mında vê guhertınê hê têrê ne kıriye dıbe ku hınde ciyên dın ji bêne guherandın. Şxwe rasnıvisa zmanê Kurdi hê rûnenıştiye. Pêgerên nû hınde qayde û rasnıvisê nû bıbinın ne sodrete. Qenc bala xwe bıdıne zmanên netewcyên Dni ku sedan salın rêzımanên wan hatıne çêkırın, rasnıvisa wan hatıne ditın û rojê sedhezaran pırtûk, kovar û rojname bı wan têne nvisandın, disa hınde qayde û rasnıvisa hınde ciyan têne guherendın. Nexu çawan her bûyin û heyin dı hundırê xweda hergav tekamûl dıke wsan zman û rêzıman ji dı vê rêzıkêda dıherıke.

Misoger dıvê bête zanin ku ev guherandın ne jı xwestına kêfa mın, jı xwestına hêmana zmên derketıye. Teni peywıra mın pêgeran, ditın û nvisandın bû. Heke bı kûrayi lı hêmana zmên bınêrın hûnê van qaydan an wha û hınde qaydên dın ji bıbinın.

Jı bıl navdêra cinavkê navdêrên rêzımani yên qlasiki ne hatıne guherandın.

Pıştı dane nasina zman, rêzıman, hevok, peyv, kite û danina elfabeyê dgel hınde qaydan me dest bı nıvisandına navan kır. Jıbo hesineyê beri parçek xwendınê, jıbo hılbıjartına navan kovana egiteki hate danin. Paşi nav dgel çıngılên navan hatıne vekıtandın. Cinavk û rengdêr ji bı vê rewşê gişk ji bı vekıtandınekê kurt hatın danin. Lêker ji mina nav, cinavk û rengdêran pêşi parçek xwendınê dûra metnek hılbıjartınê paşi dest bı celebên lêkeran hate kırın. Jıber ku celeb û peywırên lêkeran zêdene lı ser sekınin ji zêde xwest. Bı vekıtandınekê kurt lêker û rawe hatın danin. Lêkera bûn û lêkera hebûn heryek bı têgıhan û drûvên xwe hatın vekıtandın.

Institut kurde de Paris

Heke teng ji bıt hoker, daçek, baneşan û nıqteşani hatın danin. Û hınde taybetiyên wan hatın vekıtandın. Lı ser hevokan ji qederek dabaş hate krın. Hevokên navdêri û hevokên lêkeri dıgel taybetiyên xwe hatın danin û heke kurt ji bıt têgıhanên van yên curbecur hatın nmandın.

Kijan daneka dabaş jê hati krın wekokên wê ji hatın danin. Graniya wekokan bı tabloyan pêk hatıne. Ew peyvên ku jı ali herkesve nayne zanin û dgel gişk navdêrên rêzımani bı ferhengi lı dawiya pırtûkê hate ci krın.

Ev pırtûk afırandına mın ya pêşine. Guman dıkım ne ya paşin bıt

Feqi Huseyn Sağnıç
21.3.1978

Institut kurde de Paris

WANE I

ZMAN ÇİYE?

1. Heke bı kurtayi bersıva vê pırsê bête dan: Zman pergala hev serwext kınnêye. Pergalek welêye ku jı zayinê heta mırınê jı her keskra mina xwarın, vexwarın û wergırtınê peywıstiye. Jı jina kıflet bıgıre heta jina cvati, jı aboriya malê bıgıre heta aboriya dewletê, dı her gehinekekda zman wek heyinên bıngehin peywıra xwe dıbine. Zman bı vê ji ranaweste, çand, pişe, şehrezayi, pıspori, bı kurtasi jı kes û cvatanra çı bıvê, gişk dıgehine û pêşve dıbe.

Zman ne malê ref û tebeqek cvati û ne ji malê sazımaneke. Pzo zman dı gişk ref û tebeqên cvati û sazımananda, wek heyinên bıngehinên wê ref, tebeqe û sazımanê dıdome.

Qenc bala xwe bıdınê ku bı guhertına sazımanan zman naguhere, heta dewlemend dıbe, dıxemıle û pêşve dıçe. Jina komûnotê dervazê sazımana koledari, sazımana koledari dervazê sazımana feodali, sazımana feodali dervazê sazımana sermayedari bû û dı heryek van sazımananda abori û rewşa hılberiyê hatın guherandın, abori û hılberi gorê sazımanan drûvên xwe gırtın, disa şoreşa "oqtobrê" dı sala 1917 handa lı çaritiya Ûrıs pêkhat û Soviyeti hate hmatê. Abori û hılberi gorê sazımana karkeran hate guherandın lê

dı gişk van sazımananda zman herweki xwe ma. Bı teni heryek van sazımanan peyvokên xwe lê zêde krın û xemılandın.

Vaye jı roja komûnotê heta roja me zman dı bın xızmeta gel û refên cvatida xebata xwe kriye û dıke. Jı ber vê yekê dıvê herkes lı ser zmanê xwe yê taybeti bısekıne û pêşve bıbe. Lewra jıbo ghiştına jina wek hevi, pêşve çûna gel û çanda gelêr dıvê. Pêşve çûna gel û çanda gelêr ji pzo bı zmanê gelêr pêktê.

Jı kûraya mêjoyê (dirokê) hetani roja me, karbıdestên neteweyên serdest bı gişk finfonekên zordariyên xwe, lêxebıtine ku bı zman û çanda neteweyên xwe, netewe û gelên bındest bıpışêvın (asimile bıkın). Netewe û gelên bındest jı hım ber xwe dane ku nepşıvın hım ji jı bê çaretiyên xwe zman û çanda netejeyên serdest xwendıne lê pêşve ne çûne û naçın ji. Şxwe tê zanin ku yek kesên gelan dı nav zman û çanda biyanida bıgıhijın ji, çara bı tevayi gel ghiştınê tune û heta nho recetek wha ne hatiye nvisandın û nayê ji.

Jıber vê yekê dıvê ku herkes jı zmanê xwera xebatkar û jı zmanê gelê dınra ji berêzkar bıt...

ÇÊBÛNA ZMAN Û RÊZIMÊN

2. Dı nav candaranda ınsan heyinek welêye ku dıponıje, serwext dıbe, serwext dıke, hin dıbe û hin dıkeye. Jı van taybetiyên xwe ınsan jı heyinên dın cdaye. Şxwe zanayên beri: "Insan bı ponıjin û hzırinê jı heywanan cda dıbe" dıgotın.

Insan dı nav cvatêda dıji, jıbo pêkanina şolên xwe yên curbecur dıviyabû ku bı kesên hawirê xwera bıpeyive, wan serwext bıke jı wan hin bıbe û wan hin bıke. Heta ınsan bı vê ji ne sekıniye û nasekıne, dıxwaze ku xwestına xwe bı heywanan ji bıde fehm krın. Jıbo pêkanina van xwestınan, ınsanan zman afırandıye.

Dı demên kevnareda ınsanan, pêşi bı işaretên curbecur hev serwext krıne, paşi hêdi hêdi bı ali denganve çûne, pêşi dengên xwerû, paşi hêdi hêdi bı aliyê peyvanve şemıtine, pışti pêkanina peyvan, hevok û dûra ji wêje (edebiyat) anine hmatê. Zman hê ji ne

rawestaye, rojbıroj pêşve dıhenke û xwe nû dıke, dıçe.

Ew ışaretên kû kalên me bıkaranine, me hê ji beşek jı wan jı bir ne kriye û em bıkartinın. Mina: Jıbo erêniyê serê xwe bı ali jêrve, jıbo neyiniyê ji bı ali jorve dıhejinin. Dı şûna hereyêda em destê xwe bı ali derve, dı şûna wereyêda bı ali xweve dıhejinin. Gava kêfa me xweşbe berken dıbin û gava kêfa me ne xweş bıt eniya me dıqırmıçe. Beşek jı wan dengên ku em bıkartinin ji, mina: "hah, hı, ax, ox, wax, of, oy" û êd. jı wan dengên kevnarene.

Çqas berkêşan û pergalên berkêşanê pêşve dıçe tekûs dıbe, zman ji gorê wan xwe dıgıhijine û dıxemıline bı wanra dıçe. Lewra heyinên nû derdıkevın û jı wan heyinanra peyvok dıvên. Jıber vê yekê peyvên çend sal beri têra peyıvin û nvisina iro nake.

Vaye zman bı berkêşanêra serbıser dıhenke. Çawan berkêşana gelên paşve mayi paşve mayiye, wsan zmanê wanji paşve mayiye. Dı qutbê başûr û bakurda gelên paşve mayi, berkêşan paşve mayi û zman paşve mayi hene, teni jı heyinên dorê xwe dıkarın baxêvın.

Pışti pêşve çûna berkêşan û ınsanan, êdi peyvan û hevokên xwerû bı serê xwe têra peyıvin û tevgerê ne krın. Vêca rêzıman kete bernamê. Rêzıman ji jı hêmana zman hate derêxıstın. Lewra dı zmanekda gava xezina peyvan zêde û freh bû, êdi bê rêzman nayê têgıhan. Rezıman ji gorê pêşve çûna hılberi û cvatan xwe nû dıke û pêşve dçe. Vaye edebiyat, afırinekên edebi teknıki bı rêzmanên drıst pêktên. Pişe, abori, rêzıman, çand, peyv, edebiyat û êd. Gişk bı zmênve grêdayine. Zman ji gorê berkêşanê xwe nû dıke, xwe tekûs dıke û xızmeta berkêşanê dıbine...

CELEBÊ ZMANAN
Û
ZMANÊ KURDİ

3. Celebên zmanan hıngi hejmara cvatanın. Dı dınyayida çqas cvat hene, heryek jı wan xwedi zmanek taybetiye. Heya nha bı vebır hejmara cvat û zmanan ne hatıne zanin lê bı qasi duhezarûpênsedi jortır hatıne senıfandın. Jı van bı qasi sedûpênciyi jê

Institut kurde de Paris

zmanê dewletanın. Dı mêjoya kevında zmanê Kurdi ji zmanê dewletê bû. Nho ji lı Eriwanê û lı Iraqê jı zmanê resmi tê hejmartın.

Dı navbera zmananda çqas nizıkayi hebe ji disa heryek xwedi xezinek peyvan û nemaze xwedi rêzımanek taybetiye. Dı navber cvatanda çawan danıstana abori heye, wsan ji danıstana peyvan heye lê rêzıman dgel qaydên xwe jı zmanek nıkare bıçe zmanek dın. Bı danıstana peyvan ji zede nagıhije xezina peyvan, heta pê dewlemend dıbe û tesir lı rêzıman ji nabe.

Ev zmanên curbecur û jı hev cda, heryek bı serê xwe pêkhatıne û têne bıkaranin ji lê dı navber wanda deste û deste hınde nizıkayên gring hene. Emê van nizıkayan bı hêmani û drûvi hıldın destê xwe.

4. Hêmana zmanan: Wsan dıxwıyê ku ew zmanên bı hêmani nizıkên hev jı reyek, jı makek derketıne û lêzımê hevın. Gava dı zmanekda peyvek tune bıt jı zmanê lêzım anina wi hêsane û rêzıman ji lı hev têne kemperandın.

5. Drûva zmanan: Dı drûva zmananda lêzımi ne şerte. Têni ew zmanên drûva wan mina hev bın jı drûvek têne hejmartın. Heta nha zman lı ser sê drûvan hatıne pejırandın. Lê hêmanên zmanan cda û cda hatıne ditın.

Hınde zanayên kevın, hejmara hêmanên zmanan heta heftan rakırıne. Paşi dı navbera hêmanên hınde zmananda, hnek nizıkayi xwiyane û hejmar hatıne kêm krın. İro çar hêman têne pejırandın.

Hêman	**Drûv**
1- Hındi-Avropa	1- Zmanê yek kite
2- Çin-Tibet	2- Zmanê bı qertaf
3- Banto	3- Zmanê tewang
4- Ural-Altay	

Hınde zmanzan "Semitik"ê ji hêmanek cda dı pejrinın, ez wlo nabinım.

1- Zmanê yek kite: Lı dû hev rêz krına kitan hevok pêktên. Mina Zmanê çinê.

2- Zmanê bı qertaf: Tipên qurmên peyvan naguherın. Yani

Institut kurde de Paris

qurmê peyvan her wek xwe dıminın û lı pêşi yan ji lı paşiya qurman qertaf têne zêde krın, mina zmanê Tırki: Zmanê Tırki jı zmanê bı qertafa paş qertafe. Wekok: "yap" yap - tı = yaptı, yap - ıyor= yapıyor, yap-acak= yapacak.

3- Zmanê tewangi: Hım tipên qurmê peyvan dıguherın hım ji bı daçek û qertafên curbecur têne tewandın. Mina zmanê Hındi-Avropa.

Zmanê Kurdi bı hêmanê xwe û bı drûvê xwe ji jı zmanê Hındi-Avropêye. Yani zmanê Kurdi, zmanek tewandi yê tip guhere. Vekok: "Kır" kr-ıye= krıye, dı-k-e= dıke, dê bı-k-e= dê bıke.

BRÊN ZMANÊ KURDİ

6. Beri islamiyetê Kurd rûnıştıbûn û lı pişe û çandınayê dıxebıtin, dı warê şehrezayida pêşve çûbûn, dı navbara xweda pır û hındık yekitiya zmên pêkanibûn. Pışti hatına islamiyetê; jıber zordariya eşirên ereban, jıbo xwe parastınê Kurd carek dın ji derketın çiyan û jı nûve jina aşireti destpê krın. Jıber vê yekê zmanê Kurdi yê kevın bû çar (4) bır, çar zarava:

1- Sorani (Sori)
2- Lori
3- Zazayi (Dmıli, Dılmi)
4- Kurmanci (Kurdmanci, Kurdmani)

1- Zaravayê Sorani dı bnıka xweda dıbe sê devok: Gelhori, Babani (Babakurdi) û şêxbızıni. Gelhori lı rojavayê İran û dorê Kerkûkê, Babani lı dorê Xanıqin heta xaliça Besrayê rûdının. Şêxbızıni eger bermayek wan dı Iraqêda mabın ji graniya wan lı dorê Trebzonê, Diyarbekır û lı hawêrê Ankarê rûdının.

2- Lori: Lıbaşûr û rojavayê İranê, yani lı dorê Abadanê rûdının.

3- Zaza: Heke dı ıraq û İranêda bermayek wan mabın ji graniya wan lı Dêrsımê heta hawêrê Diyarbekrê rûdının.

4- Kurmanc: Zaravayê Kurmanci jı gişk zaravayên dın frehtıre

û hejmara nfûsa Kurmancan ji jı gişkan pırtıre. Kurmanci lı hawêrê Eriwan û Nexçivanê, rojhılata Tırkyê, bakura Sûryê, bakura Iraqê û rojava û bakura İranê rûdının.

Zaravayê Kurmanci dı bnıka xweda dıbe sê devok: Buhti, Mehmedi û slivi (Glivi). Herçıqas dı metnê kevında dabaş jı van hersê devokan tê krın ji lê iro dı navber wanda tu ferqên grıng naxwıyên. Şxwe dı metnên kevında ji, ne ciyên wan devokan ne ji ferqên wan ne hatıne nişan dan. Wsan dıxwıyê ku hozanên Kurdan hersê devok bı hevra bıkaranine û ew ferqa lı navbera wan heyi rabûye. Hozanê mezın Ehmedê Xani dı Mem û zinêda wha dıbêje:

Buhti û Mehmedi û sılivi
Hın lel û hınek jı zêr û zivi

Wsan dıxwıyê ku Ehmedê Xani ji ferqek grıng dı navbera hersê devokanda ne diye. Em ji nabinin.

Herçıqas ciyê Botan (Buhtan) jı derê dın çêtır dıpeyivın lê dı hezra mında ev ne jı devokêye. Jıber ku tevlaya ciyê Botan bı biyaniyanra hındıke, demek drêj ji navendi (merkezi) ya Kurdıstanê kriye û gelek ji hozan û hılbestevan jê rabûne, lewra peyıvina wan xwerûtır û edebitıre.

NVİSANDINÊN KURDAN

7. Kurdan ji mina hevdemên xwe, dı mêjoya kevında bı nvisandına bızmêr nvisandıne, xwendıne. Bı wê nvisandınê şehrezayi gelek pêşda brıne. Şehrezayi ghaye gehinekek wısan ku êdi nvisandına bızmêr têrê ne krıye. Vêca elfabeyek jı ali Kurdanve hatiye çêkırın ku heta iro ji jêra elfabeya Kurdi tê gotın lê gelek gelên dın ji jê wec ditıne. Dewletan û olan ji ew elfabe xebıtandıne. Zendawestaya Zerdeştê me ji bı wê elfabeyê hatıye nvisandın.

Ew elfabe heta derketına ola islamê dı nav Kurdanda jina xwe û peywıra xwe domandıye û pır xebatên gring ji krıye. Nha ji Kurdên êzidi (yezdani) pırtûkên xwe, tevgerên xwe yên oli (dini) bı wê elfabeyê dınıvisın. Lê iro jı bıl hêjana wê ya mêjoyi zêdetır geleke lê

neyête nêrin.

Pışti ola islamê Kurdan ji mina gişk gelên islam bı tipên Erebi nvisandıne û xwendıne. Dı destê meda bı tipên Erebi nvisandi gelek afırinekên Kurdi hene. Hê ji lı İranê bı tipên Erebi tê xwendın. Lı Iraqê dı dbıstanên Kurdanda wane gişk bı tipên Erebine. Bı mın, zmanê Kurdi bê kêmasi bı tipên Erebi nayê nvisandın. Yek ji hin bûna nvisandın û xwendınê, bı tipên Erebi pır izaye.

Qasi pênci sal beri, Kurdan lı Sûryê dı pêşengiya Celadat Bedırxanda kovar û agehname bı tipên Latini çap krıne. Hewara navdar yek jı wane. Jı wê rojê vırve Kurd lı Sûryê bı tipên Latini dınıvisın û dıxwinın. Lı Bêrût û Avropê ji Kurdan tipên Latini pejırandıne û gelek pêşda brıne. Nemaze lı Avropê gelek pırtûk, rojname û kovar bı tipên Latini derkevtıne û derdıkevın ji. Lı Kurdolojiya zanoşka Sorbon û Kordolojiya zanoşkek İtalyayê, wanê Kurdi bı tipên Latini têne dan û şxwe dıvê welê bıt.

Pışti şoreşa mezın ya Oqtobrê dı Sowiyestanêda bı tipên Latini dest bı nvisandın û xwendına Kurdi hate krın û qasi deh salan ajot. Paşi fetılandıne elfabeya krilik. Lê nêrin ku tipên krilik lı zmanê Kurdi nayê. Nha lê dıxebıtın ku disa elfabeya Latini saz bıkın.

Lı Tırkyê, herçıqas dı dema Osmaniyanda, rewşenên Kurdan lı Stenbolê jı sala 1908 an paş, rojname û kovarên rêzani (siyasi) û edebi bı tipên Erebi derêxıstıne ji lê pışti komara Tırkyê hêdi û hêdi bı ali tipên Latinive çûne. Jı hılbıjartına 1950 yi vırve weşek xweşkês pê ketıye. Nho gişk rewşenên me lı ser tipên Latini dısekının û mafe ji wloye. Lewra bı tipên Latini Kurdi drıst tê nvisandın: Dıvê her Kurdek ji dı vi warida bıxebıte.

Hêvidarım ku gişk Kurd dı vi warida bıxebıtın û tipên Latini bıdın pejırandın ku em ji bıgıhijın hemdemên xwe.

WANE II.

HEVOK

8. Hevok: Dı nav peyıvinek yan ji nvisinekda, ew peyvên têgıhdar yan ji wezifedar ku lı dû hev têne rêz krın dıbın komıkek, ew komık ji bı serê xwe têgıhek ifade dıke û xwestınek, agehiyek, ponijinek û kovanek bê kêmasi dıde diyar krın, jêra hevok tê gotın.

Hevok jı tipa gır destpê dıke, bı nıqtê dıqede û têda du peyv yan ji gelek peyv hene.

Hevok du celebın: 1- Bı lêkera bûn yan ji jı lêkerek nedervazi.

2- Jı lêkerek darvazi hevok.

1- Dema hevok bı lêkera bûn yan ji jı lêkerek nedervazi pêkbêt, têda du peyvên hêmani hene: Kırde, pêxısti.

	Kırde	Pêxısti	Kırde	Pêxısti
Bı lêkera bûn hevok:	Ez	rındım.	Tu	qenci
Jı lêkerek nedervazi	ez	revim	tu	keniy

2- Dema hevok jı lêkerek dervazi pêk bêt têda sê peyvên hêmani hene: kırde, serve, pêxısti.

kırde	serve	pêxısti.
ez	rêzıman	dınıvisım
Mamoste	mın	hin dıke

Emrika gelan dımıje

Kırde ewe ku krınê, bzavê dıke yan ji bzav û bûyin dı nefsa wida tê hmatê. Eger kırde bı lêkera bûn yan ji bı lêkerek nedervazira bêt, bzav yan ji bûyin dı kırdeda tê hmatê (lı mjara 108 an bınêrın). Eger bı lêkerek dervazira bêt, kırde krınê dıke (lı mjara 106 an bınêrın) çawan lı jorin ji dıxwıyên.

Serve ewe ku bzav, krın lê tê krın, yan ji bzav û tê ghana pêxısti bı ci, drûv, dem, sebeb û êd. dıde diyar krın.

Serve bı van taybetiyên xwe dıbe du celeb:

1- serva rasteder (serva misogeri)

2- serva nerasteder = têrker

1- Serva rasteder ewe ku bzav rastbıras lê tê krın. Mina:

ez **karkeran** dıparêzım. ew **şol** dıkın

2- Têrker bı çawani, çendani, ci, dem, sedem, rewş û drûvê xwe têgıha bzava pêxısti dıqedinın.

Gel bı **canê xwe** arikariya karkeran dıke

karker **bı hnerê xwe** şol dıkın

Jı têrkeran yên ku ci, dem û çawaniya bzava pêxısti dıdın diyar krın, jı wanra têrkerê hokeri tê gotın.

Gel bı canê xwe **herdem** arikariya karkeran dıke.

Dı pırsanda carna peyvek ciyê hevokek dıgıre. Mina:

Tu jıkû tê? Jı **Kurdıstanê**. Navê te çiye? **Şevger**.

Dı daneka celêbên hevokanda bı drêjayi dê dabaşa hevokan bête krın. Jıber vê yekê lı vır nayê drêj krın.

PEYV

9. Peyv: Peyv ewın ku lı dû hev rêz dıbın û hevokan tinın hmatê. Dı daneka hevokanda (lı mjara 8 ê bınêrın) peyvên têgıhdar û wezifedar hatıbûn dabaş krın. Peyv bı van taybetiyên xwe dıbın du celeb:

1- Peyvên têgıhdar

2- Peyvên wezifedar

1- Peyvên têgıhdar bı serê xwe xwedi têgıhên taybetine, gava dabaş jı wan tê krın têgıha wan yanji drûva wan têne zanin û bı

têgıhên xwe dıkevıne nav hevokan. Mina:

bajar, dbıstan, xani, zevi, parêz, pêşmerge
rabûn, rûnıştın, çûn, hatın, bezin, revin
hış, hdam, giyan, can, hêz ageh, rınd, sık

2- Peyvên wezifedar bı serê xwe bê têgıhên taybetine, gava dabaş jı wan tê krın têgıh û drûvên wan nayên zanin. Ev celebên peyvan bı wezifên xwe dıkevıne nav hevokan. Mina:

mina, wek, qas, qasi, weki, disa, heke, bla, eger.
Jı, jıber, bo, jıbo, ji, dı, bı, lı, wlo, wsa.

Gava qas bête gotın jê tu nayê fehm krın lê gava qasi mın bête gotın têgıh dıgıre û tê fam krın. Ev celebên peyvan bı wezifên xwe dıkevıne nav hevokan û têgıhê gorê wezifên xwe dıgırın û hevokan dıxemılinın.

Herdu celebên peyvan ji ya jı kitek yan ji jı kitek zêde pêktên.

Ew gotınên têgıhdar yan ji wezifedar jı kitek yan ji jı kitek zêde pêktên ku hevokan tinın hmatê jı wanra peyv tê gotın.

KİTE

10. Kite ewın ku jı dengek yan ji jı dengek zêde bı dev vekırınek û yek car jı dev derdıkevın û yek teni yan ji çend lbek dıdın pê hev peyvan tinın hmatê. Bı ewayek dın: Dı peyvekda çend dengdêr hene ew qas kitene.

Dı zmanê meda yanzdeh celeb kite hene. Dı kitanda jı yeki heta şeşan tip peyda dıbın. Mina:

1- bı dengdêrek	:	a, e
2- bı dengdêrek û bêdengek	:	av, ev
3- bı dengdêrek û du bêdengan	:	ard, erd
4- bı bêdengek û dengdêrek	:	ba, bi
5- bı bêdengek, dengdêrek û bêdengek	:	dar, dêr
6- bı bêdengek dengdêrek û du bêdengan	:	kuşt, şuşt
7- bı du bêdengan û dengdêrek	:	spi, bra
8- bı du bêdengan dengdêrek û bêdengek	:	stûr, stûn
9- bı du bêdengan dengdêrek û du bêdengan	:	stêrk, şkest
10- bı sê bêdengan dengdêrek û bêdengek	:	strik, stran
11- bı sê bêdengan dengdêrek û du bêdengan	:	strand

Institut kurde de Paris

DENG

11. Deng: Deng ewın ku bı bêhn dan û standınê jı kûraya gewriyê, jı arika dev, jı navber herdulêvan, jı bnê zmên, jı dfınê, jı serê zmên û pışta dranên jorin û êd. derdıkevın û yek teni ya ji çend lbek dıgıhın hev kitek tinın hmatê.

Dı zmananda gelek deng hene. Dı zmanekda çqas deng hındık bın ji disa dervazê çıli dıbın. Dı hınde zmananda hejmara dengan heta sedan ji radıbın.

Heke jı her dengekra tipek hatıba danin, hejmara tipan pır dıbûn û hin bûn gelek zor dıbû. Jıber vê yekê elfabenıvisan, ew dengên nizıkên hev anine cem hev lı tipek grêdane. Paşi dı nav henkina mêjoyêda deng û peyv hatıne traştın lı tipan hatıne.

Dı zmanê meda ji gelek deng dıxwıyên. Hemıne ku jıbo her dengeki tipek ne hatıye danin. Dıvê qenc bête zanin ku ew dengên dıxwıyên dı nav demên bêda dê hnek jı wan wında bıbın, yan ji dê bıterışın lı tipan bên.

Jıber vê yekê elfabeya Celadet Bedırxan û Kamran Bedırxan (ya kovara Hewarê) bê guhertın dıvê bête pejırandın. Em ji elfabeya wan camêran dıpejırinin. Bı teni hındek dengên gring hene, jıbo çawan nvisandına wan emê ponıjinê bıdın diyar krın (lı mjara 15 an bınêrın), dervaz bıbın û gotına paşi jı aqedemiyêra bıhêlın. Yek ji jıbo bı hêsani xwendına xwendevanên welatê me emê lı ser "i" nqut danin û "ı" ji bê nqut bıdın diyar krın.

işareta dengan tipın û jıbo gişk tipanra elfabe tê gotın.

Dı elfabeya meda siy û yek (31) tip hene û pevdakek ji hatıye pejırandın.

Tip, gorê destnıvis û çapnıvis dıbın du deste û gorê tipên gır û hûr ji du destene

- -

Ger dê hebûya me ji xwedanek
ali keremek letifedanek
ılm û huner û kemal û izan
şiir û xezel û kıtab û diwan
Ev cıns bıba lı ba wi memûl
Ev neqdi bıba lı nık wi meqbûl

(Ehmedê Xani)

Institut kurde de Paris

WANE III

ELFABE

12. Grek (tipên gır) ên çapê:
A B C Ç D E Ê F G H I İ J K L M N O P Q R S Ş T U Ù V W X Y Z
Hûrek yên çapê:
a b c ç d e ê f g h ı i j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z
Grekên destnıvis:
A B C Ç D E Ê F G H I İ J K L M N O P Q R S Ş T U Ù V W X Y Z
Hûrekên destnıvis:
a b c ç d e ê f g h ı i j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Institut kurde de Paris

DENGDÊR Û BÊDENG

13. Du celeb tip hene:
1- Dengdêr
2- Bêdeng

1- Dengdêr: Dengdêr ewın ku lı rêya denganra bı serê xwe û bê arikariya tipên dın bı hêsani derdıkevın.

Dı elfabeya meda heşt dengdêr hene:
A E Ê I İ O U Û
a e ê ı i o u û
Jı van tipan ji a ê i o û drêjın. e ı u kurtın
Â- Drêje, Mina : Ala, afır, agır, av, ava, arhan
Ê- Drêje, Mina: Êzıng, êvar, êriş, êdi êl, êş
İ- Drêje, Mina : İsot, isal, işev, iro, inca, iza
O- Drêje, Mina : Ol, oli, obe, ofis, orin, oremar
Û- Drêje, Mina : Dûr, Kûr, bûn, cû, zû, rû, rabûn
E- Kurte, Mina : Ez, em, erzan, enır, elem, evin
U- Kurte, Mina : Kurd, kurmanc, kur, dur, ku, kurt
ı- Kurte, Mina: Bın, dın, kır, şıl, kın, jın, dı

2- Bêdeng: Tipên bêdeng ewın ku lı rêya denganra bı serê xwe bê dengdêrek demakevın. Jıber vê yekê jı wanra bêdeng tê gotın.

Dı elfabeya meda bistûsê bêdeng hatıne pejırandın:
B C Ç D F G H J K L M N P Q R S Ş T V W X Y Z
b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

Bêdeng hnek jê nermın û hnek ji hışkın. Yên hışk nehın nerm ji çardehın.

Tipên hışk: Ç F K P Q S Ş T X
Tipên nerm: B C D G H J L M N R V W Y Z

Ç- Hışke, Mina : Çar, çat, çit, çeleng, çend, çem
F- Hışke, Mina : Felek, felat, fedi, felbaz, fir
K- Hışke, Mina : Karker, kêm, kes, krın, ket, kovar
P- Hışke, Mina : Pal, prınde, pêl, pey, pûngal, pır
Q- Hışke, Mina : Qad, qal, qayıc, qemer, qelûn, qas
S- Hışke, Mina : Sir, sim, sêv, sal, sehek, serma
Ş- Hışke, Mina : şıl, şûm, şahi, şin, şeletan, şêr
T- Hışke, Mina : Ta, tar, tax, tqên, tore, tvıng
X- Hışke, Mina : xışt, xal, xaf, xezal, xem, xêr
B- Nerme, Mina : Ba, baran, bali, ber, bed, beş
C- Nerme, Mina : cal, car, cem, cındi, cêr, cot
D- Nerme, Mina : Dar, dem, dêr, dev, dep, das

Institut kurde de Paris

G- Nerme, Mina : ga, gel, geli, ger, gerden, gez
H- Nerme, Mina : Hêk, hêl, hej, haf, him, hêle
J- Nerme, Mina : Jar, jêr, jor, jin, jan, jın, ji
L- Nerme, Mina : Lehêf, lêv, lva, lûle, lehi, lı
M- Nerme, Mina : Mak, mar, mêr, mehin, mûri, mın
N- Nerme, Mina : Nenm, nêr, nir, nok, nan, neyar
R- Nerme, Mina : Radan, razan, rev, rmêl, rabûn
V- Nerme, Mina : Vala, vedan, vêl, vır, vêca, vi
W- Nerme, Mina : Welat, wan, we, wıra, weki, wre
Y- Nerme, Mina : yar, yari, yek, yeqin, ya, yani
Z- Nerme, Mina : Zan, zanin, zevi, zelal, zêr, zık

PEVDAK

14. Pevdak: Ew denga jı du tipan tê hmatê jêra pevdak tê gotın. Dı elfabeya meda pevdakek hatıye pejırandın. Ew ji eve: xw Mina:
xweda, xwedi, xweyi, xwendın, xwarın, xwil, xwin, xwê, xwe

NVİSANDINA WAN DENGÊN BÊ TİP

15. Dengên bê tip: Her kurdizanek dızane ku dı zmanê mede hê çar dengên gring ji hene:
A- Lı navbera "C" û "Ç" yê. Mina: Ç ya Çêlek, çem, çal
B- lı navbera "D" û "T" yê. Mina: t ya tu, tewandın, teng, tir
C- Lı navbera "B" û "P" yê. Mina: p ya par, pêr, pê, pênc
D- lı navbera "G" û "K" ye. Mina: k ya kew, keko, keç, kêm
Ev dengên han ne b c d g û ne ji ç k p t yên xwerûne lê dıvê ev deng bı tipên hışk yani bı ç k p t yê bên nvisandın. Mina: çêlek, kew, par, teng...

NVİSANDINA WAN DENGÊN KU PEVDAK TÊDA DIXWIYÊN

Jı bıl pevdaka (xw) ku hati pejırendın her weki ku sê pevdakên dın ji dı zmênda hene: A - GW, B - KW, C - QW. Gwırmêna tvın-

gan, kwırika mehinê, qwırmê darê û êd. Gava ev deng bıxwıyên dıvê bı tipa "u" bêne nvisandın. mina: gurmina tvıngan, kurika mehinê, qurmê darê...

DENGÊN VEŞARTİ

Her weki dı zmanê meda du dengên veşarti ji hene: "R" ya stûr "L" ya stûr. Mina: Ber, por, hırç, per, pertal, frin û palas, paldım, lep, flc, tolaz, plıng... Ev ji dê bı "R, L" yên edeti bêne nvisandın.

Balakêş: hınde mrof hınde işaretan lı ser van dengan datının lê ez wan işaretan çewt dıbinım.

DI DEVDA BELAV BÛNA DENGAN

Lêvi	:	B F M P V
Drani	:	D R S T Z
Dfıni	:	N
Bnê zmên	:	C Ç Ş J
Arika devi	:	G K Y
Gewri	:	H Q X
Nivê zmani	:	L
Dev û lêvi	:	W

RASNIVİS
NVİSANDINA TİPÊN GIR

16. A- Tipên serê hevokan.

B- Tipa serê bernavk û navên xweser. Jıbo balakêşanê carna bernav gişk bı tipên gır têne nvisandın.

C- Tipa serê semıvisan, carna ji semıvis gişk bı tipên gır têne nvisandın.

D- Tipên lewhe û reklaman carna gişk tipên grın

E- Tipa serê navê pırtûk, kovar û rojnaman, carna ji ev nav gişk tipên gır têne nvisandın.

F- Jıbo balakêşanê carna ew nav, peyv û hevokên gring ku dı

Institut kurde de Paris

nav metnekida dervaz dıbın gişk bı tipên gır têne nvisandın.

TİPÊN KELIJANDINÊ

17. Dı zmanê meda du dengdêr lı pê hev dı kitek û peyvekda nayên, lê hınde peyv bı dengdêrê dıqedın û hınde qertaf ji bı dengdêrê dest pê dıkın, dı vê tentêlêda tipa kelıjandınê dıxwaze. Tipa kelıjandınê "w, y" ye. Mina:

Dara Darayê Kurd,	hatıbûya,	hatıbûwa
Zana zanayên me,	çûbûya,	çûbûwa

Carna "h" ji dıbe tipa kelıjandınê. Mina:
zehfahi, hındıkahi dı şûna zehfayi, hındıkayida

Eger lêker bı dengdêrê destpê bıke, pêşdaçekên lêkervegir dıkarın dengdêrên xwe bavêjın û bêdeng xwe lêkerve dayne. Mina: ajot bıajo bajo, avêtın avêt bıavêj bavêj, inandın inand dıinc tine.

Balakêş: Dı herikina rêzımênda dê ci û ci dabaş jı van bûyeran (tipên kelıjandınê û tip avêtın) bête krın. Jıber vê yekê lı vır wekok pır ne hatıne dan.

DI SERÊ PEYVANDA BIKARANİNA TİPA "I"

Heke peyv pır kite be pışti bêdenga duwem dengdêrek hebıt, lı navber herdu bêdengên serê peyvê tipa "ı" nayê danin. Mina:

Dran, zman, krın, bvır
Dıran, zıman, kırın, bıvır çewte

Herçıqa lêkera krın û yên mina wê, gava yek kite be tipa "ı" tê bıkaranin ji disa qayda me naherıfe. Mina:

Krın kır, brın bır, ktek kıt, kna delal kın

Pzo bêdenga duwem jı bêdenga yekem be, lı navbera her duwan danina tipa "ı" peywıste. Mina:

Çıçık, dıdan, zızê, sısê, jıjan, dıdo

Gava peyv yek kite be yan ji pışti bêdenga duwem bêdengek hebıt lı pê bêdenga pêşi tipa "ı" tê bıkaranin. Mina:

Dın, mı, jın, cın, çır, pır

Institut Kurde de Paris

sıst, xıst, cırf, tırs, pırs, nıft
tıftik, tırpan, xıstın, mıştın

Pzo çend peyvek jı vê qaydê cda hene. Mina:

stran, strand, strik

Balakêş: Dı hılbeste û weznanda ev qayde pêkneyê ji dıbe

KETINA TİPAN

Hınde peyvên pır kite ku bı bêdengek dıqedın û dengdêra kita dawi ji "ı" ye. Mina:

Tevın, kavır, remıl, reşık, kevın

Ev celebên peyvan gava bı serê xwe bêne bıkaranin, çawan lı jorin dıxwıyê wısan dıminın. Yani tu tip jı wan nakevın û gava qertafekê yan ji peyvekê bêdeng destpê kri ji bı wanve gırt disa tu tip jı wan nakevın. Mina:

Tevınker, kavırkır, remıldar, dı kevında
reşıksaz, kevınfıroş, genmxane, kavırve

Gava qertafekê bı dengdêrê destpê kri bı wan celebên peyvanve gırt, hınga "ı" dıkeve. Mina:

Tevna Durê, kevrê diwêr, remla remıldar
Reşka Reşo, kevneguhez, germa havinê

Dı rasnıvisa kurmancida dubare tip tune, yani dı peyvek Kurmancida du tipên jı hev nayên ba hev. Pzo peyvên hevedudani, tipa dawiya peyva pêşi û tipa pêşi ya qertaf û peyva dawi jı hev (dubare) dıbın. Dema wlo be, tipa dawiya peyva pêşi dıkeve û paşi pêve dıgırın. Mina:

sıst-tır	sıstır,	paş-şiv	paşiv
tving-gir	tvıngir,	fınd-dang	fındang
Çav-vekıri	çavekıri,	dı gund-da	dı gunda
hev-ve	heve,	dı vır-ra	dı vıra...

Tipên têvel yên jı cıhderkekê yan ji jı cıhderkên nızıkên hev, dı peyvekda lı cem hev nayên. Eger dı peyvên heyedudanida lı cem hev bên tipa dawiya peyva pêşi dıkeve. Mina:

Dest-dırêj	desdırêj
tvıng-kır	tvınkır
blınd-tır	Blıntır

Institut Kurde de Paris

tnaz-saz	tnasaz
bab-pir	bapir

Heke tipa dubare, tipên cıhderkek û tipên cıhderkên nizıkên hev dı du peyvên jı hev cda nvisandida rastê hev bên, herçıqas neyne xwendın ji têne nvisandın. Tipa dawiya peyva pêşi nayê xwendın. Mina:

Nvisandın	**xwendın**
fınd dani	fın dani
jı serhıng kri	jı serhın kri
ez jê hatım	e jê hatım
şêst dep	şês dep

Ew peyvên pır kite yên bı dengdêra "i, û" yê bıqedın û "y" ya kelıjandınê ji bıgırın, herçıqa cama nayne xwendın ji lê têne nvisandın. Mina:

Peyv	**Nvisandın**	**xwendın1**	**xwendın2**
Seri	seriyan	seriyan	seryan
keri	keriyan	keriyan	keryan
deri	deriyan	deriyan	deryan
mali	maliyan	maliyan	malyan
bari	bariye	bariye	barye
çarsû	çarsûya me	çarsûya me	çarsya me
xesû	xesûya te	xesûya te	xesya te

LI HEV Cİ GUHERTINA TİPAN

V F cama ci dıdın hev
Mrov mrof, hevt heft, hevsar hefsar
v b cama ci dıdın hev
bav bab, xoşav xoşab, gulav gulab
z s cama ci dıdın hev
gez gest, parast bıparêz, leyz leyist
j z cama ci dıdın hev
jirek zirek, lmêj lmêz, zeng jeng

Ev ci guhertına tipan ne pır frehe. Yani heryek dı çend peyvanda têne hmatê.

Cİ GUHERTINA TİPA KURT Û DRÊJ

CARNA DENGDÊRA kurt dıkare ciyê xwe bıde dengdêra drêj:

Gava lı nivhend yan ji lı dawiya hınde peyvan "h" hebe, ew "h" dıkare bıkeve û dengdêra kurt ciyê xwe bıde dengdêra drêjê jı zayend ê xwe. Yani "E" ciye xwe bıdc "A" yê, "ı" ciyê xwe bıde "İ" yê, "U" ciyê xwe bıde "O" yan ji "Û" yê. Mina:

Çehv çav, sıh si, Buhtan Botan, rıh ri,
Cıh ci, xwehr xwar, xwıh xwi, trıh tri
Cuh co cû, duht dot, sehkırın sakırın...

Bı awerteyi carna peyva duht tipa "T" tavêje "H" dımine û disa tipa kurt ciyê xwe dıde ya drêj. Dı vê tentêlêda duht dıbe doh, duhtmam dıbe dohmam.

Peyva "xwehr" û "guh" neyne guhertın çêtıre, lewra têgıhên dın jı wan derdıkevın. Yani çı peyva têgıhek dın jê derkevıt ne guhertın çêtıre.

Balakêş: ev qaydê han ne devoke, herçıqa hınde herêm guherti û hınde ji neguherti bıkartinın ji.

CELEBÊN PEYVAN

18. Herweki dı daneka hevokanda ji (lı mjara 8 an bınêrın) hatıbû dabaş krın ku em alaziyên xwe bı hevokan dıdın diyar krın. Hevok ji jı peyvan têne hmatê

Peyv gorê têgıh û wezifên xwe heşt celebın. Mina:

Têgıhdar: Nav, cinavk, rengdêr, lêker, hoker
Wêzifedar: Daçek, grêk (ghanek), baneşan

Nav: Navê heyberanın: Kurd, Kurdıstan, Çiya, Reşo, Zerif, gel, pale.

Cinavk: Ciyê navan dıgırın: Ez, tu, ew, Em, hûn, ew, mın, te, wi, wê, me, we, wan, ev vi, vê, hnek, hındek

Rengdêr: Çawani, çendani bı işaret û êd. heyinan dınıminın:

Hespê reş, burjuvayên xeşim, karkerên zana

Institut kurde de Paris

Ev tving, deh pêşmerge, keça şoreşker...

Lêker: Kırın yan ji bûyinên heyinan dıdın diyar kırın:

Dıkene, dıke, rabû, vezela, av da

Mêre, rınde, dewlemendbû, başım

Hoker: Hoker têne pêşiya lêkeran bzava wan dı nav dem, ciyanda û bı çawani drûvên bzava lêkeran dıdın diyar kırın: Duhu hatım, baş hatım...

Grêk: Peyvan û hevokan bı heve grê dıdın: Ez û tu, hım gel hım karker...

Baneşan: Kovan, şahi dılxweşi û êd. Bı dengan dınımının:

Ax ew ne hat, ox ez sax bûm, xweş dlê mın rehet bû...

Daçek: Dıkevıne pêşi peyvan û nav hevokan rewş dıdın têgıh û henkina wan: bı mınra, ez lı malê bûm, tu jı kû tê?

PARÇEK XWENDINÊ. NAME
Dêrsım
7.2.1978

19. Brayê hêjayê delal Dara!

Roja em jı hev qetane heta nha ez dı kovana ditına tedame. Ew peyıvinên dıl germi, gumanên pêşverû û zelaliya birobaweriya te gava bira mın dıkeve tu têy pêş çavên mın û nıkarım xwe ragırım lê dema şireta te (rojên bê yên mene) tê bira mı dlê mın hênık dıbe.

Pışti çûwina te mın jı xwera hınde heval û hogır û hevri peyda kırın, heke ciyê te negırın ji lê gelek kêra mın tên. Em bı hevra pırtûkên pêşverû seminer dıkın. Jı têkoşerê gelên bındest daxêvın û dı bın ronahiya birobaweriya karkeranda bı ali gelê xweve dıçın. Gel ji wek xwe ne maye. Şiyar pır zêde bûne û jı beri zehf zêdetır kêfa xwe jı mera tinın, bı weş bı ali meve tên.

Çawan ku tu dızani dı Dêrsımêda hejmara gurên rûnıştvani hındıkın. Hê ji ne guheriye û wsan dızanım ku naguhere ji. Her çıqas nokerên burjuwayi bı njadperesti dıxebıtın ku hınde hevalbendan jı xwera çêkın lê ew hêmana dı gelê meda heyi xwe dıparêze. Bı teni hınek dede, axa, serekeşir û burjuwayên şolyekvan hevalbendê wanın. Ev beşa rengmırov ji dı nav gelda bê rûmetın.

Dbıstana me yek dane. Jıber vê yekê dana sbê ez dıçım xebatê û heta nivro xebatek gran dıkım. Dana êvarê dıçım dbıstanê, şevê ji heta dreng dıgel hevalan em pırtûkên zanisti dıxwinın.

Aboriya me disa ne başe. Çawa tu dızani ku axê gişk zeviyên me vegırtıbû û me ji lı dadgê doz vekırıbû. Bervedarê me bı hemi hêza xwe lê dıxebıte lê hê ji bıryar ne standıye. Heke dadvan lı ali me bıryar bıde, dê tentêl û aboriya me qenc bıbe.

Gelo tu çawani? Tu hewiya xwe bı çı tini? Wane û xebatên te çawanın? Jı wan hevalên kevın qe name dıstini? Hevalên te yên nû hene? Bersıv dana van pırsan daxwaza mıne. Hêvidarım ku dê tu tengasiyên te tunebın. Herçıqa dı sazımana sermayedarida, jı refa perçıqı û gelên bındestra dılxweşi, bê tengasi, jina hêsani û berxwıdari nayê hzırandın ji lê disa wan xwestınên jorin dıdım diyar krın.

Kıfletê mala me û we gişk başın. Jıbo xem krınê hêç bûyerên gring tune. Bı teni em dı keser û kovana tedane. Ez gumanım ku dı demek nizıkda ew ji pêkbêt.

Slav û evinên xwe yêndılgerım jı tera pêşkêş dıkım. Pışti hımbêz krınê çavên te radımûsım.

Serdar Çiya

Institut kurde de Paris

WANE IV

NAV

Kovana egiteki

20. Dema ku rpenpa hespên Kurdên mêrxas lı ser gora mınra dê bıborın û dengê tvıng û topan, bombe û balafıran dê bên, ezê bı çekên xweve jı gora xwe hlavêjım, jı bona serbest krına welatê xwe, jı bona azadi krına welatê xwe.

(Kamran Bedırxan)

Ev nvisan kovana egiteki dıde diyar krın.

Vekırın:

Nav û celebên navan: A- dı nvisina jorinda hesp, gor, tvıng, bombe û balafır dıborın, heryek jı wan peyvan navên curekın. Dema hesp bête gotın curê hespan, tvıng û balafır curê tvıng û balafıran têtc hşê mrovan.

B- Peyva Kurd dıbore, ev peyv naveki xwesere û taybetiyê neteweyeke ku jı wi neteweyera hatiye dan, dema navê Kurd yan ji naveki weki wi Kurmanc, Reşo, Zerif, Fêrıs, Tetwan, Diyarbekır, Frat, Dıcle û êd. Bête dabaş krın ew heyinên ku ew nav lê hati krın têne hşê mro.

C- Peyva mêrxasi, serbesti û azadi ji dıborın, belê ev peyv ji navın lê ne jı navên wan heyinên bı dest têne gırtın û bu çav têne di-

Institut kurde de Paris

tıneyın. Dı navber van navan û navên wan heyinên jorinda ferqên gring hene. Lewra herdemek ew heyinên jorin Kurd, top, tving, hesp, balafır, reşo û êd. bı çav têne ditın û bıdest têne gırtın lê mêrxasi, serbesti û azadi pzo mro bı hış û hdamê xwe dıkare bı-nase.

Ew peyvê ku heyin pê têne nasin heke candar û heke bê can, heke heyberi û heke menewi, heke bı hış û heke bê hış, jı wanra NAV tê gotın.

Pêşi nav dıbın du bır
A- Navên heyberi
B- Navên meni
A- Navên heyberi
Mrov, mêr, jın, keç, kur, met
Heywan, hesp, mehin, cani, berx
dar, kevır, çiya, deşt, zevi
Rojname, kovar, pırtûk, pel
B- Navên meni
Hış, hdam, beng, rûmet, şahi
Xew, deng, can, azadi xem, kêf
Xweşi, nexweşi, zındeyi, êd.

Heke kurt ji be carek dın ji emê bêne ser vekit û dane nasina hınde curê navan.

Institut kurde de Paris

BRÊN NAVAN

21. Du rewşên navan hene:
1- Candar
2- Bê can

1- Candar: Insan, heywan, pez, dewar, mel, kew, kevok, şêr
2- Bê can: Dınya, welat, çiya, zevi, dar, kevır, ax, sêle

Gorê nav lê kınnê nav dıbe du bır
A- Navê curedar
B- Navê xweser

A- Navê curedar: Navê curedar ewın ku jı eyni curê pır heyin hene. Mina:

Dar, kevır, şêr, plıng, ga, çêlek, hesp, hêstır

Çawan dı benda 20 an da ji hatıbû gotın ku dema mro şêr bıbêje curê şêran, plıng bıbêje curê plıngan tê ber çavan, jıber vê yekê jı wanra navê curedar tê gotın.

B- Navê xweser: Navê xweser ewe ku jı heyinekra bı taybeti hatiye dan û gava ew nav bête gotın, ew heyin bı serê xwe tê ber çavan. Mina:

Mirza, Xecê, Hışyar, Dıjwar, Diyarbekır, Rha, Muş
Feqeyê Teyran, Ehmedê Xani, Melayê Cziri, Ehmedê Bateyi

Navê mırovan xweserın:

Fêris, Kerevan, Azad, Rojhat, Guldani, Gulrêz, Fatê

Bernavk xweserın: Berzan, Xweşnav, Melekan, Dılbırin, Şevkar, Pola

Navên corafi yên taybeti xweserın:

Sipan, Nemrût, Agıri, Rehwa, Codi, Dıcle, Gola Wanê

Navê bajar û gundan xweserın:

Diyarbekır, Xwarpêt, Farqin, Sêgıran, Axkis, Avetax

Navên pırtûk, kovar û rojnaman xweserın:

Şerefname, Mem û Zin, Hewar, Jin, Hetawê kurd, Rızgari

Navê heywanan ji yê xwser hene:

Çavreş, Xezal, Gurzo, Eblcq, Şinboz, Rexşê belek

Navên netewan xweserın:

Kurd, Tırk, Ereb, İngılis, Urıs, Hûnan, Çerkez, Çin

Bı kurtasi çı naveki taybeti lı çı heyineki hatıbe danin gişk xweserın û tipa serê navê xweser ji greke (tipa gre).

MÊJER

Nav gorê hejmaran dıbın du beş:

A- Yekani
B- prani

22. A- Yekani: Ew navên heyineki û keseki nişan dıde yekanine û jı wanra yekani tê gotın. Şxwe ew dabaşên jorin gişk yekaninın û hınde wekokên nû ji bıdin: Suxte, qutabi, şagırt, karker, pêşmerge,

zaro, şvan.

23. Prani: Ew peyvên jı yeki zêde heyinan û kesan dınımine jêra prani tê gotın. Praniya tam lı dawiya peyvanve (navdêranve) qertıfandına qertafa "an" pêktê. Mina: Suxtan, şagırtan, karkeran, pêşmergan, cotyaran.

Gava jı yek mêjerê gelek nav bıdın dû hev yê dawi bı teni ji bête prani krın dıbe. Mina: Şagırt, karker, pêşmerge, suxte, û cotyaran.

Navên curedar gişk tên prani krın lê navên xweser dı van tentêlên jêrinda tên prani krın:

Gava ew kes û yên mina wan bêne nişan dan:

Reşoyan, Azadan, Zerifan, Dılvinan şerê azadi krın.

Diroka Kurdan bı ehmedê Xaniyan, bı Selahedinê Eyubiyan, bı rıstemê Zalan tê xemılandın (Kemal Badıllı).

Yani bı van kesan û bı yên mina wan şerê azadi hate krın û diroka Kurdan hate xemılandın.

Gava malbat (xanedan) bêne nişan dan:

Bedırxanan, Berzaniyan, Eyubiyan, Merwaniyan.

Gava navên eşiran bêne nişan dan:

Hesenan, Heyderan, Bekıran, Alıkan, Cıbran, Sloqan.

Gava navên netewan bêne nişan dan:

Kurdan, Tırkan, Ereban, Çerkezan, Gurciyan, Farısan.

24. Dı navanda Pêkhatına yekani û prani:

Yekani: Yekani bê qaydene, şxwe heyin û kes dı tentêlên xwe yên rûda gişk yekanine. Gava mro bıbêje keç, kur, hesp, mehin, dar, kevır, dest, pê heryek jı van kesek, heyinek û heyberek dınımine. Bı teni jıbo xwerû ifade krına yek lıb qertafa "ek" bı dawiya navanve tê qertıfandın û têgıha yek lıb dıde. Wekok:

Dı şûna yek hesp hespek, yek mehin mehinek
yek pırtûk pırtûkek, yek tvıng tvıngek

Dı daneka nekıfşida qaydê qertafa "ek" dê bête danin. Lewra ev qertaf qertafa nekıfşiye ji. (Lı mjara 28 an bınêrın) Jı ber vê yekê lıvır zêde nayê drêj krın.

Prani: Pênc celeb prani heye:

A- Bı qertafa "an" praniya tam û kıfşe

B- Bı qertafa "na" praniya hındık û nekıfşe
C- Bı qertafa "ên, êd, êt" praniya tam û kıfşe ya qedinekê
Ç- Bı qertafa "ne, nê" praniya hındık û nekıfşe ya qedinekê
D- Bı lêkeran prani

Ey dıl lı qraxê çemê Amed rûne ser derdan
Rınd çavên xwe veke, temaşe ke welatê Kurdan
Lı bajarê Amed çkandıne çend sêpê
Bı wanve dalıqandıne cındiyên Zazan

(Cigerxwin)

Praniya qedinekê dı daneka qedinekanda (lı mjara 37 an bınêrın), praniya bı lêkeran dı daneka cinavk û lêkeranda (lı daneka 47 û 125 an bırênın) dê bêne dabaş krın. Jı ber vê yekê lı vır nayêne vekıtandın.

25. A- PRANÎYA tam: Çawan dı mjara bistûsısêyanda hatıbu dabaş krın ku qertafa "an" bı dawiya navên yekanive têne qertıfandın û yakaniyê dıke prani. Mina:

Mêr mêran, jın jnan, keç keçan, kur kuran, şêr şêran.

Navdêrên bı dengdêran bıqedın "y"ya kelıjandınê dı navber navdêr û qertafa pranida tê danin. Mina:

xatiyan, braziyan, cûyan, xesûyan, xwarziyan

Heke dengdêra navdêrê "a,e" bın ciyê xwe bıdıne dengdêra qertafê çêtıre, dı vê tentêlêda "y" ya kelıjandınê naxwaze. Mina:

Masan, zerdelan, melan, axan, palan, çran, lemban

Dı peyıvinêda carna "n" ya qertafa prani têxın bı teni "a" dımine û herweki prani tê kêşan. Mina:

Daran dara, hespan hespa, keçan keça, xortan xorta

Lê dı nvisandınêda gelek neyê êxıstın

B- PRANİYA HINDIK

26. Praniya hındık: Qertefa "na" bı dawiya navdêrên yekanive tê danin û praniya hındık tê hmatê. Jı praniya tam hındıktır yan ji beşek jı praniya tam (lı 38 an bınêrın). Mina:

Pêşmergena, mrovna, darna, tvıngna, pezna

Dema bête gotın ku mın nan da pêşmergena, mın mrovna dit û mın darna ani yani mın nan da hınde pêşmergan, hınde mrov dit û hınde dar ani, ne gişk ne ji lbek.

Dema gelek nav bıdın pê hev, bı teni yê dawi bête prani krın dıbe û yên dın ji pêra prani dıbın:

Hırmi, gûz, gındor, sêv û zebeşna bine
Mi, bzın, hesp, mehin, ga û çêlekna bıfıroş

Balakêş: Praniya hındık dı bınyata zmênda heye lê hınde ciyan û lı hınde herêman hatıye jı bir krın. Jıber grıngiya wê dıvê jı nûve bête vejandın.

- -

mala zêran xra dıbe lê mala mêran xra nabe
Carna mro jı yarê diya xwera dıbê bavo

(gotına mezınan)

WANE V

KIFŞİ NEKIFŞİYA NAVAN KIFŞİ

27. Dı zmanê meda heke navê yekani û heke navê praniya tam gişk kıfşine. Dema bête gotın hesp, hespan, hêsp bine, hespan bine, jı ali guhdar ve ji tê zanin ka kija hespe û kijan hespın. Jıber vê yekê em lı ser vi naseknin.

NEKIFŞİ

28. Nekıfşi: Dıvê bête zanin ku dı nekıfşida zayend tune.

Nekıfşiya yekani bı qertafa "ek" pêktê. Bı navanve danina qertafa "ek" nekıfşiya yekaniya herdu zayendan (mê û nêr) tê hmatê. Mina:

Jın jnek, mêr mêrek, qelem qelemek, mal malek
pıtûk pırtûkek, hesp hespek, mehin mehinek
Dar darek, kevır kevırek, tvıng tvıngek, mar marek
Pencere pencerek, roj rojek, kovar kovarek

Dema bête gotın ku jnek, pırtûkek, tvıngek û topek bine, yani her kijan jın, pırtûk, tvıng û top bine.

Navdêrên bı dengdêran bıqedın "y" ya kelıjandınê lı navbera

navdêr û qertafê tê danin. Mina:

Hırmi hırmiyek, deri deriyek, xani xaniyek
Masi masiyek, kursi kursiyek, sevi seviyek

Gava dengdêra navdêrê "a,e" bın dengdêra qertafê "e" dıkare bıkeve û bêdanga qertafê "k" xwe bı dengdêra navdêrêve dayne. Mina:

Zerdelek, masek, sek gak, sobek, axak
Melak, çrak, lembek, kolek, rojnamek

Carna dengdêrên dın ji bı vê qaydê pêktên. Mina:

Xesû xesûk, masi masik, zevi zevik, cû cûk
Kefi kefik, sêwi sêwik, bali balik, cani canik

Ev "ek" a qertafa nekıfşi dı eyni gavêda qertafa yeklıbiye ji (lıdaneka 24 an bınêrın.) Mina:

Hespek, bzınek, şêrek, darek
Yani yek hesp, yek bzın, yek şêr

Şxwe yek hesp, yek bzın, yek şêr hındık têne bıkaranin.

Heke kıfş krına zayendê peywıst be, bıqertafa "ek" ve qertafa zayendê (jıbo zayenda mê "ê" jıbo Zayenda nêr "i") tê danin:

Hespek hespeki, mêrek, mereki, kevırek kevıreki
Mehinek mehinekê, jnek jnekê, qelemek qelemekê

Nekıfşiya prani: Nekıfşiya prani bı qertafa "na" pêktê. Bı navdêranve danina vê qertafê praniya herdu zayendan tê hmatê:

Mêrna, jına, qelemna, pırtûkna, hespna, kevırna.

Dema bête gotın mêrna, jına, qelemna, hespna, kevırna bine. Yani her kijan mêran, jnan, qeleman, pırtûkan tini bine.

Ev "na" ya qertafa nekıfşi dı eyni gavêda qertafa praniya hındıke ji.

ZAYEND
MÊ Û NÊR

Parçek jı hewarê

29. Hewar dengê zaninêye. Zanin xwe nasine. Xwe nasin, jı mera rêya xebat, felat û xweşiyê vedıke. Herkesi ku xwe nas dıke, dıkare xwe bıde nas krın. Hewara me beri her dışti heyina zmanê

Institut kurde de Paris

me dê bıde nas krın. Lewma zman şertê heyinê ya pêşine.

(Celadet Bedırxan)

Ev nvisandına jorin; zanin, xwe nasin û grıngiya zmên dıde diyar krın.

Vekırın:

Zayend: Mê û nêr, dı nıvisandına jorinda "dengê zanin, kesê ku, zmanê me, şertê heyinê"; yek ji "rêya xebat, Hewara me, heyina zman, ya pêşin" dervaz dıbın. Qene bınêrın ku dı qedinekanda peyvan gişk mina hev qertaf ne gırtıne. Yani desta pêşi (dengê, kesê, zmanê, Şertê) "ê" û desta paşi ji (rêya, Hewara, heyina) "a" yek gırtıne. Vaye ev "ê, a" qertafên veqetinekên zayendêne.

Dıvê neyê jı bir krın ku zayend dı yekanida heye, dema bû prani radıbe.

Dı qedandida veqetineka zayendê jıbo yekaniya nêr "ê" jıbo yekaniya mê "a" ye. (Lı 37 an bınêrın)

Hate zanin ku dı zmanê meda zayend (mê, nêr) heye, ew ji yan misoger zayendın. Mina:

Nêr
Mêr, kur, law, hesp, ga, beran, nêri, belındır
Mê
Jın, keç, duht, mehin, çêlek, mi, bzın, şişek

yan ji Kurmancan wsan (zayend) pejırandıne. Mina:

Nêr
Deri, ban, xani, kevır, tevır, tevşû, agır
Mê
Pencere, bermal, mal, ax, bêr, brek, av, qelem

LİSTA HINDE ZAYENDAN

30. Nêr

Gişk candarên nêr
Navên xweser yên candarên nêr
Navê rengdêrên hejmari yek ne têda
Reng, dema mina navan bêne bıkaranin
Gişk navên gewheran, hılberiyên petrol û komır ne têda

Gişk berkêşanên heywanan, hêk hri, lorik ne têda
Qût dexıl û dgel hemi celeban û navên wan
Gişk navê meyweyên hışk
Navê celebên baqlan.

Jı bıl van ji gelek navên nêr hene. Ew ji yan mina vanên jorin deste û destene. Yan ji lıb û lıb dı nav yên mêda peyda dıbın.

Dı zmanê meda navên nêr jı yên mê hındıktırın.

31. Mê:

Gişk candarên mê û navên wan yên xweser
Êwırgeh xani, seray, gund, bajar, axo, zozan ne têda
Av û navên wan çem, şet, delav, derya, Nil ne têda
Gişk navê pergalên neqliyê
Navên corafi, çiya geli, gır, nzar, beroj, glonte ne têda
Nexweşi û navên nexweşiyan, ta ne têda
Navên heyinên esmana û barinan, ba ne têda
Pergalên mırbexê û navê xwerekên pehti, kevçi nan, goşt ne têda
Pargalên goraniyê
Pût û celebên giyayên ku dıbın pût jıbo heywanan ka, giya, ceh ne têda
Navên pırtûk û pergalên nıvisandınê pel, kaxız ne têda
Gişk rader gava bı navani bêne bıkaranin
Nıft dgel berkêşanên xwe
Eşyayê navmal û bûroyan
Navê gulan
Navê tipan
Navên çekan gurz, şûr, metal, berik ne têda...

Bı kurtasi ew heyberên Kurmancan mê hejmartıne mê û ewên nêr hejmartıne nêrın.

32. Navdêrên wek hev: Navdêrên wek hev gorê zayendên xwe, gava nêr be nêrane û gava mê be mêyane têne bıkaranin. Mina:

Mê	**Nêr**
Mamosta mın	Mamostê mın
Hostaya Reşo	Hostayê Reşo

Institut kurde de Paris

Pêşmerga mı	Pêşmergê mı
Şêra kedi	Şêrê kedi
Kewa kûvi	kewê kûvi
Sercka êlê	Serekê êlê
Hevala mın	Hevalê mın
Pala jêhati	Palê jêhati
Karkera hêzdar	Karkerê hêzdar
Plınga kedi	Plıngê kedi...

33. Karanina zayendê: Hınde candar gorê zayendê nav lê hatıye krın. Mina ga, çêlek, mi, beran û hınde ji bı peyva "nêr, mê" zayend tê kıfş krın. Mina berxê nêr, berxa mê, giskê nêr, giska mê. Peyva nêr û mê bêne pêşiya hınde navan ji dıbe. Mina Maker, nêreker, mêkew, nêrekew.

Bı peyva dêl ji hınde mêyiti pêktên. Mina dêlese, dêlegur, dêleşêr.

Gava peyva mê, nêr, dêl bêne pêşiya navan dıvê nav bı wanve bêne danin û bıbe wek peyvek...

34. Têgıh guherin: Hınde nav gorê zayendan gava bête bıkaranin têgıh (mena) dıguhere: Mala mın, mal xani dgel navmalêye. Malê mın, mal serwet hemiye. Kara mın, kar, kar krıne yani dıjê ziyanêye. Karê mın, kar xebate. Rasta mın, rast qade. Rastê mın, rast rastê hev hatıne (tıfıqin, tesadûf). Nava mın, nav hundırıye. Navê mın nav isme. Dengê mın, deng pêjıne. Denga mın, deng baliya eşyayêye yan ji pakêta mezıne...

VEQETANDEK (VEQETİNEK)

35. Veqetandek: Veqetandek dıbêjıne wan qertafên bı navdêranve têne danın û wan jı yên weki wan bı zayend û bı mêjer dıqetinın û dıdın kıfş krın. Mina a, ê, ên, êd, ne, nê... Dıvê bête zanin, dı gelek ciyanda jı veqetandekanra emê teni qertaf bıbêjın.

Institut kurde de Paris

WANE VI

QEDİNEK

36. Qedinek: Dema peyvek bı peyvek dın hate kıfş, reng û terif krın, jêra qedinek, jı kıfşkırira qedandi, jı kıfşkera qedandek tê gotın.

Qedinekên me ji mina qedinekên Hındi-Avropa yên dın, pêşi qedandi tê danin. Mina:

Zmanê me, deriyê xani, pencera mezın, mêrê qenc
Havina par, jina hêsan, dara bi, zeviya çandi...

Qedinek, bı reng, terif û kıfş krına navdêrek bı navdêrek dın pêktê. Mina:

Pırtûka Azad, tvınga Reşo, qelema mamoste, serê te
Barana payizê, danê êvarê, kuşına koledar
Mrofê xwendınê, qelema nvisandınê, hespê reş...

QEDANDİ

37. Qedandi: Gişk qedandi veqetandekan dıgırın. Bı qedandive danina veqetandekan qedandi xwe ali qedandekve dıtewine.

Qertafên qedandiyê, jıbo yekaniya mê "a", jıbo yekaniya nêr "ê" jıbo praniya tam ya herdu zayendan yek jı "êd, ên, êt", jıbo praniya

hundık û nekıfşi ya herdu zayendan yek jı "ne, nê" ye. Wekok:

Kurê Azad, keça Reşo, pırtûka mamoste, çqê darê
Kurêd Azad, keçên Reşo, pırtûkêt suxte, lûlên tvıngê.
Keçne pêşmerge, karkerne şoreşker, kurne gernas
Tvıngnê şoreşê, pêşmergnê Kurd, keçnê jêhati..

Veqetandeka "ne, nê" mina wanên dın jı manendan tam kıfş nakın û naqetinın. Pzo xwar û jor kıfş dıke, yani jı wan beşek û praniyê ji jı praniya tam kêmtır dınimıne.

Dı peyıvinêda carna bêdengên qertafa praniya tam yên qedandiyê (n, d, t) têxın, bı teni "ê" dımine. Dı vê tentêlêda kurên Fêrıs dıbe kurê Fêrıs lê dı nvisandınêda dıvê neyê êxıstın, lewma jı "ê" ya yekaniya nêr nayê nasin, yan ji zor tê nasin.

Dema peyvek bı gelek peyvan bête tarif, reng û kıfş krın, heryek gorê zayenda xwe veqetandekên qedandiyê dıgırın. Mina:

Keça zeriya çavbelek
Keça Azadê Zerifa Reşo
Koledarê xwinmıjê kedxwerê gelkuj

Dema gelek peyv bı peyvek bêne tarif, reng û kıfş krın, geleke qertafa qedandiyê bı ya dawive teni bêt danin. Dı vê tentêlêda mêjer yan ji zayenda peyva dawi çı be wê veqetandekê dıgıre. Wekok:

Kur û keçên şoreşker
Deri, pencere û banê dıbıstanê
Lûle, nişangeh, tetık û sırma tvıngê

Dema qertafa qedandiyê eda hate danin hım dıbe cinavka peywendi û hım ji têgıh dı guhere. Mina:

Kurê Reşoye. Kur ê Reşoye
Keça Azade. Keç a Azade
Tvınga mıne. Tvıng ya mıne
Pırtûkên Zerifêne. Pıtûk yên Zerifêne

Dema qedandi bı celebek navdêran hatıbe kıfş, reng û tarif krın û carek ji bı celebek navdêrên dın tarif, reng û kıfş krınê bıxwaze dı navber qedinek û navdêra nûda, gorê zayend û mêjerê yek jı cinavkên peywendi (a, ê, ên, ya, yê, yên) eda tê danin. Wekok:

Kurê mın yê pçûk

Keça Reşo ya bedewa delal
Diyarbekıra rengina mezın ya Kurdan

Gava navdêr bı dengdêrê bıqede "y" ya kelıjandınê dıxwaze. Mina:

Xwarziyê mın, xatiya te
Pêşmergeyên Kurdan

Eger dengdêr "a, e" bın ciyê xwe bıdın dengdêra veqetineka qedandiyê çêtıre. Mina:

Pêşmergên Kurdan
Masa melê, zerdela şêrin

Hınde navdêr hene mina mela, axa dengdêrên wan neyêne guhertın çêtıre.

Cinavkên desta mın nabın qedandek. Mina:

Mna rınd, teya zer nabe

Lê dıbın qedandek, Mina:

Rında mın, zera te
Pırtûka wê, gılka me

Cinavkên desta ez nabın qedandi. Mina:

Reşoyê ez, hespê tu nabe

Le bı hınde ewan dıbın gedandi. Mina:

Eza rınd, tûyê qenc, ewa delal

Cinavkên desta ez bı cinavkên peywendi ji têne bıkaranin. Mina:

Ez yê teme, tu ya Reşoyi

NEKIFŞİYA QEDİNEKAN

Nekıfşiya qedinekan bı vê ewayê jêrin pêktê

38. Qendandi nekıfşi: Gava Nekıfşi ya qedandiya yekani bıt "ek" a nekıfş û yekani û gava nekıfşiya qedandiya prani bıt "ne, nê" ya praniya hındık û nekıfşi bı dawiya qedandive têne danin. Mina:

Hespek şoreşê, tvıngek gemasan
Depek deri, pêşmergek fermonde
Hespnê şoreşê, tvıngnê gemasan

Institut kurde de Paris

Depne deri. Pêşmergne fermonde

Dı van qedinekanda şoreş, deri, fermonde tam gemasan ji bı curê xwe kıfşine. Hesp, dep, tving û pêşmerge nekıfşine. Teni desta pêşi tê zanin ku jı hespan hespek, jı tvıngan tvıngek, jı depan depek û jı pêşmergan pêşmergekinın. Desta paşi ji tê zanin ku jı hespan çend hespek jı tvıngan çend tvıngek jı depan çend depek û jı pêşmergan çend pêşmergekinın. Desta pêşi kijanın, desta paşi ji kijanın û hejmar çendın nayê zanin. Jı ber vê yekê qedandi nekıfşi tê gotın.

Qedandek nekıfşi: Gava nekıfşi ya qedandeka yekani bıt "ek" a yekani û nekıfşi, gava ya qedandeka prani bıt "na" ya praniya hındık û nekıfşi bı dawiya qedandekve têne danin. Mina:

Hespê şoreşek, tvınga gemasek
Depê deriyek, pêşmergên fermondek
Hespê şoreşna, tvınga gemasna
Depên derina, pêşmerge fermondena

Dı van qedinekanda jı berevajive, hesp, tvıng, dep û pêşmerge kıfşinın. Şoreş, gemas, deri û fermonde nekıfşinın. Bı kurtasi dı daneka pêşida jıbo qedandi çı hatıbû vekıtandın, dı vê danekêda jıbo qedandekêye ji. Jıber vê yekê qedandek nekıfşi tê gotın.

Qedinek nekıfşi: Jı herdu peyvan kêjan yekani bıt qertafa yekani û nekıfşi, kêjan prani bıt qertafa prani û nekıfşi bı wanve têne danin. Yani qedandi ji qedandek ji qertafên nekıfşi dıgırın. Mina:

Hespek şoreşekê, tvıngek gemaseki
Depnê derina, pêşmergne fermondena

Dı van qedinekanda hemi peyv ji nekıfşinın. Teni rêza pêşi yek lbiya wan û ya dawi ji praniya wan û curên herdu destan ji têne zanin, Lê kijan hespe yê kêjan şoreşêye, kêja tvınge ya kija gemasiye, çend depın kijan depın yên çend deryanın yanji yên kijan deryanın, çend pêşmergene kijan pêşmergene, yên çend fermondanın yan ji yên kijan fermondanın nayên zanin. Jıber vê yekê jı vê celebêra qedinek nekıfşi tê gotın.

Balakêş: Her çqas ev danaka dawi (qedineka nekıfşi) hındık ji têtc bıkaranin lê geleke dı rêzımanêda ci bıgırıt.

Institut kurde de Paris

QEDANDEK

39. Qedandek: Qedandek bı vê ewayê tê vekıtandın.

Navên prani çı nêr çı mê "an" a qertafa praniya tam yan ji "na" ya qertafa praniya hındık dıgırın. Mina:

Tvınga şoreşkeran, kıncê mêrna
Pora jnan, darê sêvna

Navên mê çı cûredar çı xweser "ê" ya qertafa mêyaniyê dıgırın. Mina:

Kıncê Zerifê, şirê çêlekê, hriya miyê
Tvınga keçıkê, tava havinê, hêka mrişkê

Heke nav bı dengdêra "a, e" bıqedın herdu dengdêr dıkevın û "ê" ya qertaf ciyê wan ji dıgıre. Mina:

Rengê masê, dara zerdelê, bermala odê

Navên nêr yên xweser, cinavk û rengdêrên çawani veqetandekan nagırın. Mina:

Mala azad, xaniyê mın, serê te
Pora reş, qelema zrav, benê drêj

Navên nêr yên curedar dı devoka Buhtida "i" ya veqetandeka nêriniye dıgırın. Mina:

Zinê hespi, Serê berani, kevırê diwari
Nirê gayi, hriya hogıji, rengê kaxezi

Navên nêr ji bıl devoka Boti ku zehfayi ji eve, çı navê curedar çı navên xweser bı vê ewayê jêrin pêktê:

Ew navên "a, e" têda tunebın, qertafan nagırın û naguherın ji yani wek xwe dıminın, heke "a, e" hebın disa qertafan nagırın lê yek jı wan "a, e" yan dıbe "ê" Heke yek jı wanbe ew lıb, du "a" bın "a" ya dawi, du "e" bın "e" ya dawi, "a, e" bın ya dawi dıbe "ê". Mina:

Ba bê, aş êş, hesp hêsp, xani xêni, deri dêri
Bajar bajêr, axa axê, kerem kerêm, xulam xulêm
Dengê bê, kefırê êş, zinê hêsp, banê xêni, depê dêri
Çemê bajêr, mala axê, mêrga kerêm, tvınga xulêm...

Dı devuka botida ew navên "ek" a qertafa nekıfşi û yek lıbi gırtıbın gorê zayenda xwe nêr "i" mê "ê" ji dıgırın. Mina:

Institut kurde de Paris

Zinê hespeki, gema mehinkê, hriya beraneki
Şirê bzınekê, golka çêlekekê, sma gayeki
Vê ewayê navdêrên qedinekê xwe ali heve dıtewinın.

Balakêş: Pışti qaydê guhertına "a, e" bı "ê" yê dı zmênda ci bû, dıvyabû ku dı gişk herêmanda û gişk peyv lı ser vê hêmanê pêkhatıbana lê hınde peyv ne tipên wan hatıne guhertın û ne ji mina devoka Buhti "i" ya veqetandek bı wanve hatıne danin. Wekok:

Depê dara berû, mala xalo, nanê tarikan
Kêra apo, tvınga karker, hespê reş...

Dı devoka Botida ji hınde peyvan qaydê xwe wında krıne. Yani "i" ya veqetandekê ne gırtıne. Wekok:

Fermana mir, serayê xundekar, tûyê şir
Tvınga sê agır, kıncê wezir, arê hevir

Ev qaydên jıbo qedandek hate danin, bê guhertın jıbo tewanga (kêşana) navane ji. Teni tewanga navan, gava navên nêryên xweser ji pışti rengdêra "vi, wi, kij" bên "i" ya nêriniyê dıgırın. Mina:

Vi Azadi, wi Dıjwari, wi Reşoyi
Wi Darayi, kij Zircki, kij Serdari

Dı qedandek û tewanganda ji, navdêrên bı dengdêran bıqedın "y" ya kelıjandınê geleke neyê jı bir krın.

TÊGIHÊN CELEBÊN QEDİNEKAN

40. Her destên qedinekan têgıhên curbecur dıdın diyar krın. Xwediti dıde diyar krın:

Bavê mın, diya te, pırtûka wê
Bavê keçıkê, diya zarokan
Kevaniya malê, serkarê banê

Curên qedandi dıde diyar krın:

Dara sêv, gustila zêr
Pertalê hri, nanê genım
Sewila ax, deriyê hesın

Dı navên xweserda ewladi dıde diyar krın:

Rıstemê Zal, Leylaya Qasım
Mesudê mele Mustefa, Mehemedê Eli
Eliyê Ûnıs, Qedriyê Cemilpaşa

Institut kurde de Paris

Dı navber zmên û navek xweserda zmanê wi geli dıde diyar krın:

Zmanê Kurdi, zmanê Erebi, zmanê Tırki
Zaravayê Kurmanci, zaravayê Sorani

Dı navber navek xweser û navek cida bûyina jı wê ciyê dıde diyar krın:

Seyıd Rızayê Dêrsımi, Şêx Seidê paloyi
Melayê Cziri, Fayiq Bucaqê Sêwereki

Dı navber navek xweser û navê eşirek, netewekda bûyina jı wê netewe û eşirê dıde diyar krın:

Selahedinê Kurd, mele Seidê Kurdi
Ehmedê Xani, mele Mustefayê Berzani

Istıare dıde diyar krın:

Pencê mrınê, teyrê eceli
Destê gel, şewata dıl...

Hınde celebên daçek û hokeran (ber, wek, paş, pêş, pışt, qas, hıng...) hene ku carna qertafên qedandi (a, ê) nagırın û têne bıkaranin:

Reşo beri Azad hat, Dıjwar qasi Şoreş şerkere
Wek te, weki te, Hıngi mın, paş xani, pêş deri

Û hınde ji (dû, pê) hene ku hêç qertafên qedandi nagırın:

Dılvin lı dû mın bû, ez lı pê dozê ketım...

Institut Kurde de Paris

WANE VII

TEWANG - KÊŞANA NAVAN

Parçek jı Şvanê Kurd:

41. Lı ber çiyayê Sipanê em gelek ne man. Pışti çend rojan jı serfermandar emır hate me ku em bı pêşve herın. Belê lı ser serdestiya ordiyên Ûrıs eniya şer gelek çûbû pêş. Zabıdeki çend kozak û ez ji bı xwera brım û dı pêşiyêda derket. Dıviyabû beri hatına esker, em jı qerargehêra ci, jı ordiyêra xwarın û jı dewaranra ji êm peyda bıkın.

(Ereb Şemo)

Ev nvisandın rabûna arteşeni jı ciyeki û çûyina ciyek dın dıde diyar krın.

Vekırın:

Tewang: Dı nvisandına jorinda, navdêran û desta qedinekên navdêran, gişk wek hev daçek û qertaf ne gırtıne. Lı ber çiyayê Sipanê û lı ser serdestiya ordiyên Ûrıs, daçeka "lı", jı serfermandar daçeka "jı", bı pêşve daçeka "bı" qertafa "ve", bı xwera daçeka "bı" qertafa "ra", dı pêşiyêda daçeka "dı" qertafa "da", jı qerargehêra, jı ordiyêra û jı dewaranra daçeka "jı" qertafa "ra" gırtıne û xwe ali lêkeranve tewandıne. Nexu navdêran bı van daçek û qertafan mnasêbetên xwe bı lêkeranra pêkanine.

Tewang: Navdêr û destên qedinekan gorê xebatên xwe, mnasêbetan rût bı serê xwe yan ji bı qertafan, bı daçekan û bı daçek û qertafanve xwe ali lêkaranve dı tewinın û jı heryek van mnasêbetanra "tewang" tê gotın.

CELEBÊN TEWANGAN

42. Tewanga rût: Navdêr bê daçek û bê qertaf xwe ali lêkeranve dıtewine:

Reşo hat, Fênıs, Kerevan, û Zerif hatın
Şiyar nan xwar, Dıjwar şer kır, mın tu diti
Tetwan ava bû, Diyarbekır xemıli

Tewanga bı qertaf: Navdêr qertafan dıgırın lê bê daçek xwe ali lêkerve dıtewinın:

Ez Diyarbekırê dıbinım, tu Tetwanê nabini
Ez çûme Wanê, me Kerevanê Şevger şande dehlê
Mehinê giya xwar, Jnıkê şer kır, mêran dest hıldan

Tewanga têdayi: Daçeka "dı" cda lı pêşi, qertafa "da" lı paşi bı navdêrve têne danin. Gava daçek û qertaf bı serê xwe bêne bıkaranin, bı heve dıgırın û dıbın cinavka "têda". (lı mjara 56 an bınêrın.)

Ez dı Tetwanêda rûdınım, tu têda rûdıni
Ez dı hatına xweda gelek êşam, tu têda ne êşayi
Reşo dı zevi û parêzêda dıxebıte, tu têda xebıti

Tewanga "lê"yi: Daçeka "lı" cda lı pêşi navdêran tê danin. Dema daçek bı serê xwe bête bıkaranin, dıbe cinavka "lê":

Ez lı Tetwanê rûdınım, ez lê rûdınım
Ez lı ser kevır radızêm, ez lê radızêm
Tu lı hêsp swar dıbi, tu lê swar dıbi
Tu lı mal xwarın dıxwi, tu lê xwarın dıxwi
Ew lı Kurdıstanê bû, ew lê bû
lı cem te, lı nık wê, lı bal Ozmên

Tewanga "jê"yi: Daçeka "Jı" cda lı pêşiya navdêran tê danin. Dema daçek bı serê xwe bıt dıbe cinavka "jê":

Koledar jı mın dıtırse lê ez jê natırsım
Ez jı Dêrsımê têm, ez jê têm

Tu jı mala xwe rabûy çûy şer, tu jê rebûy çûy şer
Jıbo mın, jıbo xwe û jıbo wê bine

Tewanga "pêve" yi: Daçeka "bı" cda lı pêşi, qertafa "ve" lı paşi bı navdêranve têne danin û dema daçek û qertaf bı serê xwe bêne bıkaranin bı heve dıgırın û dıbe cinavka "pêve":

Mın ta bı derzive kır, mın ta pêve kır
Te av bı cûyêve bır, te av pêve bır

Tewanga "jêra" yi: Daçeka "jı" cda lı pêşi, qertafa "ra" lı paşi bı navdêranve têne danin û gava daçek û qertaf bı serê xwe bêne bıkaranin, peve dıgırın û dıbe cinavka "jêra":

Mın jı bendêra rêznamek çêkır, mın jêra çêkır
Te jı dozêra tu ne kır, te jêra tu ne kır

Tewanga "pê" yi: Daçeka "bı" cda lı pêşi navdêran têtc danin û gava daçek bı serê xwe be dıbe cinavka "pê":

Rêya mın bı Diyarbekırê ket, rêya mın pê ket
Şolê mın bı axê tune, şolê mı pê tune

Tewanga "Jêve" yi: Daçeka "jı" cda lı pêşi, Qertafa "ve" lı paşi bı navdêranve têne danin û dema daçek û qertaf bı serê xwe bêne bıkaranin bı heve dıgırın û dıbe cinavka "jêve":

Ez jı Dêrsımêve têm, ez jêve têm
Tu jı Sêrtêve tê? Belê ez jêve têm

Tewanga "pêra" yi: Daçeka "bı" cda lı pêşi, qertafa "ra" lı paşi bı navdêranve têne danin. Eger daçek û qertaf bı serê xwe bêne bıkaranin, bı heve dıgırın û dıbe cinavka "pêra":

Ez bı Reşora hatım, ez pêra hatım
Tu bı mınra hati, ez bı tera çûm

Tewanga "pêda" yi: Daçeka "bı" cda lı pêşi, qertafa "da" lı paşi bı navdêranve têne danin. Heke daçek û qertaf teni bın peve dıgırın û dıbe cinavka "pêda":

Ez bı ser koledarda ketım, ez pêda ketım
Tu bı mında keti, çı jı mın dıxwazi?

Tewanga "jêda" yi: Daçeka "jı" cda lı pêşi, qertafa "da" lı paşi bı navdêranve têne danin û dema daçek û qertaf teni bın, bı heve dıgırın û dıbe cinavka "jêda":

Ez jı çiyêda têm, ez jêda têm

Kêmayi jı tedaye, gel jı xweda şiyar bûye

Tewanga "têra" yi: Daçeka "dı" cda lı pêşi, qertafa "ra" lı paşi bı navdêranve têne danin. Heke daçek û qertaf teni bêne bıkaranin, bı heve dıgırın û dıbe cinavka "têra"

Ez dı nav şoreşêra dervaz bûm, ez têra dervaz bûm
Tu dı rêya Sipanêra hati? Belê ez têra hatım

Tewanga "têve" yi: Daçeka "dı" cda lı pêşi, qertafa "ve" lı paşi bı navdêranve têne danin. Eger daçek û qertaf bı serê xwe bêne bıkaranin, bı heve dıgırın û dıbe daçeka "têve":

Ez dı malve bûm, ez têve bûm
Pez dı govêveye, pez têveye
Hırç dı gehêveye, hırç têveye

Balakêş: Ev daçek teni yan ji daçek û qertaf pevra ku dıbın cinavk, teni jıbo yekaniya kesê sısêyane.

Yek ji: Ew navdêrın bı daçek û qertafan têne tewandın carna hınde daçek dıkarın bıkevın. Mina:

Ez maldame, ciyi ez dı maldame
Serbazra çû, ciyi bı Serbazra çû

Tewanga "bangşani": Daçekek jı daçekên "bangşani" (gdi, hey, lê, lo...) cda lı pêşi navdêran têne danin. Jıbo navdêrên mê "ê" ya mêyani bı dawiya navdêranve danin peywiste. Navdêrên nêrji carna "o" ya nêrini dıgırın. Jıbo praniya herdu zayendan ji "no" ya qertafa praniya bangşani dıxwaze. Jı daçekên bangşani; "lê" jıbo mêyan, "lo" jıbo nêrane û yên dın jıbo herdu zayendane ji. Wekok:

Lê Fatê! lê Zerifê! gdi Belçımê! lê dotmamno!
Lo Xweşmêrno! lo Kerevano! lo Azad! lo kurmamo!

Tewangên bangşani carna bê daçekên bangşani ji pêktên. Dı vê tentêlêda lı dawiya navdêranve danina qertafan (ê, o, no, yê) peywistiye. Wekok:

Jnmamê! xwişkê! delalê! keçxalê! keçno!
Pısmamo! hevalo! brawo! kurno! hevrino!

- -

Xelqo lı mın kın şiretê
ew dılbera zêrin kemer
mın di dı halê xefletê
derket jı burcê wek qemer (Melayê Cziri)

WANE VIII

NAV Û ÇÊBÛNA NAVAN

43. Nav: Rader navın, mina navan dı qedinekanda ci dıgırın û mina navan têne tewandın:

Hatına mın, çûyina te, ketına koledar
Jina mın, vejina te, mırına xwinmıj
Dı hatınêda, jı hatnêra, bı hatınêve
Jı hatınê, bı hatınê, lı hatınê
Bê hatın, bê jin, bê mırın

Rengdêr navın, Mina navan dı qedinekanda ciyê xwe dıgırın û mina navan têne tewandın:

Mezınê mın, pçûkê te, Zeriya Reşo, reşê şevê
Dı mezınayêda, jı mezınayêra, bı mezınayêve
Jı mezınayê, lı mezınayê, bı mezınayê

Navên hevedudani: navên hevedudani jı du navan pêktê. Ew ji yan rastbırast herdu nav peve dıgırın yan ji dı navber herdu navanda "e" yan ji "bı" têne danin û bı heve dıgırın:

Grav, serder, çrav, xwedipez, canbaz
Sergır, berdest, serdest, malmezın
Kalemêr, gregır, şêrejın, nêremûk
pıştemêr, keremeji, kevneperest

Institut kurde de Paris

Rastbırast, destbıdest, rojbıroj
Karbıdest, destbıkêr, berbıxêr

Navên hevedudaniyên nav û lêker: Ev celebê navan, bı heve danina nav û qurmê lêkera fermanê pêktê û dıbe navê wan kesên ku wê meslekê, wi şoli dıkın, yani kırdenavên taybeti:

Karker, zêrker, dranker, tevınker
Mêrkuj, pırbêj, nanpêj, avkêş, serêş
Pezkır, darbır, şevger, pırtûkfıroş

Jı lêkeran çêbûna navan: Bı lêkeranve danina yek jı qertafa "ok, ox, ek, er" pêktê û dıbe navê wan kes û heyinên ku wê meslekê û wi kari dıkın, yani kırdenavên gelemperi. Qertafa "ek, er" hındık ciyanda têne bıkaranin lê "ok, ox" gelemperine û ev herdu qertaf dı ciyên hevda ji têne xebıtandın. Qertafa "er" dı hınde ciyanda dıbe "ar":

Pêjer, bêjer, nviser, cotar, didar
Kolek, brek, drek, vrek, zırtek, fortek
Krok, şandok, veşartok, xwestok, gezok
Gotox, ketox, kuştox, çandox, bezox,

Bı qertafa "van" çêbûna navên meslekan:

Şvan, gavan, berxvan, nçirvan, aşvan
Çirokvan, xwendevan, şoreşvan, dergevan

Bı qertafa "geh, stan, xane" çêbûna navê ciyan:

Seyrangeh, pêgeh, çandıngeh, çêrongeh
Barigeh, êwırgeh, qerargeh, nêringeh
Kurdıstan, darıstan, Tırkıstan, hovıstan
Karxane, çlexane, gırtixane, xebatxane

Haj: Jıbo svıkayi carna "h" ya "geh" tê êxıstın, "ge" teni dımine. Wekok:

Çandıngeh çandınge, barigeh barige, pêgeh pêge

Bı lêkera "dan, dang" çêbûna navên fraxan:

Şekırdang, xwêdang, xwelidang, çaydan, kıldang
Derzindang, êzıngdang, zêrdang, zivdang, moridang

Bı qertafa "in" çêbûna navan. Ev qertaf têgıha jı wê heyberê û xweriti dınımine.

Zêrin, zivin, darin, berfin, kurin, keçin

Institut kurde de Paris

Hespin, marin, gayin, hırçin, gurin, kerin

Bı qertafa "ane" çêbûna navan. Manendi, wekiti dınımine:

Mêrane, şêrane, jnane, pêşmergane, mirane
Keçane, kurane, bûkane, şahane, karkerane

Bı qertafa "ani" Çêbûna navan. Ev ji herweki manendi, wekiti dınıme:

Mêrani, keçani, kurani, jnani, mrovani
Xortani, cwanani, şahani, şêrani, mirani

Bı qertafa "i" çêbûna navan. Ew navên bı dengdêran qedabın yan "y" ya kelıjandınê dıgırın yan ji qertafa "i" dıbe "ti" û ew navên bı bêdengan ji bıqedın, carna qertafa "ti, eti, iti" tên bıkaranin:

Karkeri, şvani, gavani, aşvani, xulami, maldari
Xeradi, axati, melati, miriti, xwarziti, brati
Camêri, avayi, paşayi, paleyi, petşayi, axayi
Merdi, kaliti, jniti, keçiti, piriti, keriti
Qenci, xulameti, endameti, hevaleti, şvaneti

Bı qertafa "ayi" jı hınde celebên rengdêran çêbûna navan. Qertafa "ayi" carna dıbe "ahi, asi" ji. Ew navên bı dengdêran bıqedın, "ayi" dıba "tayi":

Sorayi, zerayi, hşinayi, keskayi, reşayi
Gewrayi, pehnayi, drêjayi, stûrayi, belekayi
Kurtasi, sorahi, spitayi, mezınahi, reşahi

Bı qertafa "ık, ok, kok" nav tên pçûk krın û xweşkok krın. Ew "ık" a bı navê "mêrık, jnık, keçık, kurık, stûnık, darık..." ve gırtıne, herweki ku bûna hêmana navan, êdi jı wanra "ık" a pçûkayi neyê gotın çêtıre. Gava ew nav bêne pçûk krın geleke "ok" a pçûkayi bı wanve bêne danin:

Malık, barık, merık, tevrık, bêrık, kevçık, tasık
Xanikok, derikok, sevikok, jnıkok, keçıkok, darıkok
Sewilok, lehêfok, merıfok, dasok, bvırok, kaxezok

Bı qertafa "i" jı lêkeran çêbûna navan, servenav, ismi meful. Heke lêker bı dengdêra "i" qedabe, ew "i" ya qertaf nayê danin. "i" ya lêkerê hım wezifa xwe hım ji wezifa "i" ya qertaf dıbine. Heke lêker bı dengek dın qedabe "y" ya kelıjandınê dıxwaze:

Mri, keti, hati, veketi, kuşti, hlati xwari
Hıldayi, razayi, vezelayi, rabûyi, çûyi drayi
Bri, bezi, keni, revi, xemıli, sekini, denzi

Jıbo baş têgıhanê, nemaze jıbo lêkerên bı dengdêra "i" qedayi, cinavkek peywendi gorê zayendan (ê, yê, a, ya) yan ji gorê mêjerê (ên, yên) lı pêşi lêkeran cda têne danin.

Bı vê ewayê servenav çêtır tê zanin:

Yê keni, yê şemıti, yê sekıni, ê bri, ê revi
Ya xemıli, ya perçıqi, ya çrısi, a tewızi
Yên tevızi, yên gevızi, yên fetısi, yên derıki

Bı qertafa "ende, mend" çêbûna navan:

Prende, goyende, frende, darende, sazende
Gerende, bêjende, kalende, jenende, binende
Eqılmend, hzırmend, hışmend, hnermend
Dewlemend, behremend, pişemend

Bı qertafa "baz" çêbûna navan:

Leyzbaz, canbaz, sêhrbaz, fêlbaz, kinbaz
Rımbaz, şûrbaz, hilebaz, helqebaz, heqlebaz

Rıstem û Cımşid û Xalıd Hemzeyan şêrê Eli
Aferın ya şehswarê Tırk û rımbazê Ereb (Melayê Cziri)

Bı qertafa "i" çêbûna navên zmanan:

Kurdi, Kurmanci, Sori, Lori - gelhori, Zazayi
Tırki, Tırkmeni, İngilisi, Elemani, Hûnani

Gava dabaş jı zmanan bête kırın, cda lı pêşi danina daçeka "bı" çêtır tê zanin. Wekok:

Bı Kurdi, bı Kurmanci, bı Tırki, bı Erebi
Ez bı Kurdi dınıvisım û bı Kurdi dıxwinım
Tu bı Kurmanci bınıvis û bı Kurmanci bıxwin
Ew bla bı Tırki bınıvise û bı Tırki bıxwine

Bı qertefa "i" kıfş kırına ci û menşeyên kes û heyinan

Kurdıstani, Diyarbekıri, Dêrsımi, Çiyayi
Mûsıli, prûti, xeradi, deşti, İngilisi
Tırkıstani, bajari, gundi, Kumsi, Farqini
Leyla Qasımê Mûsıli Apoyê Kumsi, Reşoyê Dari

Institut Kurde de Paris

Seyıd Rızayê Dêrsımi, şêx Seidê Paloyi
Şûrê Bıtlisi, Tvınga İngilisi, xencera Nêrgızi

Bı qertafa "i" kıfş kına mensubiyeta jı malbat û eşiran:

Merwani, Şerefxani, Bedırxani, Berzani, Eyûbi
Osmani, Cıbri, Heseni, Bekıri, Reşkoti, Alıki
Batıki, Bêrti, Sloqi, Mamxwıri, Heyderi, Sipki

Bı qertafa "ki" çêbûna navan:

Kurdki, mrovki, mêrki, pehlivanki, şvanki
Şêrki, hespki, hırçki, rûviki, kewki, teyrki

Bı qertafa "dar" çêbûna navên xwediti:

Maldar, koledar, deyndar, kridar, rezdar
Çekdar, kindar, navdar, dkandar, zordar
Zêrdar, mêhvandar, hêzdar, karxanedar

Bı qertafa "ar, yar" çêbûna navan:

Kıryar, bıryar, cotyar, salyar, pırsyar
Jengar, nvisar, gotar, krar, pûtar, kevnar

Bı cinavka "hev" çêbûna navan. Cama cinavka hev dıbe hem:

Heval, hevri, hevzava, hevbend, hevwelat
Hevderd, hevser, hevpa, hevdem, hemdem, hember

Bı qertafa "ani" jı hejmaran çêbûna navan:

Yekani, duwani, sêyani, çarani, pêncani, dehani
Bistani, siyani çlani pênciyani, sedani, hezarani

Bı qertafa "ek, ik" jı hejmaran çêbûna hınde navan:

Nehek, heftek, şeşek, çarek, çarik

Bı çı ewayê dıbe bla bıbe, bı çı tevinek, qertaf û celebên hevedudaniyan dıbın bla bıbın, gava nav pêkhatın, mina navên hêmani, dı qedinekanda ci dıgırın û mina navan têne tewandın ji.

MARŞ

Xortên Kurdan tevda rabın dılşadoxweşi
Em Kurên Kurdıstanın her bêjın bıji
Her bıji Kurdıstan her bêjın bıji
Ev welatek pır şêrine her bêjın welat
Rêberên xwinfıroşın bo jina welat

Her bıji Kurdıstan her bêjın bıji
Ser blındi kes nabine bê rojên dıjwar
Wek şêrên brindarın bo tene xwinxwar
Her bıji Kurdıstan her bêjın bıji

(jı Hewarê Nami)

Parçek xwendınê
Daxwaznamek

Ber cahê qeymeqam

TETWAN

44. Dbıstana me gelek xweş, bê deng, bê qêr û bı esayişbû. Bı kêmasiya mamoste, pırtûk û tuneya pergalan ji disa qasi çarên dı desda heyi wanê me dıhate dan. Suxte bı hevra lı hev hati, bı aş û jı mamostanra berêzkar bûn. Dê, bavê me jı me razi û em ji dı nav gelda bı rûmet bûn. Suxtên Kurd û Tırk wek bran bı hevra dıxwendın û dı navber meda doz û têkoşerek jı dıl çênedıbû. Gava hınde têkoşinên ne gring hebûna ji gerindên dıbıstanê, heval û hogıran bı dadi dıqedandın û rojek ji jı hev psû ne dıman.

Dılxweşi û rûgeşiya me heta hatına mamostên njadperest domand.

Pıştı hatına wan mamostan, sazımana dbıstanê herıfi. Dı şûna bratida dıjmıni, dı ciyê wane û xwndınêda njadperesti ghandın, lı ciyê dadi bê dadi destpê kır û ghijte gehinekek wısan ku êdi çara xwendına me ne ma û jina me ji dı bê ewleyêdaye. An waha:

Mamoste dgel wan njadperestên gahandi, lı ber derê dbıstanê radıwestın. Gava em lı ber wanra dervaz dıbın, mina guran lı me dınêrın û alaziya gırtın û lêdana me dıkın. Dema em xwe dıparêzın, qêrin û hewar dıkın "qomûnist pêşberi mamostan hatın" dıbêjın û serde gliya me ji dıkın.

Dı snıfêda bê sedem me dı qutın û dıçın jı gelra "İro qomûnistan xwedê ninkurandın û me ji bı hêz û destûra xwedê lı wan xıst" dıbêjın. Gava em derdıkevın nav gel ango hıngorê dıçın mal, jı mera "Lawo hûn têjıkê msılmananın, jıbo çı bûne qomûnist

Institut kurde de Paris

û xwedê dıninkurinın?" dı bêjın. Em ji lal, ker û gêj dıbın û nızanın ka çı bersıva gel, dê û bavan bıdın.

Cama ji bê sedem û bê doz jı gelra "Şevêdi flan û bêhvan kesan çra vekujtın û gotın, heke xwedê heye bla bêt vê çrayê vêxıt ku em ji wek we bawer bıkın, eger ne, hun dev jı van baweriyên kevnare berdın" û disa jı gelra "Edi flan kes jı bavê xwe drav nastine, lewra jı nav Ûrıs drav jêra tê" dıbêjın û lı dane bawer krınê ji dıxebıtın.

Bı kurtasi ewani, bêbexti û nemırovaniyên ku dı dbıstana meda têne krın, hşê mrovan radıwestine. Eger pêşi lê neyê gırtın, dê bıbe brinek wsan ku êdi çara derman krınê û kewandınê nemine.

Jıbo pêşi gırtına van bûyeran û dbıstana me zvırandına drûva xwe ya pêşin, em bı berêzkari daxwazên xwe pêşkêş dıkın. 20.1.1978

Lı ser navê suxtên şoreşker
Dılvin Plıng   Xweşmêr Serhıng

Institut Kurde de Paris

WANE IX

CİNAVK

Keçıkên tevınker yên mehfûrê

45. Gava vegeriyan hatın mal û rojaniya xwe dane dêya xwe, dê dit ku Zizê wê rojê jı xwıha xwe qemeriyek û niv zêdetır anibû. Beri jê kêmtır tani. Dê ecêbmayi ma. Jı Zizê pırsi. Zizê got:

- Dadê! heta nho mın rınd nızanibû em çra dıxebıtın. Rındê bı mın qenç da sehkırın û kete serê mın û iro mın jı Rındê 150 grê bêtır grê dan.

- Rındê jı tera çı got?

- Jê bıpırs dadê ez wek wê rınd nızanım bıbêjım.

Rındê û Gefo ji xwe ghandıbûn wan. Rındê dest bı gotınê kır lê nıkarıbû bıqedine, çavên wê teji hıstır dıbûn, dê ji dıgıriya.

(Celadet Bedırxan)

Ev nvisandın jin û xebata malek xzan dıde diyar krın

Vekırın:

Cinavk û celebên cinavkan: Dı nvisandına jorinda Zizê, dı ciyê navê xweda "mın, ez", dı ciyê navê Rındêda "wê, jê", dı ciyê navê xwe û Rındêda "em", dê ji dı ciyê navê Zizêda "te" bıkaranine. Di-sa dı cinavê herdu keçıkanda xwe û dı ciyê navê gişk kıfletda "wan" hatıne xebıtandın.

Vaye ev (mın, ez, wê, jê, em, te, xwe, wan...) cinavkın, yani bê kêmasi ciyên navan gırtıne.

Ew peyv, daçek, tevinek û qertafên ciyên navan dıgırın yan ji ışaret dıkın jı wanra cinavk tê gotın.

CELEBÊN CİNAVKAN

Cinavkên kesin:

46. Cinavkên kesin: Cinavkên kesin ewın ku heyinan dı drûva sê kesanda dıdın diyar kırın. Şxwe heyin gişk lı dorê sê kesan dıcevın. Kesê dıpeyive, kesê guhdar û kesê dabaş jê tê kırın. Jı vanra, yê dıpeyive kesê yekan, yê guhdar kesê dudan, yê dabaş jê tê kırın kesê sısêyan tê gotın. Heke yeki teni bıde diyar kırın yekani. Yê dıpeyıve yekaniya yekan, yê guhdar yekaniya dudan, yê dabaş jê tê kırın yekaniya sısêyan û heke jı yeki zêdetır bıde diyar kırın prani, yên dı peyivın praniya yekan, yên guhdar praniya dudan û yên dabaş jı wan têne kırın praniya sısêyan têne gotın. Jı yekani û praniya sısêyanra kes û kesên wında ji bête gotın dıbe.

Dı zmanê meda du deste cinavkên kesin hene, heryek jı wan xwedi mınasebetên taybetine.

Emê jı destekra desta ez, jı ya dınra desta mın bıbêjın.

Desta ez		Desta mın
Ez	(kesê dıpeyıve)	mın, mı
Tu	(kesê guhdar)	te
Ew	(kesê dabaş jê tê kırın)	wi- nêr, wê-mê
Em	(kesên dıpeyıvın)	me
Hûn	(kesên guhdar)	we
Ew	(kesên dabaş jı wan têne kırın)	wan

DESTA EZ

47. Desta ez: Dı peyıvinêda carna "z" ya cinavka "ez" dıkeve, "e" teni dımine. Dıciyê ez hatımda e hatım tê bıkaranin lê dı nvisandınêda dıvê neyê êxıstın.

Institut kurde de Paris

Cinavka "ez" dıkare bıbe "wez" û "hûn" ji dıbe "wın"

Jı cinavkên desta "ez" yekani û praniya sısêyan bı eyni cinavkê têne bıkaranin. Herçıqas dı hınde herêmanda "ewan, ewana" bıkartinın ji lê jı "ew" zêdetır têgıha "wan" têda dıxwıyê, şxwe ev bı çewti ketiye zmên, dıvê bête derêxıstın. Jıber vê yekê dıvê yekani û praniya sısêyan bı cinavka "ew" bête bıkaranin. Çawan dı daneka ahengiya lêkeranda ji (125 ê bınêrın) tête diyar krın ku yekani û praniya cinavka "ew" bı lêkerane:

Yekani	Prani	Yekani	Prani
Ew hat	ew hatın	pêşmerge hat	pêşmerge hatın
Jın hat	jın hatın	Mêr dıxwe	mêr dıxwın
Ew rınde	ew rındın	keç nakene	keç nakenın

48. Cinavka "ew": Hate zanin ku cinavka "ew" hım yekani û hım ji prani dınımine. Diyar krına yekani û prani ji bı lêkerane. Nexu ew ciyên ku (gişk dem û kêşanên lêkera bûn, gişk dem û raweyên lêkerên nedervazi, dema nha û bêya lêkerên dervazi) ev cinavk dıbe kırde, heke nav pxwe ji bıbe kırde, bêdro bı tu ewayê nayên prani krın. Çawan lı jorin (pêşmerge hat, pışmerge hatın, mêr dıxwe, mêr dıxwın, keç nakene, keç nakenın, jın hat, jın hatın) ji dıxwıyê mêjera kırdan bı lêkerane. Yani lêker yekani û praniya kırdan dınımine. (lı 125, 254 an bınêrın)

Herçıqas hınde mrov dı van tentêlanda navdêran prani dıkın (pêşmergan hatın, mêran dıxwın, keçan nakenın) ji, lê ev çewte û geleke neyê bıkaranin.

49. Pzo ev celebên navan û cinavka wan "ew" gava dı desta qedinekanda bıbın kırde têne prani krın. Û lêker ji pêra ahengine, şxwe qaydê qedinekan ji eve. Wekok:

Yekani	Prani
Ewê rınd hat	ewên rınd hatın
Karkerê gernas hat	Karkerên gernas hatın
Ewa pçûk dıxwe	ewên pçûk dıxwın
hespê beza rınde	hespên beza rındın

Gava hevok bı lêkera bûn pêkbên disa kırde têne prani krın û şxwe ev ji jı celebek qedinekan têne hejmartın:

pêşmergên qencın pêşmergne qencın
hespên şoreşêne hespnê şoreşêne

Bı lêkera bûn bı vê ewayê ji tê bıkaranin

rınd ewe rınd ewın
qenc ewe qenc ewın

Yek ji jıbo agahdari bı vê ewayê çêdıbın

Ewın hatın hespın dıxwın
Karkerın dıxebıtın sermayedarın wan dımıjın

Têgıha van hevokên rêzên dawi, yani yên hatın ewın û yên dıxwın hespın, ne heyinek dının û yên dıxebıtın karker, yên wan karkeran dımıjın ji sermayedarın û ne kesên dının.

50. Cinavkên desta "ez" bı tu ewayi nabın qedandek û nayên tewandın ji. Ev cinavk qertaf lêkeran dıgırın û ev lêker, dem û raweyên jêrin bı wan têne kêşan:

Gişk dem û raweyên lêkera bûn:

Ezım, tuyi, ewe, emın, hûnın, ewın
Ezbûm, tubûy, ewbû, embûn, hûnbûn, ewbûn
Rındım, rındi, rınde, em rındın, hûn rındın
Rındbûm, rındbûy, rındbû, em rındbûn, ew rındbûn
Dê rındbım, dê rındbiy, dê rındbıt

Gişk dem û raweyên lêkerên nedervazi:

Çûm, çûy, çû, em çûn, hûn çûn ew çûn
Dıçım, dıçi, dıçe, em dıçın, hûn dıçın, ew dıçın
Dê bıçım, dê bıçi, dê bıçe, emê bıçın hûnê bıçın
Çûbûm, çûbûy, çûbû, em çûbûn, hûn çûbûn ew çûbûn
Dıçûm, dıçûy, dıçû, em dıçûn, hûn dıçûn ew dıçûn

Kêşana dema nha û bêya lêkerên dervazi:

Dıbınım, dıbıni, dıbıre
Em dıbının, hûn dıbının, ew dıbının
Dê bıbınım, dê bıbıni, dê bıbıre
Emê bıbının, hûnê bıbının, ewê bıbının
Vedıxwım, vedıxwi, vedıxwe
Em vedıxwın, hûn vedıxwın, ew vedıxwın

Dê vexwım, dê vexwi, dê vexwe
Emê vexwın, hûnê vexwın, ewê vexwın

Dıvê bête zanin ku gişk lêker bı vê qaydên jorin têne kêşan.

DESTA MIN

51. Desta mın: Jı desta mın cama "n" ya "mın" dıkeve "mı" teni dımine. Dı hınde herêmanda ji "emın" bıkartinın. Dı yekaniya sısêyanda zayend heye. Cinavka mêyan "wê" û ya nêran "wi" ye. Dı praniya sısêyanda ji dı demên kevında zayend hebûye. Jıbo mêyan "wêyan" û jıbo nêran "wiyan" dıhate bıkaranin lê nho hatiye jı bir krın û êdi nayê bıkaranin. Cinavka praniya dudan "we" dıkare bıbe "ewe û hewe" ji.

Ev lêker, dem û raweyên jêrin bı desta mın têne kêşan:

Gişk dem û raweyên lêkera hebûn û vin:

Mın heye, te heye, wê heye, wi heye
Me heye, we heye, wan heye
Mın hebû, te hebû, wê hebû, wi hebû
Me hêbû, we hebû, wan hebû
Mınê hebe, teyê hebe, wêyê hebe, wiyê hebe
Meyê hebe, weyê hebe, wanê hebe
Mın dıvê, te dıvê, wê dıvê, wi dıvê
Me dıvê, we dıvê, wan dıvê
Mın vibû, te vibû, wê vibû, wi vibû
Me vibû, we vibû, wan vibû
Mınê bıvê, teyê bıvê, wêyê bıvê, wiyê bıvê
Meyê bıvê, weyê bıvê, wanê bıvê

Balakêş: Kêşana dema bê: Mın dê hebe, dê mın hebe û mın dê bıvê, dê mın bıvê ji têne bıkaranin.

Dem û raweyên bori yên lêkerên dervazi:

Mın berda, te berda, wê berda, wi berda
Me berda, we berda, wan berda
Mın berdaye, te berdaye, wê berdaye, wi berdaye
Me berdaye, we berdaye, wan berdaye
Mın berdabû, te berdabû wê berdabû, wi berdabû
Me berdabû, we berdabû, wan berdabû

Institut kurde de Paris

52. Peywestiya danina cinavkan: Gava desta "ez" bıbe kırde, dı devoka Botida, jı bıl lêkerên dengdêra "i" qedayi danina cinavka praniya dudan teni peywıstiye lê dı devokên dında danin cinavka praniya yekan û dudan peywıstine. Gava desta "mın" bıbe kırde, jı bıl yekani û praniya sısêyan danina cinavkan gişk peywıstine

Dı hevokekda heke kırde jı cinavkek desta "ez" be, cinavkek jı desta "mın" dıbe serve:

Reşo tvıngê dıbine, ew wê dıbine
Azad Zerifê dışine, ew wê dışine

Dı hevokekda heke kırde jı cinavkek desta "mın" be, cinavkek jı desta "ez" dıbe serve:

Reşo tvıng dit, wi ew dit
Azad Zerifê şand, wi ew şand
Mın tu diti, wi ez ditım, te ew dit

CİNAVKA ZVIRANDİ

53. Cinavka zvırandi: Jı vê cinavkêra cinavka hêzdar ji tê gotın. Lewra jı cinavkên dın bı hêztır û xwerûtır heyinan dıde diyar kırın. Dı vê cinavkêda zayend tune. Jıbo herdu zayendan, gişk yekani û praniyan yek lıbe, ew ji "xwe" ye. "Xwe" dıkare bıbe "xwı" ji.

Cinavka "xwe" mina cinavkên desta "mın" dıbe qedandek û dıkeve tewangan ji:

Nanê xwe xwar û tvınga xwe hılda çû
Ez xwe dışom, mın xwe şuşt, ezê xwe bışûm
Bala xwe bıde mın, tu guh nadi xwe
Koledar jı xwe dıtırse, lewra stemkare
Ez bı xweme, tu bı xweyi, ew bı xweye
Em bı xwene, hûn bı xwene, ew bı xwene
Ez bı xwe hatım, tu bı xwe hati, ew bı xwe hat
Te jı xwera tvıngek kri
Emê xwinmıjên xwe raqewırının...

Ev "bı"ya daçek dıkare dengdêra xwe bêxe û "b" ji bıbe "p". Mina:

Ez pxwe, tu pxwe, ew pxwe...

CİNAVKA HEVAYİ

54. Cinavka hevayi: Jı vê cinavkêra cinavka pışkdari (muşareket) ji tê gotın. Lewra du kes têda pışkdarın. Jıbo herdu zayendan, yekani û pratiyan yek lıbe, ew ji "hev" yan ji "êk, yêk"e. Cinavk carna hev û dı, êk û du, yêk û du ji têne bıkaranin. Ev cinavk dıbe qedandek û dıkeve tewangan ji:

Destê hev gırtın, selam dane hev, çûne bal hev
Hev û du nasin, bı hevra rabûn, bı hev leyistın
Arikariya êk krın, nan dane yêk, em jı yêk hız dıkın

- -

Jı bıl hemd û selewatana
Çend kelime jı luxatan
Vêk xıstın Ehmedê Xani
Navê nûbara pçûka lê dani **(Ehmedê Xani)**

Daçeka "bı" dıkare bıbe "p" û "h" ya hev bêxe û xwe lı ciyê wê dayne. Bı hevra bıbe pevra, bı hev leyistın bıbe pev leyistın...

CİNAVKA KEVNÊ LÊKERİ

55. Cinavka kevnê lêkeri: Ev cinavk "ê" ye. Dıvê cinavkêda zayend tune û jıbo herdu zayendan yekaniya sısêyan teni dınımine. Yani ciyê cinavka wê ango wi dıgıre. Peyvên bı dengdêran qedayi "y" ya kelıjandınê dıxwaze.

Cinavka kevnê lêkeri herweki qertafekê edeti lı dawiya lêkeranve tê qertıfandın:

Mın gotê lı ciye mın gote wê ango wi
Mın dayê lı ciyê mın da wê ango wi
Ez dıbêjımê lı ciyê ez dıbêjıme wê yan ji wi
Mın şandê lı ciyê mın şande wê ango wi

CİNAVKA KEVNÊ DAÇEKİ

56. Cinavka kevnê daçeki: Ev cinavk ji mina cinavka kevnê lêkeri "ê" ye û bê zayende ji. Jıbo yekaniya sısêyan dı ciyê "wê,

Institut kurde de Paris

wi" da tê bıkaranin.

Ev "ê" ya cinavk, dengdêrên daçekan têxe û xwe lı ciyê wan datine. Heke bêdenga daçekê "b" be, dıbe "p" û "d" be, dıbe "t". Heke pêş daçek teni be, cinavk pêve dıgıre û heke paş qertaf ji hebe, têne cem hev û peve dıgırın. (lı 42 an bınêrın)

Pêşdaçekên ku cinavka "ê" bı wanve dıgıre evın: Lı, bı, dı, jı û paş qertaf ji evın: Da, ra, ve.

Cinavkê kevnê daçeki bı ve ewayê têne bıkaranin:

Lı ciyê

Ez lı koledar dıxım, ez lê dıxım
Ez bı wira, ez bı wêra çûm, ez pêra çûm
Mın jı karkera ani, mın jêra ani
Tvıng bı pêşmergera bû, tvıng pêra bû
Ez dı Kurdıstanêdame, ez têdame
Ez jı şoreşê têm, ez jê têm,
Tu jı xwinmıj dûri? Belê ez jê dûrım
Gelo rêya bavêmın bı Diyarbekırê ket? Erê pê ket
Mın ta bı derzive kır, mın ta pêve kır
Ez jı Diyarbekırve têm, ez jêve têm
Av bı agırda kır, av pêda kır
Jı darda ket, jêda ket
Dı çiyêra çû, têra çû
Benk dı lûlêve derket, benk têve derket

WANE X

CİNAVKÊN İŞARKİ

57. Cinavkên işarki: Cinavkên işarki dı eyni gavêda rengdêrên işarkine ji. Jı hev nasin wan: Eger ciyê navan bıgırın cinavkın. Eger bı navanra bên û navan kıfş, reng bıkın rengdêrın: Ev hat, ev cinavke. Ev mrov hat, ev rengdêre. Lewra dı hevoka "ev hat" da "ev" ciyê navi gırtiye û dı hevoka "ev mrov hat" da mrov kıfş krıye.

Cinavkên işarki mina cinavkên kesin du destene: Desta "ev", desta "vi". Desta "ev" mina desta "ez", desta "vi" mina deta "mın" dı kêşananda têne bıkaranin. (Lı mjara 47, 50, 51, 128 an bınêrın.)

Zayenda desta "ev" bı qertafa qedandi pêktê. Mina: Evê han, eva han. Desta "vi" yên yekani bı eda cinavkên mê nêr hene: "vê, wê" mêne û "vi, wi" nêrın. Cinevkên işarki evın:

	Desta ev	Desta vi
Jıbo heyinên nizık:	ev	vê, vi, van
Jıbo heyinên dûr:	ew	wê, wi, wan

Desta "ev" qertaflêkeran dıgırın û mêjera wan bı lêkerane, yani lêker yekanibın cinavk yekani, lêker pranibın cinavk ji praninın (47 an bınêrın)

Institut kurde de Paris

Yekani	**Prani**
Ev qence	ev qencın
Ew qence	ew qencın
Ev hat	ev hatın
Ew hat	ew hatın

Herçıqas "evan, ewan" bıkartinın ji lê disa têgıha "van, wan" dıdın.

Jıbo zelal krın û hêzdariya cinavkên işarki daçeka "ha, han" eda lı dû cinavkan têne danin. Cinavk bı veqetandekan xwe ali wanve dıdın û ramanên işaret krınê xwerûtır dıkın:

Nêr	**Mê**
Evê ha, evê han	eva ha, eva han
Ewê ha, ewê han	ewa ha, ewa han

Dı drûva qedandida prani:

Evên ha, evên han	ewên ha, ewên han

Ev daçeka "ha, han" dıde dû navan ji. Nav gorê zayend û mêjerê veqetandekan dıgırın, xwe ali wanve dıdın:

Maldarê ha, maldarê han	Qumbera ha, qumbera han
Lawıkê ha, lawıkê han	keçıka ha, keçıka han

Praniya qedandi ji:

Karkerên ha	koledarên han

Desta "vi" qertaflêkeran nagırın, dıbın qedandek û dıkevne tewangan ji:

Vi koledar kuşt	van welêt rızgar kır
Wi koledar raqewırand	wan welêt flıtand
Vê şoreş saz kır	van çek peyıdandın
Wê gel şiyar kır	wan gel ghand
Vê xwe rınd xemılandıye	van xwe amade krıye

Dıvê bête zanin ku dı desta "vi" da ahengiya lêker bı serveraye. (Lı mjara 126 an bınêrın) Praniya kırde bı tewangêye. Mina:

Vi karker şiyar krın,	karker prın
Van karker şiyar kır,	karker yeke

Institut kurde de Paris

CİNAVKÊN PIRSİYARİ

58. Cinavkên pırsiyari: Ev cinavk, bı pırsiyari ciyên navan dıgırın. Cinavkên pırsiyari yên pır têne bıkaranin evın:

Çı, çend, çqa, çqas, lı kû, kûve
Ki, kijk, kijan, kijkan
Kê, kêjık, kêjan, kêjkan?

Ki, kijık, kijan, kijkan jıbo nêrane. Kê, kêjık, kêjan, kêjkan jıbo mêyane.

Cinavkê pırsiyari, dı qedinekanda ciyê xwe dıgırın û dıkevıne tewangan ji.

Hınde jı van cinavkan ji mina cinavkên işarki (lı mjara 57 an bınêrın) heke ciyên navan bıgırın cinavk, heke navan reng û kıfş bıkın rengdêrın.

Bıkaranina cinavkên pırsiyari:

Ev çıye?, te çı ani?, tu çı dıbêji?
Ev kiye?, kê hat?, kêjanê arikariya gel kır?
Ki Kurdıstan vegırt?, ki nahewı?
Kijki ne hışt qutabi bıxwinın?

CİNAVKÊN GRÊKİ

59. Cinavkên grêki: Ev cinavk peyvek bı peyvek dınve, du hevokan bı heve grê dıdın. Jıber vê yekê jêra cinavka grêki tê gotın.

Ev cinavk dıbe qedandek lê nayê tewandın û bê zayende ji.

Cinavka grêki "ku" ye û bı eda tê danin.

Bıkaranina cinavka grêki:

Hespê ku te kri
Reşo got ku ezê stemkaran jı welêt raqewırinım
Xwinmıjên ku te di stemkarın
Ciyê ku tu neçıyê ne yê teye
Welatê ku te flıtand yê Kurdane

Ev cinavk bı cinavkên peywendi ji tê bıkaranin:

Yê ku te ani, yên ku tu dıki
Ya ku te dit, yên ku te şandın

Dı hınde herêmanda "ko" tê bıkaranin lê ya rasti "ku" ye.
Haj: "ku" şerti û daçeki ji tê bıkaranin. "ku" ya cinavki, şerti û daçeki bı têgıh û henkina hevokan jı hev têne nasin.

CİNAVKÊN PEYWENDİ

60. Cinavkên peywendi: Cinavka han gorê têgıh û ciyan, cda têne pêşi navdêran û peywenditi dıdın diyar kırın.

Ev cinavk jıbo yekaniya mê "a" ye, jıbo yekaniya nêr "ê" ye. Jıbo praniya herdu zeyendan yek ji "êd, êt, ên" e. Ev cinavk bı serê xwe jı têne bıkaranin lê bı "y" yêve bêne danin çêtıre:

Nêr	Mê	Prani
Yê mın	ya mın	yên mın
Yê Ferzende	ya Ferzende	yêd Ferzende
Yê pêşmergan	ya pêşmergan	yêt pêşmergan
Yê te	ya te	yên te
Yê Keleş	Ya Keleş	Yên Keleş
Ê gemasan	a gemasan	êt gemasan

Tvınga mın pır başe, ya te çawane?
Gundiyên me şiyar bûne yên we dı çı tentêlêdane?

CİNAVKÊ NEKIFŞİ

61. Cinavkên nekıfşi: Hınde cinavkên nekıfşi dı eyni gavêda rengdêrê nekıfşine ji. (lı mjarı 80 yan bınêrın.) Eger ciyê navan bıgırın cinavkın, heke navan reng û kıfş bıkın rengdêrın. Mina: Hınde hatın. Hınde cinavke. Hınde karker hatın, hınde rengdêre. Lewra dı hevoka pêşida hınde, ciyê navi gırtıye, dı hevoka dawida karker, reng û kıfş kırıye.

Ev cinavk, bı ewayek ne kıfşe ciyê navan dıgırın û gorê wan navên ku ciyê wan gırtıne têne tewandın.

Hınde cinavkên nekıfşi yên pır têne bıkaranin evın:

Yek, yeki, her, heryek, hne, hındek
Hınde, hnek, gelek, pır, heçi, kesek
Qet, flan, hemi, gi, gişk, tev, bêhvan

Çend, çendek, zehf, zaf, tevda, hêç
Tu, pçek, ê dın, ê mayi, hew, hewqa
Bıkaranina cinavkên nekıfşi:
Yek hat, yeki got, her tê, heryeki tıştek dıgot
Hne dıbın şoreşker û hne ji dıbın cehş
Hnek pêşmergene û hnek paşmerge
Hındek xwe nanasın û hındek ji bavê xwe
Gelekan jıbo rızgari xwe dane kuştın
Heçi hez jı welêt nekın, hez jı xwe ji nakın
Qet nanıvise, hêç xebatê nake
Flan hat, hemi çûne gundan, gi hatın
Gişk dıxebıtın, tev çûne dbıstanê
Bêhvan ji çû, çendekan gerdo û şêx raqewırandın
Çendek hatın, zehf çûn, zaf hatın
Tu nekır, pır xwar, pçek da mın
Ê dın ne çû şerê serxwebûnê
Ê mayi xwe ghande têkoşinê

- -

Hındek bı peyayi çûne baxan
Hındek bı swari çûne raxan
Hındek bı tebayê wiye kısret
Hındek bı hevalê wiye wehdet
(Ehmedê Xani)

CİNAVKÊN QERTAFİ

62. Cinavkên qertafi: Jı cinavkên qertafira qertafcinavk ji tê gotın. Lewra mina qertafeki edeti bı dawiya peyvanve dıgırın.

Dı daneka (mjara) lêkeranda ji dê bête dabaş kırın ku dı zmanê meda qertafcinavk û qertaflêker eynine. (Lı 95 an bınêrın) Heke bı navanve bêne danin qertaflêkerın û cinavkan ji dınıminın. Eger bı lêkeranve bêne danin qertafcinavkın.

Qertafcinavk, jı bıl dema boriya têdayi ya yekaniya sısêyan, bı gişk dem û raweyên lêkerên nedervazi û dema nho û bêya lêkerên dervazi dgel hınde lêkerên daxwazive têne danin.

Qertafcinavk evın:

Yekani

1- ım, yım, m, me, bûm, bûme
2- i, y, yi, bûy, bûyi
3- e, ye, bıt, bûye

Prani

1- n, in, yın, yin, ne, bûn, bûne, ın, nın
2- n, yın, ne, nın, ın, bûn, bûne
3- n, ın, yın, ne, nın, bûn, bûne

Dıvê bête zanin ku "in, yin" dı devoka Buhtidanın, yên dın gelemperine.

Bıkaranina van cinavkan:

Yekani

Hatım, çûm, çûme
Hati, çûy, çûyi
Dıçe, çûye, çûbıt

Prani

Em çûn, em çûyın, em hatın, çûyin, hatin
Hûn çûn, hûn hatın
Ew çûn, ew hatın

Balakêş: Herçıqas "bûn" lêkere ji lê lı vır bê ferq, qertaf cinavke

- -

Fezl û teriqa Neqşebend
Ger ew bı şorba germ bûya
Ew dizıka şorbe dı nêv
Dê şêxê Bestami bûya
Fezl û teriqa sofiyan
Ger ew bı rıh bıhta vucût
Ew nêriya lıhye tewil
Dê bê guman sofi bûya

Fezl û teriqa alıman
Ger ew bı şaşa gır bûya
Cısmê kulındê sermezın
Dê qazi beyzawi bûya
Fezl û teriqa qadıri
Ger teqteq û şeqşeq bûya
Ew şeqşeqa aşi yeqin
Dê qutbê gêlani bûya

(Axayokê Bêdari)

CİNAVKÊN XWEDİTİ

63. Cinavkên xweditiː Ev cinavk, jı cinavka "xwe", jı cinavkên

kesin yên desta "mın" û jı cinavkên işarki yên desta "vi" pêktên.

Cinavk eda lı pê navdêran têne danin. Navdêr ji gorê zayend û mêjerê veqetandekan dıgırın û xwe ali cinavkanve dıdın û têgıha xwediti (malıkiyet) dınıminın. Mina:

Mê	Nêr	Prani
Tvınga mın	şûrê te	karkerên wi
Şoreşa me	welatê wan	pêşmergên van
Qelema xwe	hıngıvê vê	hespên te
Pırtûka we	xaniyê van	pezên me

Gava nav dı dabaşêda dervaz bıbın, êdi carek ji jı wan axaftın nexwaze, hınga cinavkek jı cinavkên peywendi lı ciyên wan navan têne danin. Hemıne ku herdu cinavk jı hev eda têne danin.

Cinavkên peywendi jı mêjer û zayendê heyberan, cinavkên xwediti jı mêjer û zayendê xwediyan têne bjartın. Mina:

Mê	Nêr
Mehina mın, ya mın	Beranê mın, yê mın
Deftera te, ya te	kaxızê te, ê te
Bzına wê, a wê	hogıjê wi, yê wi
Breka vi, ya vi	xaniyê xwe, yê xwe
Dkana me, a me	kevırê we, yê we
Rma van, yavan	hespê wan, yê wan

Prani

Çêlekên mın, yên mın. Gayên te, yên te
Keçên mın, yên mın. Kurên xwe, yên xwe

PARÇEK XWENDINÊ
DI HAWİRA ZMÊNDA

64. Roja mrovan dest bı jina evati krıne, zman hatıye afırandın, ketıye bın fermana xwestın û hılberiya mrovan. Çawan dest, lıng, çav û gişk endamên bedena mrovan jı mrovan ehê nabın, wsan zmanê gelan ji jı gelan eda nabın. Heta gelek dı rûyê Dınyayida bıji, zmanê wi geli ji dê bıji. Zmanek dewlemend, bı koteki ne tête afırandın û ne ji wında krın.

Dı Gerdûnêda zmanê xzan û dewlemend hebûne. Zmanê xzan ne karine jinê bıdominın, pxwe mhane û gelên bı wan zmanan ji dı

Institut kurde de Paris

peyıvina ew ji mhane. Pzo em navê wan gel û zmanan dı rûpelên dirokêda dıbinin.

Zmanê dewlemend, dı nava henkina dirokêda şehrezayi, çand, pişe û gişk xwestınên cvaki afırandıne û heta roja me jina xwe domandıne û dıdominın ji. Jı vanra "zmanê nemır" tê gotın û gelên bı wan zmanên nemır dıpeyivın, ew ji wek zmanên xwe nemınn.

Zmanê me ji yek jı wan zmanê dewlemend û nemıre. Pışti serkevtına ola islami, karbıdestên Ereban bı gişk hêz û fınfonekên xwe yên çlûz û krêt, lê xebıtin ku çawan Qıpti, Berberi û hınde qewmên dın pşavtın û dabelandın, wsan Kurdan ji bıpışêvın û dabelinın.

Pışti Ereban vêca Osmaniyan bı eyni gelşê destpê krın û dı dema meda ji nokerên burjuwayên Tırk, Ereb û Farısan bı eyni lêp, fêlbazi û gelşan têne zmanê Kurdi ku bıpışêvın û Kurdan ji dabelinın. Zmanê me heta iro pêşber van şeran berevaniya xwe krıye lê dıvê jı iro paş em ji dı vi şerê granda arikariya zmanê xwe bıkın, lewra şer lı ser pışta zmên pır gran bûye, hetani nho bı gurz, şûr û şeşperan êriş dıdanê lê iro bı top, tang û frokan radıhıjnê.

Çara arikariya zmên, hin bûna nvisin û xwendına Kurdiye. Heke rojek beri em hinê xwendın û nvisandına zmanê xwe bıbın, emê bıkarıbın arikaya zmanê xwe bıkın. Eger ne, qada şeri teni jı zmênra dımine û zman ji bı wan çekên xwe yên kevın, bı van çekên nûdemra dê çawan vi şeri gran bıke û ser bıkeve nızanım.

Dıvê bête zanin ku roja zmên şergeh wında kır û bın ket, em rojek ji nıkarın xwe ragırın. Em ji mina wan qewmên kevın dê bêne dabelandın. Vaye ew zmanê me yê dewlemendê merêz ber bı wında bûnêve dıçe.

Misoger şerme, fediye, fhête ku mro bı salan lê bıxebıte zmanê biyaniyan hin be û zmanê xwe jı bir bıke.

Em bı mafedari gazından jı bav û kalên xwe dıkın û dıbêjin ku "wan jı mera tu karek qenc ne krıne". Belê raste, wsane lê em jı bir dıkın ku ew zmanê wan parasti û heta roja me ani, em wi ji naparêzın, wında dıkın û dıdın guran.

Gumandarım ku xortên pêşverû vê grıngiyê dê bıbinın, bızanın û xwediti lı zmên bıkın.

WANE XI

RENGDÊR

Rewşa bavê dlovan

65. Gava ez bircfehmê xwe bûm, mın çavê xwe bı ditına bavê xwe yê dlovan vekır. Emrê wi dorê pênci salêra hebû. Bejnekê zrav, ne kurt û ne drêj lê bû. Egala sor lı seri, şal, şapıkê spi lıber, gorê saxdırêj û benê kesk nexışandi lı pêyan, çara zer lı pıştê û xencerekê Nêrgıziya destisedef dı ber çarêda bû. Gava tavê dıda xencer û çara zer, têrijın jı wan dıçûn û serê têrijınan xwe dıgıhandıne egal û goran. Wê xemlê, dlê gelek mrovan dışewıtand.

Çar bra û çendek ji pısmam, hogır û lêzımên wi hebûn. Bı vê rewşa xwe gava jı derda dıhat, hınde bra, pısmam û lêzım jı berda radıbûn lê hındekan rûmeta wi ne dızanina û ranedıbûn. Bavê dlovan, jı wan bêhteng ne dıbû û dıgot "Dê roj bêt ku ew ji rûmeta mın bızanın".

Ev nvisandına jorin xeml û rewşa mêreki Kurd dıde diyar krın.

Vekırın:

Rengdêr: Dı nvisandına jorinda "bavê dlovan, bejna zrav, egala sor, şal û şapıkê spi, gorê saxdırêj, benê kesk, çara zer" dıborın. Dlovan, sor, spi, zrav, saxdırêj, kesk, û zer rengdêrın û çawaniya bav, bejın, egal, şal, şapık, gore, ben, û çarê dane diyar krın.

Disa "pênci sal, çar bra" dıborın. Pênci û çar rengdêrın, hejmara sal û bran dane kıfş krın. Cardi "gelek mrov, çendek pısmam, hınde bra" dıborın, gelek çendek, hınde rengdêrın, van ji bı ewayek nekıfşe hejmara pısmam, mrov û bran dane diyar krın.

Disa "wê xemlê, vê rewşê" dıborın, wê, vê rengdêrın, bı işaret xeml û rewş kıfş krıne.

Rengdêr, ew peyvên dı qedinekanda têne pışt navan, dıbın qedandek, reng, cıns, mezınayi pçûkayi, rındayi, skayi bı kurtasi çawaniya heyinan dıdın diyar krın, yan ji bı navanra tên bı hejmar bı pırs, bı işaret heyinan jı manendê wan dıqetinın jı wanra rengdêr têne gotın.

Dıvê bête zanin ku gava rengdêr bı serê xwe bêne bıkaranin jı navên heyinan tên hejmartın (lı mjara 43 yan bınêrın) û gava bı heyinanra bêne bıkaranin rengdêrın. Rengdêr taybetiyên heyinan dıdın diyar krın û heyinan jı hev zelal dıkın. Wekok: Gava mro bıbêje ev pırtûk, purtûka mezın, pırtûka pçûk, pırtûka zer, pırtûka pêncem, du pırtûk, kij pırtûk, pırtûkê, curbecur jı manedê wê kıfş dıke

---

Ne malê pır, ne gerdena stûr
Ne mal jı kurê qenera dane, ne jı yê xrabra

(gotınên mezınan)

BRÊN RENGDÊRAN

66. Brên rengdêran: Rengdêr dıbın du bır: Regdêrên çawani, rengdêrên kıfşkeri.

Rengdêrên çawani, bı bersıv dana pırsina "çawan?" tê nasin. Wekok:

Çawan	bav?	bavê dlovan
çawan	egal?	egala sor
çawan	dar?	dara hışk
çawan	keç?	keça bedew
çawan	kur?	kurê jir

Rengdêrên kıfşkeri, bersıv dana pırsa "çend, kijan?" têne nasin:

çend	bra?	çar bra
çend	pısmam?	çendek pısmam
çend	heval?	hınde heval
kij	mrov?	ew mrov
kijan	pırtûk	ev pırtûk

RENGDÊRÊN ÇAWANİ

67. Rengdêrên çawani: jı vanra rengdêrên bınyati (hêmani) û rengdêrên rengin (wesfin) ji tê gotın. Ev rengdêr dı hêmana zmênda hene û hin bûna wan bı bıhistınêne. Mina kesk, sor, zer, gewr, reş, spi, kurt, drej, mezın, pçûk û êd.

Ev rengdêr dı qedinekanda bı qedandeki ci dıgırın û têne tewandın ji. Yani eda danina wan lı pışt navan, dıbın qedandek û çawani û tentêla navan dıdın diyar krın:

Qelema sor, deftera spi, hubra kesk, sımbılê zer stûnıka drêj, xaniyê mezın, welatê freh, kêfa xweş.

Qedinekên rengdêri: Gava qedandek rengdêr bın qedinekên rengdêri te gotın.

Qedandi veqetandekên zayendan, ango qertafên prani dıgırın û xwe ali qedandeka rengdêrve dıdın:

Lawê delal, keçıka çeleng, karkerên jêhati, çekên gran, çiyayê blınd, koledarên zengin, kêfa xweş

Tewanga qedinekên rengdêri ji wlo pêkten:

Dikê reş, jı dikê reş, bı dikê reşve, lı dikê reş
Xana mezın, dı xana mezında, xana mezınve

Dı ciyê rengdêranda nav ji bı rengdêri carna têne bıkaranin û bı ewayek çawaniyên heyinan dıdın diyar krın:

Masa dep, deryê hesın, gustila zêr, diyarê kevır
Palasa hri, banê ax, dara spindar, xencera pola

RENGDÊREN MESLEKİ

68. Rengdêrên mesleki: Ev rengdêr du celebın: Hınde lı pêşi û hınde ji lı dû navan eda, nav ji bê qertaf têne danin û celebek

rengdêrên çawani dınıminın:

Serok Berzani, werger Noredin Zaza, hozan Cigerxwin
Rêzan Seit Elçi, parêzer Faiq Bucak
Fermonde İhsan Nuri, nvisvan İsmail Beşikçi, Eli axa
Mir Şeref, mfırdi Yekan, xan Dımdım, xazi Muhemmed
Doqtor Şvan, Şêx Mehmûdê Berzenci, Bedırxan paşa

RENGDÊRÊN ZÊDEDARİ

69. Rengdêrên zêdedari: Ev rengdêr bı qertafa "tır, tırtır, trin" û bı daçeka "tewri, hê" têne bıkaranin.

Lı dawiya rengdêranve danine qertafa "tır" zêdedari tê hmatê:

Mezın mezıntır, pçûk pçûktır, sor sortır, zer zertır

Lı ciyê qertafa "tır. tırtır" tê danin, zêdedari dıbe du qasi xwe

Mezıntırtır, pçûktırtır, drêjtırtır, qenctırtır

Lı ciyê "tır", "trin" dê danin, zêdedari dıgıhıje hedê dawi:

Mezıntırin, reştırin, zertırin, qenctırin, baştırin

Jıbo hedê dawiya zêdedari, daçeka "tewri" ji eda lı pêşi rengdêran tê danin. Nav ji gorê mêjer û zayendan qertafan dıgırin û lı pêşi daçekê eda ci dıgırin:

Kurê tewri mezın, keça tewri bedew, mêrên tewri qenc

Lı ciyê "tewri" danina daçeka "hê" peyvan zêdedar, zêdedar kıriyan ji zêdedartır dıke:

Kurê hê mezın, kurê hê mezıntır, keça hê bedew keça hê bedewtır, hespên hê beza, hespên hê bezatır

RENGDÊRÊN WEKHEVİ

70. Rengdêrên wekhevi: Ev rengdêr bı daçekên" qasi, hıngi" pêktên. Eda danina van daçekan lı pêşi navan, rengdêrên wekhevi têne hmatê:

Qasi mın, qasi te, hıngi me, hıngi we, qasi Reşo
Şêx qasi axan xwinmıjın, tu hıngi mamoste nızani
Refa karkeran qasi gelê bındest dıperçıqın

Rengdêrên wekhevi û rengdêrên zêdedar, bı cinavkên peywendi

ji têne bıkaranin. Cinavk gorê mêjer û zayenden cda lı pêşi navan ci dıgırın:

Ya mezıntır, ya mezıntırtır, ya mezıntirin
Yê hê mezın, yê hê mezıntır, yên tewri mezın
Yên qasi gelê bındest dıperçıqın, karkerın

- -

Em bı ser dıjmında wek pêt û brûskan bırıjın
Ger çı em dê bêne kuştın wi dgel xwe bıkujın
Rê û derbendan lı ber bıgırın wek hewr û mjın
Em kurên kurd ser blındın pêşve êriş ey bra
Zanıbe bawer bıke mlet jı dıjmın meztıre
Wer bıkın lê bıbne leşker dar û ber lat û devi
Çare nine serşıkesti rev bı dest wi nakevi
Mletê Kurd dê jı para mêr û jın tev pey kevi
Em kurên kurd ser blındın pêşve êriş ey bra
Zanıbe bawer bıke mlet jı dıjmın meztıre
Sûnd û peyman bı lı ser me em jı vê rê nagerın
Canfıdane em dı vê rê nayê bira me mrın
Ala rengin wek plıngan pêşve rakın hılgırın
Em kurên Kurd ser blındın pêşve êriş ey bra
Zanıbe bawer bıke mlet jı dıjmın meztıre

(Cigerxwin)

Institut Kurde de Paris

WANE XII

RENGDÊRÊN KİFŞKERİ

71. Rengdêrên kıfşkeri: Ev rengdêr bı çend ewayên têvel heyinan kıfş dıkın: Bı hejmar, bı işaret, bı pırsiyari heyinan kıfş dıkın û bı ewayek nekıfşi ji heyinan dıdın diyar kırın.

72. Rengdêrên hejmari: Ev rengdêr gava bı serê xwe bêne bıkaranin, navên hejmaranın û gava bı heyinanra bêne bıkaranin, dıbın rengdêr û heyinan kıfş dıkın. Rengdêrên hejmari dı nav xweda dıbın çar beş: Hejmarên hêmani, hejmarên rêzdari, hejmarên kesri û hejmarên beşdari.

73. Rengdêrên hejmariyên hêmani: Rengdêr eda lı pêşi heyinan têne danin û heyinanan bı hejmar jı wanên dın kıfş dıkın:

Du hesp, sê mehin, çar mom. çarde mom, yek camêr
Deh pêşmerge, sêzde karker, heft qutabi pênc mamoste

Hejmar

O- sıfır	5- pênc
1- Yek	6- şeş
2- du, dıdo	7- heft
3- Sê, sısê	8-heşt
4- Çar	9-neh

Institut kurde de Paris

10- deh	20- bist
11- yanzde, yanzdeh	30- sıh, si
12- danzde, danzdeh	40- çıl
13- sêzde, sêzdeh	50- pênci
14- çarde, çardeh	60- şêst
15- Panzde, panzdeh	70- heftê
16- şanzde, şanzdeh	80- heştê
17- hıvde, hıvdeh	90- nehwêd, not
18- hıjde, hıjdeh	100- sed, sıd
19- nozde, nozdeh	1000- hezar

Gava jı bistan jor bêt hejmartın geleke dı navbera du hejmaranda "û" ya grêk bête danin. Mina: 21 bistûyek, 22 bistûdu, 35, siyûpênc, 1978 hezarûnehsedûheftêûheşt.

Rengdêrên hejmariyên hêmani dı qedinekanda ci dıgırın. Hım dıbın qedandi hım ji dıbın qedandek û têne tewandın ji. Mina: pêncê mehê, meha pêncan, dı pêncanda, jı pêncanra, pêncan bine...

Gava dı hevokên navdêrida hejmar bı qertaf lêkerê bêne bıkaranin, cda lı dû navan têne danin:

Dı gundê meda mamoste dıdone
Demıjmêr çende? çar kêm dehe
Hesp çendın? hesp heftın

Institut kurde de Paris

RENGDÊRÊN HEJMARİYÊN RÊZDARİ

74. Rengdêrên hejmariyên rêzdari: hejmarên rêzdari cda lı dû navan têne danin û navan bı hejmariyên rêzdari kıfş dıkın. Ev rengdêr bı çar celeban pêktên lê têgıha wan yeke:

Bı qertafa "em", bı qertafa "emin", bı qertafa "an" û bı qertafa "i":

Yekem, duwem, sêyem, çarem, pêncem, dehem, bistem
Çeremin, pêncemin, şeşemin, heftemin, heştemin
Demıjmêra yekem, dana duwem, bedila sêyem, şeva nehi
Roja pêncemin, heftêya şeşemin, meha heftemin
Pêşmergê çaran, karkerên bistûşeşan, mirê heştan
Suxtê dehi, şagırtê siyûsısêyi, xaniyê heşti

Rengdêrên hejmariyên rêzdari bı serê xwe kêm ji bıt têne bıkaranin lê yên bı qertafa "an, i" pêkbên hêç nayêne bıkaranin. pzo ev rengdêr pışti navan, gava nav tunebın, gorê mêjer zayendan cinavkek peywendi geleke bêne danin:

Hespê yekan, ê yekan, yê yekan, keça dudan, a dudan
Tvınga çaran, a çaran, ya çaran, kurê sısêyan
Mehinên pêncan yên pêcan, ên pêncan, ên bistan
Xaniyê şeşan, yê şeşan, ê şeşan, pencera dehan
Pencera hefti, a hefti, ya hefti, gundê panzdehi
Ramaxa sêzdehi, a sêzdehi, ya sêzdehi

75. Rengdêrên hejmariyên kesri: Ev rengdêr heyinan bı hejmariyên kesri kıfş dıkın. Yani jı tamê parçek dıdın diyar kırın. Lı pêşi tamê cda daçeka "jı" û bı dawiya tamêve ji qertafa "an" yan ji "i" têne danin. Bı vê ewayê tam xwe ali parçêve dıtewine. Herdem tama tewandi lı pêşi, parçe ji rût lı dû tamê cda têne danin:

jı sedan bist, jı sedi bist 20 / 100
jı heftan çar, jı hefti çar 4 / 7
jı bistan şeş, jı bisti şeş 6 / 20

Hınde herêm tamê bê daçek, bıkartinın
Sedi pênc, sed yek, deh yek, pênc yek

Heke kesır bı navanra bête bıkaranin, qertafa "an, i" navanve têne danin:

Jı sed mrovan sê mrov, jı pênc hespan du hesp
jı bist berani çar beran, jı çar masê masek

Heke heyin yekani ya mê bıt û yekaniti bêt bıkaranin qertafa "ê" dıkare bıgırıt:

Jı heşt jnê du jın, jı bist mehinê neh mehin

Heke parçe yek lıb be, tam rût ji bête danin dıbe, çawan ku lı jorin ji hatıbû dabaş kırın:

çar yek, deh yek, sed yek
Jı sed axan axak ji qenc dernakeve (gotınê mezınan)

RENGDÊRÊN HEJMARİYÊN BEŞDARİ

76. Rengdêrên hejmariyên beşdari: Rengdêra han bı hejmaran

yan ji bı beş krınê heyinan kıfş dıkın. Ev rengdêr bı dubare krına hejmarekê pêktê:

Yek yek, dıdo dıdo, sısê sısê, çar çar,
Pırtûkan dıdo dıdo belav bıke
Tvıngan yek yek, berıkan sed sed bıde hevalan

Jıbo têgıhana qenc, daçaka "û" yan ji "bı" lı navber herduwan têne danin:

Çar û çar, pênc û pênc, dıdo û dıdo, neh û neh
Yek bı yek, sısê bı sısê, deh bı deh, şeş bı şeş
Sêvan panzdeh û panzdeh bıdın qutabiyan
Koledarên xwinmıj bist bı bist qewırının

Carna bı hejmara pêşive "e" yek tê danin û wlo dıbe:

Çare çar, hefte heft, dehe deh, sede sed
Pêşmerge dehe deh çûne şerê serxwebûnê

Lê bı mın be ev "e" dê neyê xebıtandın, lewra jı "e" ya ebadê heyberan nayê nasin. Mina ku dıbêjın ev xani dehe deh, ev pırtûk bistûyeke şanzdeh.

77. Lı hev xıstın: Gava du hejmar lı hev bêne xıstın lı nav ber her du hejmaran hokera "car" cda tê danin:

çar car çar, heft car pênc, şeş car heşt

"r" ya car dıkare bıkeve "ca" teni bımine: Sê ca şeş bête xebıtandın

Balakêş: Ev mjar geleke ne jı rengdêrên hejmariyên beşdaribın lê jıber ku hındekan jê pejırandıne, me ji lı vır nvisand.

- -

Bı ser çiyan ketım ez, karê mın bez û rev
Ci nine têda rûnım, ne bı roj û ne bı şev
Chê bav û kalê mın, bı xwina mın bûye sor
Dıjmın iro têdaye, dıbêje mın tu derkev
Bûye si sal dınalım, brindar û perişan
Hê jı nûve brinê qemişk, gırt û gha hev
Beri bıbım brindar, xwedi dost û mrovbûm
Lê iro mame tenha, bê zman û bêdev
Zvıstane nıkarım, bı dıjmınra bıkım şer
Pûk û berfê dagırtın, geli derbend û bandev

Vaye bahar bı xêr tê, xwe kar bıkın jıbo şer
Êriş bıkın neyaran, weki mêr hemi tev

(Cigerxwin)

Institut kurde de Paris

WANE XIII

RENGDÊRÊN İŞARKİ

78. Rengdêrên işarki: Ev rengdêr lı pêşi navan eda têne danin û bı işaret heyinan jı hev kıfş dıkın.

Dı daneka cinavkên işarkida hatıbû dabaş kırın ku cinavkên işarki û rengdêrên işarki yekın (lı daneka 57 an bınêrın). Gava ciyê navan bıgırın cinavk û gava heyinan kıfş bıkın rengdêrın. Vaye lı vır rengdêrın. lewra heyberan kıfş dıkın.

Jıbo yekaniyê nêr "vi, wi" û jıbo yekaniya mê "vê, wê" têne bıkaranin.

Rengdêrên işarki evın:

	Desta ev	**Desta vi**
Jıbo heyinên nizık:	ev	vi, vê, van
Jıbo heyinên dûr :	ew	wi, wê, wan

Bıkaranina van rengdêran:

Ev axa stemkare, ew karker emekdare
Vê qelemê name nvisand, vi çovi serê zorker şkand
Wê mamostê ders da, wi şvani pez çêrand
Van mjokeran gel û karker şewıtandın
Wan emekdaran gelê bındest parastın

Institut kurde de Paris

Praniya desta "ev bı lêkerane:

Yekani	Prani
ev mrov qence	ev mrov qencın
Ew suxte çû dbıstanê	ew suxte çûn dbıstanê
Ew hat	ew hatın

Gava rengdêrek jı desta "vi" bı navê nêrên xwesera ji bêne bıkaranin, nav "i" ya qertafa nêrêni dıgıre. Mina:

Vi Şoreşi, wi Mirzayi, vi Azadi, wi Reşoyi
Vi Şoreşi pırtûk da mın, wi Mirzayi gel şiyar kır

Jıbo xwerû û zelal krına rengdêrên işarki, lı pışti navan cda daçeka "ha, han" têne danin:

Ev mrovê ha, ev mrovê han, ev mrovên han
Vê keçıka ha, vê jna han, van stemkarên ha
Wê xatiya han, wi xali han, wan axayên han
Çı hate serê gelê Kurd jı van şêxê han hat

Dı hevokekda gava navek bı desta "ev" işaret kri bıbe kırde, serve jı yê desta "vi" işaret kri dıbe û gava navek bı desta "vi" işaret kri bıbe kırde, serve jı yê desta "ev" işaret kri dıbe:

Ev karker vi kari dıke, vi camêri ev mjoker quta
Ew xweşmêr vi xwinmıji dajo, wi xwinmıji ev gel mêt.

RENGDÊRÊN PIRSİYARİ

79. Rengdêrên pırsiyari: Ev rengdêr navan bı pırsiyarı kıfş dıkın. Rengdêrên pırsiyari evın:

Bê zayend: çend, çı
Mê: kêj, kêjan, kêjkan
Nêr: kij, kijan, kijkan

Dı mjara cinavkên pırsiyarida hatıbû dabaş krın ku hınde cinavkên pırsiyari, dı eyni gavêda rengdêrên pırsiyarine ji (lı 57 an bınêrın). Guhertına wan ewe ku, cinavk ciyê navan dıgırın, Rengdêr ji navan kıfş dıkın. Vaye ev rengdêr bı pırsiyari navan kıfş dıkın.

Rengdêrên pırsiyari, bê daçek û qertaf hema wsan rût cda lı pşi navan têne danin. Wekok:

Institut kurde de Paris

Çend karker hatın? çı xebat krın?
Dı karxanêda çend şagırt dıxebıtın?
Kij mrovê nan xwar? kêj keçık hat, kêjan keçe?
Kêjan pırtûkê jıbo te binım?
Tu dabaşa çı şeri dıki? te çı kes dit?
Kêjkan keç rınde? kijkan gerdo pır xwinmıje?

Gava jı rengdêrên pırsiyari "kij" bı navên nêrên xwesera ji bên "i" ya nêrini yê tewangê dıgırın

Kija Azadi pırtûk da te? kijan Reşoyi tu şandi
Kijan Mirzayi dıjmınê vegırtox raqewırand

RENGDÊRÊN NEKIFŞİ

80. Rengdêrên nekıfşi: Ev rengdêr ewayek ne kıfşi, heyin û kesen dıdın terif krın.

Hınde jı rengdêrên nekıfşi yên pır têne bıkaranin evın:

Pır, tu, her, flan, zehf, gelek tev, hemi, hewqas
Hêç, qet, hne, hınde, gi, gişk, çendek, bêhvan, çend

Rengdêrên nekıfşi eda lı pêşi navan têne danin û heryek ewayê xwe heyinan dıdın terif krın.

Bıkaranina rengdêrên nekıfşi:

Pır mrov hatın, tu kes ne hat, tu merıf nayê
Her jın nıkare xwarınê bıpêje, zaf keç nacewıtın
Flan keçê name nvisand, bêhvan kuri ne nvisand
Zehf pêşmerge çûn gelek xwinmıj telıfandın
Tev leşkerê gel hat, hemi mrov çûne mala xwe
Hevqas karker hene, hêç şêx û axayên qenc tune
Qet kes raneket, hne mrov xwe nanasın
Hınde cotyar hêj şiyar nebûne, gi karker başın
Gişk cotyar dê şiyar bıbın, qet kes ari ne kır
Çendek qutabi lı danoşka dirokê gelek qenc dıxwinın

PÊKHATINA RENGDÊRAN

81. Pêkhatına rengdêran: Bıhtıryariya hınde rengdêran, bı tipa

serê rengdêranve zelıqandına tevineka "ıp" û zelıqandana wan lı pêşiya rengdêranve bıhtıryari pêktê. Wekok:

Sıpsor, sıpsıpi, zıpzer, kıpkesk, hıphışin
Rıpreş, qıpqemer, qıpqiç, dıpdırêj, tıpteng
Şıpşıl, gıpgerm, sıpsar, cıpcemıdi, tıptari
Rıpronahi, şıpşirin, tıptelh, tıptij, kıpkın

Bıqertafa "ık, ok, kok" pçûk kırına rengdêran:

Sorık, zerık, reşık, keskok, hşinok, reşkok
Drêjok, knık, zerkok, pçûkok, xweşık, gewrık
Şêrinok, tehlık, gıvrok, belekok, qemerok

jıbo rengdêrên dengdêr qedayi "lok" tê bıkaranin:

Spilok, narıncilok, ronahilok

Bı qertafa "ve" reng hındık kırına rengdêran

Sorve, zerve, keskve, hşinve, reşve, qemerve

Pçûk kırına rengdêran bı têgıhana kêf jêra hatınêye ji.

RENGDÊRÊN HEVEDUDANİ

82. Rengdêrên hevedudani: Bı heve danina du navan, nav û rengdêrek, nav û lêkerek, daçek û navek, nav û qertafek, hejmar û qertafekve pêktên. Wekok:

Dranpola, desthesın, lıngdar, serzêr, pozbıran
Sermezın, devnerım, pışthışk, malmezın, çavpehn
Dılmıri, dılşkesti, çavtırsay, lêvdeqandi, guhbıri
Bêkes, bêkar, bêmal, bêmeji, bêwar, bêkêr, bêwec
Bıdar, bıçek, bıdıl, bıkêr, bıken, bıweş, bıderd
Dewlemend, hnermend, serbest, kemerbest
Nekar, nexweş, nemêr, neqenc, nebaş netu
Çargurçık, şeştıli, çarçav, duseri, yekdıl

Bıkaranina rengdêrên hevedudani:

Reşoyê Sermezın, koledarê çavpehn, mêrıkê dest vala
Soroyê bêkes, Axayê bêmeji, Azadê bıçek
Mirên neqenc, şêxê netu, burjuwayê dewlemend
Karkerên hnermend, gelê serbest, gırtiyê pêbend
Pêşmergê dranpola, karkerê desthesın, keça serzêr

Institut kurde de Paris

xortê pozberan, mjokerê lıngdar raqewırand
Salarê dılmırı, Şêrina dılşkesti, Mirzayê guhbırı
İboyê lêvdeqandi şerê axayê çavtırsayi dıkın
Azadê Serbılınd, Zerifa Çargurçık, Znarê şeştıli

Sıngê sêçıq naçe erdê (gotına mezınan)

PARÇEK XWEDINÊ

Dabaşa gelê bındest û xwinmıjan.

83. Bındesti û serdesti: Lı navber kesên nivekarê jinê, dı vê Cêhanêda dabaşek pır mezıne. Mjokerên Dnê tevê hınde zorkerên welatan, dıvên bındesti her hebe û bındest ji tım hebın; da parçek xwina wan bımıjın, wan bıfıroşın, malê wan bıxwın û bıhıncırının. Van rengmırovan qe navên ku gelên bındest şiyar, xwedinav, xwedişan, xwedi mafe û xwedizıman û dirok bın.

Lê belê pêşberê van zordestan kesên mrovin, azadihebin, aştixwaz û komali ji henın ku wekhevi û jina mrovani dıxwazın. Dı navber van herdu bendanda tımotım têkoşerek mezın heye.

Zordestên her welati hergav jı mjokerên Dnê ferman dıgırın; taktik, lêp, gelş û fêlbaziyan jı wan hin dıbın û lı ser rêça wan dıçıne van gelên reben. Ev xwinxwarên çepelên mrar û kapûsa gelên belengaz, mest û jar navên ku bındest, zana û şiyarbın, belê dıxwazın xwedineyar, perçıqi, bêkêr, bêkar, nezan û bêyarbın.

Refa serdest yê gelê Kurd, destık û hestikojê dıjmın, şêx, beg û axane. Wan revda gurên devbıxwin, dûvê dıjmın, stemkarê bê wıjdan, çendi û çend salın ku ev koma dılpaqıj û bê xwedi dotıne, xwin jı wan mêtıne, perçıqandi û bê mafe hıştıne. Bı hevra dıjmıni, dılnexwazi, dexesi û nezani berê çandına lêpê wane.

Kurd û Kurdıstan jı mêjdaye, bı arikariya refa serdest dı bın destê dıjmında maye. Ev refa serdest, pzo jıbo dıjmın maşe, ariker û dest û pêne. Çı sodretek mezıne ku xwin û goştê van nemerdan, text, rext, kêf û jina wan ji jı Kurdane. Belê dıjmıni û ziyana mezın disa jı destê wane. Ew şahın, perlementerın û paşane. Em ji dı welatê xweda bırçi, gede, bendewar û bê warın.

Brano! pısmamno! hevalno! ma ne bese? Dıvê em ji êdi şiyar, têgıhişti, jir û zanabın, da ku bışên dost û dıjmınê xwe bınasın. Geli xwişk û bran! maqey hûn nızanın ku gel û netewe bı zman, çand, dirok, pişe û bı berkêşanê lı pêyan dımine?

Lı ser me peymanbe jı vır paş jı hevra qenc, dılsoj, mıhrıvan, dlovan, bı zman û bı dirok xwe bıdın diyar kırın. Jıbo azadi û serbestiya gelê xwe, bı çek û karobar van dıjmınên qrêj raqewırinın. Eger em dı vê rêya handa bêne kuştın ji ne xeme. Lewra jı berida "rêya azadi bı xwina şehidan roni dıbe" dıbêjın.

Institut kurde de Paris

WANE XIV

LÊKER

Gringiya zmên:

84. Gringiya zmên: Bra ew siyaseta ku çi hundır çı ji derveyê welatda, gelek caran bı fortan tête krın, jê çu eqılê mın nabıre. Jı-ber hıngê ji dıbe ku ditına gelek mrovanda pçûk xwiya dıbe lê mın wek karek bıngehin beri her tışti hin bûyina Kurdi gırtıye ber çavên xwe.

(Dr. Seid Şvan)

Nvisandına jorin grıngiya zmên dınımine.

Vekırın:

Lêker: Dı nvisandına jorinda "têtc krın, gırtıye, dıbe" dıborın, ew peyv lêkerın. Yek ji "nabıre" heye, ev peyv ji dı drûva neyinida lêkere. Lewra ev peyv bzavê dıdın diyar krın.

Ew peyvê ku heta nha hatıne ditın (nav, cinavk, rengdêr) heke têra axaftınê bıkıra, lêker ne dıxwestın. Ew peyv teni heyinan dıdın diyar krın. Bı heyin diyar krınê hevok pêknayên. Hevok pêkneyê, hev serwext krın çênabe. Jıbo pêkhatına hevokan, krın û bûyin ji dıxweze. Vaye lêker, krın û bûyinê dıdın diyar krın.

Ew peyvên bûyin yan ji krınên heyinan bı tıklaya kesanve dınav

Institut kurde de Paris

deman da yan ji bı xwestınê bıdın diyar krın, jı wanra lêker têne gotın.

Lêker jı qurmê raderanın û gorê dem û kesan têne kêşan:

Ez	dıxwım	dema nho
Mın	xwar	dema bori
Ezê	bıxwım	dema bê
Ez	bıxwım	xwestın
Tu	bıxwe	ferman

Dı hevokanda peywıra lêkeran pêxıstıye.

CELEBÊN LÊKERAN

85. Gorê çêbûnên xwe lêker dıbın çar bır:

A- Lêkerên bınyati
B- Lêkerên çêkıri
C- Lêkerên qertaf
D-Lêkerên hevedudani

A- LÊKERÊN BINYATİ

86. Lêkerên bınyati: Ev lêker dı nav xweda dıbın du beş: a- Lêkerên xwerû. b- Lêkerên kêm.

87. a- Lêkerên xwerû: Ev lêker jı qurmê raderên bhisti çêdıbın û şxwe çêkırıne ji. Jıbo hêsani fehm krınê, emê qertafa rader ji bı wanve danin. Qertaf "ın, n" ye

Kolan, hzırin, ketın, dan-dayin, çnin, bjartın
Danin, ponıjin, xwarın, şûştın, dotın, pehtın

88. b- Lêkerên kêm: Ev lêker bê raderın.

Demên bori jı lêkerên kêm nayên kêşan. Pxwe lêkerên fermanine. Ewên jı qurmê lêkera fermani têne kêşan, ew teni jı lêkerên kêm têne kêşan. Qasi hatıne tesbit krın heft lıbın, ew ji evın:

wer	her	ê	bêj	vê	in	bin		
wer	her	bê	bıbêj	bıvê	bin	bıbin=	ferman	
were	here	bê	bıbêje	bıvê	bine	bıbine=	ferman	
hat	çû	hat	got	vi	ani	dit=	dema bori	

Ev herdu celebên lêkeran (xwerû, kêm) bê qaydene, hin bûn bı bhistınêye

Hınde herêm lêkera "in" tam dıpejırının, radera wê "inan, inandın" dıbe û jê gişk raweyan ji dıkêşın: ina, inand, inaye, inandıye, inandıbû..

B- LÊKERÊN ÇÊKIRİ

89. Lêkerên çêkıri: Lêkerên çêkıri dı hêmanê xweda ne lêkenn. Bı qaydan jı peyvên curê navan têne çêkınn û dıbın lêker. Hınde lêkerên kurdi yên çêkıri jı peyvên biyani ji hatıne çêkınn. Ew peyvên biyani yan navın yan ji lêkerın lê bı navki ketıne zmanê me.

Jıber ku ev beşa lêkeran têne çêkınn, bı destûra we emê hınde zêde lı ser rawestın.

Gelek celebên lêkerên çêkıri hene, Qasi heta nha me kariye bısenıfinın, dıkarın dı sê celebanda vekıtinın:

a- yekite û lı pê dengdêrê bêdengek

b- yekite û lı pê dengdêrê du bêdeng

c- pırkite

90. a- Yekite lı pê dengdêrê bêdengek: Dı hundırê vê celebêda tu guhertın çênabın û dı tentêla xwe yên rûda hım nav û hım ji lêkenn. teni "bı" ya daçeka fermani lı pêşi, jıbo nemayi û domandına fermani ji "e" yeki lı dawiya yekaniyanve têne danin. Mina:

Nas bınas bınase

kel bıkel bıkele

Lı dawiya van peyvanve danina dengdêrek hım qurmê lêkerê û hım ji kêşana yekaniya sıseyan ya boriya têdayi tê hmatê? Ew dengdêr ji ya hınde peyvan "a" ye. Mina: Teq teqa, deq deqa, dax daxa û ya hındekan ji "i" ye. Mina: Bez bezi, rev revi, bır bri... Hinbûna van tipan (yani kêjan peyv kêjan dengdêrê dıgre) bı bhistınêye. Hınde peyv ji hene ku hınde herêm bı "a" yê, hınde herêm ji bı "i" yê bıkartinın. Mina:

Kel kela keli, rık rıka rki, hûr hûra hûri

91. b- Yekite û lı pê dengdêrê du bêdeng: Ev celebên peyvan bı

Institut kurde de Paris

hnek guhertınan lêker pêktên. Guhertın ji ewe ku lı navber herdu bêdengan dengdêra "ı" tê danin. Vi ewayi lêkera fermani tê hmatê:

Bırq brıq bıbırıq, xeml xemıl bıxemıl

Pışti pêkhatına lêkera fermani, lı dawiya peyvanve danina qertafa "i" qurmê lêkerê tê hmatê: Brıqi, xemıli, tewızi, kevıli...

Awerteyi "ı" ya lı pêşi ılım dıbe "e" ılm elım, elımi, dıelıme...

92. c- Pırkite: ev celebên peyvan, hnek jê dıguhenn û hnek ji wek xwe dımının. Heke dengdêra kita dawi "ı" be, bê guhertın hım nav û hım ji lêkera fermaniye: Rcıf, fetıl, feşıl û heke dengdêra kita dawi ne "ı" be, çı dıbe bla bıbe, dıbe "ı" hınga nav dıbe lêkera fermani. Weki: Cemed cemıd, bzav bzıv, lepat lepıt...

Balakêş: Peyvên ku bı du bêdengan destpê dıkın û gava kitek bıkeve pêşi wan, eger navber herdu bêdengan dengdêra "ı" bıgırın jı pır kitan têne hejmartın. Weki: Rcıf dırıcıfe bırıcıf, bzav bzıv dıbızıve bıbızıv

Pışkdariya yekita lı pê dengdêrê du bêdeng û pırkitan:

93. Dı van herdu celebanda ji danina "bı" ya daçeka fermani kêfiye lê danin çêtıre. Jıbo domandın û nermaya fermanê lı dawiya yekaniyanve danina "e" yê peywıstiye. Weki

Fetıl bıfetıl, fetıle bıfetıle, bzıv bzıve, bıbızıv bıbızıve, xemıl bıxemıl, xemıle bıxemıle...

Jıbo pêkhatına qurmê lêkerê û lêkera bori, qurmê fermana herdu celebanve ji "i" yek tê zelıqandın. Mina: Fetıli, xemıli, bzıvi, betıli...

Pışkdariya gelemperi:

94. Bı çı ewayê dıbe bla bıbe û kijan celeb ji dıbın bla bıbın gava jı lêkerên çêkıri qurmê lêkera fermani pêkhat, weki lêkerên edeti rê dıdın gişk kêşan, rawe û raderan, heke nedervazi bın rê dıdın dervazi krınê ji (lı 107, 110 an bınêrın). Lı van tabloyan ji bınêrın:

TABLO 1.

Balakêş: Dı lêkerên fermanida lı tabloyê, emê "bı" û "e" ya fermani bınıvisın.

Nav	Ferman	F. dervazi kri	D. bori	B.D kri
Deq	bıdeqe	bıdeqine	deqa	deqand
Nas	bınase		nasi	
Kel	bıkele	bıkeline	kela, keli	keland
Êş	bêşe	bêşine	êşa	êşand
Dız	bıdıze		dzi	
Şop	bışope	bışopine	şopa, şopi	şopand
Ken	bıkene	bıkenine	keni	kenand

Dema nho	N.dervazi kri	Rader	R. dervazi kri
Dıdeqe	dıdeqine	deqan	deqandın
Dınase		nasin	
Dıkele	dıkeline	kelan, kelin	kelandın
Dêşe, têşe	têşine	êşan	êşandın
Dıdıze		dzin	
Dıkene	dıkenine	kenin	kenandın
Dışope	dışopine	şopan, şopin	şopandın

TABLO 2.

Nav	Ferman	Fermana dervazi kri	Dema bori	Boriya dervazi kri
Xeml	bıxemıle	bexemıline	xemıli	xemıland
Bırq	bıbırıqe	bıbırıqine	brıqi	brıqand
Peyv	bıpeyıve	bıpeyıvine	peyıvi	peyıvand
Tewz	bıtewıze	bıtewızine	tewızi	tewızand
Derz	bıderıze	bıderızine	derızi	derızand
İlm	bıelıme	bıelımine	elımi	elımand

Dema nho	Nhoya dervazi kri	Rader	Radera dervazi kri
Dıxemıle	dıxemıline	xemılin	xemılandın
Dıbırıqe	dıberıqine	brıqin	brıqandın
Dıpeyıve	dıpeyıvine	peyıvin	peyıvandın
Dıtewıze	dıtewızine	tewızin	tewızandın
Dıderıze	dıderızine	derızin	derızandın
Dıelıme	dıelımine	elımin	elımandın

Institut kurde de Paris

TABLO 3.

Nav	Ferman	Fermana dervazi kri	Dema bori	Boriya dervazi kri
Rcıf	bırıcıfe	bırıcıfine	rcıfi	rcıfand
Fetıl	bıfetıle	bıfetıline	fetıli	fetıland
Bzav	bıbızıve	bıbızıvine	bzıvi	bızıvand
Cemed	bıcemıde	bıcemıdine	cemıdi	cemıdand
Lepat	bılepıte	bılepıtine	lepıti	lepıtand
Kevel	bıkevıle	bıkevıline	kevıli	kevıland

Dema nho	Nhoya dervazi kri	Rader	Radera dervazi kri
Dırıcıfe	dırıcıfine	rcıfin	rcıfandın
Dıfetıle	dıfetıline	fetılin	fetılandın
Dıbızıve	dıbızıvine	bzıvin	bzıvandın
Dıcemıde	dıcemıdine	cemıdin	cemıdandın
Dılepıte	dılepıtine	lepıtin	lepıtandın
Dıkevıle	dıkevıline	kevılin	kevılandın

Hınde nav ji hene ku bêdengek bı wanve gırtıye û bûne lêker. Ew ji dı tentêla xwe yên rûtda hım navın û hım ji lêkera fermanine. Paşi bêdeng wanve gırtıne û bûne qurmê lêkerê û rê dıdın gişk kêşanan ji. Weki

Gez gezt, geztıye, geztıbû, dıgeze, dê bıgeze

Leyiz leyizt, leyiztıye, dıleyize, dê bıleyize

Ev cura lêkeran herçıqas jı lêkerên xwerû dıxwıyên ji lê bê guman lêkerên çêkırine.

Balakêş: Zmanê meda hındık nav hebûne ku dı demên kevında lêker ne bûne. Ew lêker berebere helane û bûne nav. Vaye ew navın ku bûne lêkerên çêkıri û dıbın ji. Lewra tê gotın; Dı zmanê meda hındık nav hene ku bı qaydên lêkerên çêkıri nebın lêker.

C- LÊKERÊN QERTAF

Qertaflêker

95. Qertaflêker: Ev lêker her weki qertafekê edati lı dawiya navdêranve dıgırın, dıbın lêker û cinavkan ji dınıminın. Gava lı dawiya lêkeranve bıgırın teni cinavkın. Nexu jı vanra qertaflêker û

qertafcinavk bête gotın çêtıre. Dıvê neyê jı bir krın ku qertaflêker qertafın û qertaf ji bı tu ewayi jı peyvan (navdêr û lêkeran) cda nayên danin. Şxwe navên wan ji lı sere: Qertaflêker. Belê lêker pxwe jı navên cda têne danin.

Curên qertıflêkeran

Yekani

Kes 1. ım, m, yım, me, bûm, bûme

Kes 2. i, y, bûy, bûyi

Kes 3. e, ye, bıt, bûye

Prani

Kes 1.n, ın, yın, in, yin, bûn, bûne, ne, nın

Kes 2. n, ın, yın, ne, nın, bûn, bûne

Kes 3. n, ın, yın, ne, nın, bûn, bûne

Ew "y" ya teni hati danin ne tipa kelıjandınêye. Ew qertafcinavka yekaniya duweme û jı lêkerên dengdêr qedayira, mina çûy, bûy, beziy têne bıkaranin. "y" yên dın tipên kelıjandınêne û "in, yin" dı devoka Buhtidane.

Qertaflêker dı hevokên navdêri (lêkera bûn) da ciyê lêkeran dıgırın, dıbın pêxısti û cinavkan ji nişan dıdın. (lı 62 an bınêrın) Dı hevokên lêkerida ciyê cinavkan teni dıgırın

Ev qertafên han lı hemi dem û raweyên lêkera bûn, lı hemi dem û raweyên lêkerên ne dervazi jı bıl yekaniya boriya sısêyan û dema nho û bêya lêkerên dervazive têne danin. Weki:

Navdêra dengdêr qedayi: pêşmergeyım, peşmergeyi

Navdêra bêdeng qedayi: şoreşım, şoreşgiri, Kurde

Lêkera dengdêr qedayi: Jim, qerımiy, razayin

Lêkera bêdeng qedayi: hatım, keti, dıkırın

Danina cinavka praniya dudan peywıstiye. Lewra qertafcinavka dudan û sısêyan (ın, ın) yekın û bê cinavk jı hev nayên nasin. Weki: Hûn hatın, hatın. Jı bıl devoka Boti danina cinavka praniya yekan ji peywıstiye. Dı lêkerên borida qertafcinavka yekaniya sısêyan tune. Şxwe qurmê lêkeran raweya yekaniya sısêyane.

Heke lêker bı dengdêra "i" bıqede, dı devoka Buhtida ji, dıvê cinavka praniya yekan ji bête danin. Weki: Em bezin, em revin, em kenin

WANE XV

D- LÊKERÊN HEVEDUDANİ

96. lêkerên hevedudani: Ev lêker dı nav xweda dıbın heşt beş:

a- Daçcki, paşdaçek	:	Rakırın
b- Ariker (navdêri) paşnav	:	Ava kırın
c- Karini, paşlêker	:	Karin kırın
ç- Qat dervazi, paşlêker	:	Dan kırın
d- Tebati kri, paşlêker	:	Hatın kırın
e- Raweyi, paşlêker	:	Kırıbûn
ê- Zvırı, paşcinavk	:	Lı xwe kırın
f- Hevayi, pêş û paşcinavk	:	Ketın hev, hev ketın

Bı vê ewayê û tê bête vekıtandın ji, lêker lı paşi daçek, nav, lêker, hınde cinavkan û lı pêşi û paşi hınde cinavkan têne danin û lêkerên curbecur pêktên

97. a- Lêkerên hevedudaniyên daçeki: Ev lêker bı daçekan pêktên û lêker bı daçekanve têne danin. Neyini ji dıkev navber daçek û lêkeran gişk pêve dıgırın. Weki:

Rabûn, hlanin, vekırın, wergırtın, derketın, dadan

Ranebûn, hılnedan, venekırın, wernegırtın, derneketın

Hınde nav hene cama weki daçekan, dı lêkerên hevedudaniyên daçekida têne bıkaranin. (Lı mjara 219 an bınêrın) Weki:

Hin hinkırın, ber berketın, ser serketın, der derdan

98. b- lêkerên hevedudaniyên ariker (navdêri): Ev lêker jı navek û jı lêkera "kır, da bû tê hmatê. Lêker cda lı dû navan têne danin. Nav mina xwe dıminın. Lêker gorê dem û kesan têne kêşan. Weki:

Dar kır, dar dıke, dar dıkım, hin bû, hin dıbe, dê hin bıbe
av da, av dıde, av dıdi

99. c- Lêkerên hevedudaniyên karini: Ev lêker bı lêkara karin, kanin û şêyinê pêktên. Dıvê bête zanin ku karin, kanin û şêyin devokên herêmanın. Yani jıbo karinê çı bête danin, jıbo kanin û şêyinêye ji

Karin, gorê dem û kesan tê kêşan û dıkeve pêşi lêkerekê gorê dem û kesan kêşandi. Vê awayê lêkerên curbecur têne hmatê. Herdu lêker jı hev cda têne danin. Weki:

Karin kırın, kari kır. Dıkare bıke, dê bıkare bıke
Karin ne kırın, kari ne kır, dıkare neke, dê bıkare neke
Ne karin kırın, ne kari bıke, nıkare bıke
Bıkare meke, mekare bıke, mekare meke

Balakêş: Ditın zanin, xwestın, wêrin û vên ji mina lêkera "karinê" cda têne pêşi lêkeran, heryek têgıha xwe dıgırın. Xwe zayi ev ji mina lêkera karinê têne kêşan û dıkevıne pêşi lêkerên kêşandi. Mina:

Zani bri, dızane bıbıre, dê bızane bıbıre
Xwest şand, dıxwaze bışine, dê bıxwaze bışine
Wêri çû, dıwêre bıçe, dê bıwêre bıçe
Vi çêkır, dıvê çêke dê bıvê çêke
Ne zani bri, nızane bıbıre, dê nezane bıbıre

100. ç- Lêkerên hevedudaniyên dervazi, qat dervazi, dubare dervazi: Ev lêker ewın ku, kırde pxwe nake, bı yekê dın dıde kırın. Kırde pxwe dıke, yani dervazi, mın kır, te bri, wê frot, wi şand. Kırde bı yekê dın dıde kırın, yani qat dervazi, dubare dervazi: Mın da kırın, te da frotın, wê da şandın. Ev pêkhatın bı arikariya lêkera "dan, da" dıbe. Lêkera "dan" gorê dem û kesan tê kêşan, lı pêşi raderên dervazi yan ji dervazi kri cda tê danin û lêkerên hevedudaniyên dervazi têne hmatê. weki:

Dane xwarın, Mın da xwarın, ez dıdım xwarın

Institut Kurde de Paris

Dane kenandın, mın da kenandın, ez dıdım kenandın
Ne dane kuştın, mın ne da kuştın, ez nadım kuştın
Dê bıde xwarın, dê bıde kenandın, dê nede kuştın
Dê nede xwarın, dê nede kenandın, dê nede şandın
Bıde xwarın, bıde kenandın, bıde şandın
Mede kuştın, mede xwarın, mede şandın

Lepat (aktif) iya lêkeran: Cur û drûvên lêkeran çı dıbın bla bıbın gişk lepatinin, jıber vê yekê le ser rawestan naxwaze. Tebatiya lêkeran bı vê ewayê jêrin pêktê.

101. d- Lêkerên hevdudaniyên tebati (pasif): Ev lêker bı arikariya lêkera "hatın, hat" pêktê. Lêkera "hat" gorê dem û kesan tê kêşan, lı pêşi raderên dervazi yan ji dervazi kri, eda tê danin. Bı vê tentêlê lêkerên hevedudaniyên tebati têne hmatê. Mina:

Hatın kuştın, hate kuştın, hatıye kuştın, tê kuştın
Hatın brin, hata brin, hatıye brin, tê brin
Hatın revandın, hate revandın, tê revandın
Ne hatın dotın, ne hate dotın, nayê dotın

Dema bê	Blani
Dê bête kuştın	bla bête kuştın
dê bête krın	bla bête krın
dê bête revandın	bla bête revandın
dê bête bezandın	bla bête bezandın
Dê neyê dotın	bla neyê dotın

Gava bı hevokan bête bıkaranin, bı vi ewayi jêrin dıbe

Lepati	tebati
Reşo xebıti	Reşo hate xebıtandın
Bêrivan revi	Bêrivan hate revandın
Zerifê xemıland	Zerifê hate xemılandın
Koledar kuştın	Koledar hate kuştın

Jıbo hinbûna refa perçıqi û gelê bındest Azad hate şandın

Ez tême kuştın lê nayême tewandın

(Gotına mezınan)

Dı lêkerên tebatida kırde ne kıfşene. Lewra jı wanra "kırde naynas" ji tê gotın. Eger bıvênevê kıfşkırına kırdan bıxwaze "jı ali, bı

desti" têne danin lê disa ji nabın kırde. Mina:

Lepati:	**Tebati**
Pêşmergan koledar kuşt	Jı ali pêşmerganve koledar hate kuştın
Şoreşvanan gel rızgar kır	Bı desti şoreşvanan gel hate rızgar krın

102. e- Lêkerên hevedudaniyên raweyi: Ev lêker, bı dawiya lêkeranve danina lêkera "bû, be" pêktên. Lêkera "bû, be" lı dawiya lêkerên kêşandive tê danin, çirokiyên pêşkeri, çirokiyên daxwazi û hınde raweyên daxwazi çêdıbın. Weki:

Hatıbû, hatıbûye, dıvê hatıbûya, bla hatıbûya
Hatıbe, ku hatıbe, dıvê, hatıbe, bla hatıbe
Dızanibû, dızanibûye eger dızanibû

103. ê- Lêkerên hevedudaniyên zvırandi: Ev lêker, eda danina lêkerek kêşandi lı dawiya cinavka "xwe" pêktê. Jıber ku bzav dızıvıre lı ser kırde, yani kırde pxwe dıkeve tesira lêker, lema jı wanra lekerên hevdudaniyên zvırandi tê gotın. Carna, yani dı hınde kêşananda daçeka "lı" lı pêşi cinavka "xwe eda tê danin. Mina lı xwe

Lı xwe krın, lı xwe kır, lı xwe kriye, lı xwe dıke
Xwe hejandın, xwe hejand, xwe hejandıye, xwe dıhejine
Xwe ne hejandın, xwe ne hejand, xwe nahejine
Dê lı xwe bıke, dê xwe bıxemıline, dê xwe bışû
Dê xwe nehejine, dê xwe nexemıline, dê xwe neşû
Bla xwe bıhejine, bla xwe nehejine, bla xwe neşû
Xwe bıxemıline, xwe bıhejine, xwe mehejine

Çawan lı jorin ji dıxwıyê ku daçeka fermani, daçeka dema nha û daçekên neyêni dıkevıne beri lêkeran.

104. f- Lêkerên hevedudaniyên hevayi: Hev, cinavka du kesane. Yani yek digeri, yek êdın, hevra bûnê ifade dıke. Lewra jı wanra lêkerên hevedudaniyên hevayi tê gotın.

Dı hınde celebên kêşananda lêkera kêşandi eda lı paşi cinavka "hev" û dı hındekanda ji lı pêşi disa eda tê danin û carna daçeka "bı" lê tê zêde krın. Mina:

Bı hevra çûn, lı hev hatın, destê hev gırtın

Kêf xweşi dane hev, lı hev ketın, ketın hev

"Bı" dıkare dengdêra xwe bêxe û bıbe "p", "h" ya hev ji bıkeve "p" xwe lı ciyê wê dayne. Mina:

Pevra çûn, pevra hatın, pevra leyistın, pevra xwarın

Destê xwe dane hev bı hevra rabûn
Mızgin lı dewlet rêncber şiyar bûn

(Cigerxwin)

Institut kurde de Paris

WANE XVI

LÊKERÊN DERVAZİ Û NEDERVAZİ

105. Lêker gorê xebatên xwe dıbın du bır: A- Dervazi B- Nedervazi.

106. A- Lêkerên dervazi: Lêkerên dervazi ewın ku bzav dervê kırdêye. Yani bzav jı kırdê dervazê servê dıbe. Ev krınê lı ser servê ifade dıkın. Lewra kırde tesirek lı serve dıke. Wekok:

Kırde	Serve	pêxısti
Reşo	çek	çêkır
Zerifê	çêlek	dot

Mina dıxwıyê Reşo lı çekê û Zerifê ji lı çêlekê tesirek krıne. Çêlek û çek ketıne bın tesira bzava Zerifê û Çeko.

Lêkerên dervazi yan dı hêmana xweda dervazine yan ji bı qaydan jı lêkerên nedervazi têne çêkırın. Lêkerên dervazi:

Xwar, peht, kuşt kri, frot, şand, bjart, çand, çni
Vexwar, vekuşt, bri, şûşt, dot, mêt, rêt, xwend

107. Lêkerên dervazi kri: Ev lêker jı lêkerên nedervazi pêktên. Beşek hındık jı lêkerên nedervazi hene ku dervaziyên wan edanın. Jıber vê yekê ew nayêne dervazi krın. Qasi ku me senıfandıye hejmara wan lêkerên ku dervaziyên wan henın (jı bıl lêkerên daçeki) şeş lıbın. Xwezayi çend lıbek ji yên daçeki hene. Jıbo wekoki du

Institut kurde de Paris

lıb lêkerên daçeki (rabû, vebû) me lı vır nvisandın, yên dın ji gişk mina wanın:

Nedervazi	Dervaziya wan	Nedervazi	Dervaziya wan
Çûn	şandın	ketın	xıstın, êxıst
Bûn	krın	mrın	kuştın
şkestın	şkinandın	hatın	anin
Rabûn	rakırın	vebûn	vekırın

Balakêş: Her çıqas lêkera dervazi "kuştın" heye ji carna mrın tê dervazi krın. Mina

Mrandın, mrand, mrandiye, dımırine, dê bımırine

Her çıqas lêkera "mrın" vi ewayi têtc dervazi krın ji disa qaydên me nahenfine. Iewra dervaziya wê (kuştın) heye.

Beşa dın (graniya lêkeran ji evın) jı lêkerên nedervazi, vi ewayi tê dervazi krın:

Heke lêker bı dengdêrê bıqede, jı bıl lêkera "grin" dengdêr jê dıkeve, bı bêdengê bıqede, wek xwe dımine û qertafa "and" bı dawiya wanve tê danin. Mina:

Bezi bezand, raza razand, slıki slıkand, revi revand
Rûnışt rûnıştand, nvıst nvıstand, mır mrand

Dı lêkerên dervazi krida, qertafa raderê "ın" bı qertafa "and" ve tê danin, bı vi ewayi radera dervazi kri tê hmatê. Mina:

Bezand bezandın, razand razandın, slıkand slıkandın
Rûnıştand rûnıştandın, nvıstand nvıstandın

Hınde lêkerên dervazi hene ku bı qaydê lêkerên dervazi kri hatıne dervazi krın:

Dervazi	D. kri	Dervazi	D. kri
Bri	brand	kêşa	kêşand
Nvisi	nvisand	kola	koland
dzi	dzand	pêça	pêçand

Ev celeb dervazi krın hêç têgıhê naguherine. Lewra ev celeba lêkeran şxwe dervazine. Dıxwazi bıbêje: Mın rêzıman nvisi û dıxwazi bıbêje mın rêzıman nvisand, cxare pêça, cxare pêçand, destê mjoker bri, destê mjoker brand. Herdu ji dı têgıh, dem û dervaziya xweda yekın û bıkaranina herduyan ji drıste.

108. B- Lêkerên nedervazi: Ev lêker ewın ku bzavê jı kırdê der-

vaz nake, serve kırde pxweye, kırnê dı kırdeda ifade dıkın. Jıber ku bzav dı hawir kırdedaye jı wanra lêkerên nedervazi têne gotın. wekok: Çêra, çêri, hewısi, şemıri, ket, raket, şemıti

Vezela, ponıji, hzıri, bezi, şkest, xeyidi
Nali, kali, perçıqi, pelıxi, şewıti, veceniqi
Lepıti, lewıti, peyıvi, xemıli, gevızi, tewızi
Ga çêra, şagırt hewısi, çra vemıri, Fêrıs bezi
Soro vezela, koledar şkest, zozanê me şemıri

Çawan lı jorin dıxwıyê ku kırde yani ga, şagırt, çra, Fêrıs û Soro pxwe çêra, hewısi, vemıri, bezi û vezela. Hate zanin ku tesira lêker jı kırdê ne boriye. Bı ewayek dın bıbêjin serve dı nefsa kırdêda tê hmatê, yani serve kırde pxweye, bzav dı kırdêda dımine.

Em çend wekokek jı lêkerên dervazi binin ku hûn dı navber wanda kemperandın çêkın:

Soro rê çêkır, mamoste dbıstan xemıland, Temo dar bri
Şoreşvanan gel rızgar kır, qutabi pırtûk xwend
Rewşenên welat karker û cotar şiyar krın, dıjmın
nişa wan dan û bı hevra beri xwe dane zorker û koledaran

Dı van hevokanda ji wsan xwiya ku bzav jı kırde dervaz bûye û tesir ne lı kırde Soro, mamoste, şoreşvan, Temo û rewşenaye. Tesir serve (rê, dbıstan, gel, pırtûk, karker, dıjmın, zorker û koledara) ye

Bı vi ewayi lêkerên dervazi, nedervazi jı hev têne nasin.

Em hınde ji dabaş jı lêkera bûn bıkin.

Lêkera bûn: Me got dı lêkerên nedervazida bzav dı kırdeda dımine lê dı lêkera bûnda bûn kırde pxweye. jıber vê yekê jêra lêkera bûn tê gotın:

Keçık rınde, hıngıv şrine, axa welat piroze
Karker bı hêze, koledar stemkare, gel stembare

- -

Dema se bezi gur, gur mır (Gotına mezınan)
Çêlekek rêxoti garanê gişk dılewıtine (Gotına mezınan)

RADER

109. Rader: Çqas rader hene jı du pışkan pêktên: Qurmê lêkerê

û qertafa raderê

Eger lêker bı tipek dengdêr bıqede, qertafa raderê "n" ye û heke bı tipek bêdeng bıqede, qertafa raderê "ın" e

Dı zmanê Kurmancida rader, Lêkera raweya prani ya dema boriya sısêyane û qurmê lêkerê ji lêkera raweya yekani ya dema boriya sısêyane.

Nasin û danenasina raderan:

Rader	qurmê lêkerê	qertafa raderê
Bezin	bezi	n
Revin	revi	n
Dan	da	n
Hatın	hat	ın
Çêkırın	çêkır	ın
Avêtın	avêt	ın

Qurmê lêkerê, kêşana hemi demên bori pêktine. Mina:

Revi, reviye, revibû, revibûya, heke revibûya

Dakır, dakırıye, dakırıbû, dakırıbûye, ku dakırıbû

Pıştı zanina van, vêca em lı ser qurmê lêkeran dıkarın rawestın

QURMÊ LÊKERAN

Dı zmanê meda du celeb qurmê lêkeran hene:

A- Qurmê lêkerê

B- Qurmê lêkera fermani

110. A- Qurmê lêkerê: çawan lı jorin ji dıxwıyê bı avêtına qertafa raderê (n, ın) qurmê lêkerê derdıkeve hmatê. wekokên wê lı jorin hatıne dan, êdi lı vır naxwaze.

Qurmê lêkerê wha bı hêsani tê nasin. Jıber vê yekê, drêj lı ser rawestan ne gringe, ya gring nasina qurmê lêkera fermaniye.

Balakêş: Jı qurmê lêkerêra lêker, jı qurmê lêkera fermanira lêkera fermani ji tê gotın

---

Herkesê xwe wında ne kri, jıbo zmanê xwe yê maderi (zıkmaki) şer kriye û dıke

(Kamran Bedırxan)

Institut kurde de Paris

WANE XVII

PÊKHATINA QURMÊ LÊKERA FERMANÎ

111. B- Lêkera fermani: Çawan lı mjara 110 anda ji hatıbû dabaş kırın ku nasina lêkera fermani mina nasina lêkerê ne hêsane.

Bı ketına tipek jı dawiya hınde lêkeran, qurmê lêkera fermani pêktên û hnek jê guhertınên curbecur dıxwaze û lêkerên ne sazi hındık ji bın hene

Çawan demên bori jı qurmê lêkeran têne kêşan wsan dema nho û bê ji jı qurmê lêkera fermani tê kêşan. Bı çı ewayê qurmê lêkera fermani pêktê bla bê, rê dıde kêşanên dema nho û bê

Lêkerên xwerûda danina "bı" ya daçeka fermani lı pêşi bı lêkerve dıxwaze. Jıbo nemiya fermanê yên kesên yekani (jı bıl çend lêkerek) "e" yek lı dawi hemi curên lêkeranve têde danin. (lı 159 an bınêrın)

Gorê lêkera fermani, lêker dıbın du bır

A- Lêkerên sazi

B- Lêkerên nesazi

LÊKERÊN SAZÎ

A- Lêkerên sazi: Ev lêker ewın ku bı ewayek sazi jı qurmê lêkerê bı qaydan qurmê lêkera fermani çêdıbe

Lêkerên sazi ji dı nav xweda dıbın çar bır.

institut kurde de paris

112. a- Bra yekem jı lêkerên sazi:

Lêker bı tipek dengdêr dıqede û bı ketına wê dengdêrê qurmê lêkera fermani dınıme.

Balakêş: Jıbo têgıha qenc, emê lêkerên çêkıri ji dı van tabloyanda vekıtının. Hınga jı berevajive em dıçıne lêkerên çêkıri. Yani jı lêkerê em ali lêkera fermanive dıçın. Halkubû dı lêkerên çêkırida, jı lêkera fermani ali lêkerêve rê dıçe.

a- Tablo:

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Arhan	arha	arh		barhe
Barin	bari	bar	bıbar	bıbare
Betılin	betıli	betıl	bıbetıl	bıbetıle
Bezin	bezi	bez	bıbez	bıbeze
Borin	bori	bor	bıbor	bıbore
Brin	bri	bır	bıbır	bıbıre
Bzıvin	bzıvi	bzıv	bıbzıv	bıbzıve
Cemıdin	cemıdi	cemıd	bıcemıd	bıcemıde
Çêran	çêra	çêr	bıçêr	bıçêre
Çrısin	çrısi	çrıs	bıçırıs	bıçırıse
Dan	da	d	bıd	bıde
Denkin	denki	denk	bıdenk	bıdenke
Denzin	denzi	denz	bıdenz	bıdenze
Dzin	dzi	dız	bıdız	bıdıze
Ecıbin	ecıbi	ecıb	bıecıb	bıecıbe
Elımin	elımi	elım	bıelım	bıelıme
Enırin	enıri	enır	bıenır	bıenıre
Fetılin	fetıli	fetıl	bıfetıl	bıfetıle
Geran	gera	ger	bıger	bıgere
Ghan	gha	gıh	bıgıh	bıgıhe
Henkin	henki	henk	bıhenk	bıhenke
Heyırin	heyıri	heyır	bıheyır	bıheyıre
Jenin	jeni	jen	bıjen	bıjene
Kalin	kali	kal	bıkal	bıkale
Kelan	kela	kel	bıkel	bıkele
Kesıpin	kesıpi	kesıp	bıkesıp	bıkesıpe

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Kêşan	kêşa	kêş	bıkêş	bıkêşe
Kezıxin	kezıxi	kezıx	bıkezıx	bıkezıxe
Kolan	kola	kol	bıkol	bıkole
Krin	kri	kır	bıkır	bıkıre
Kzırin	kzıri	kzır	bıkızır	bıkızıre
Kutan	kuta	kut	bıkut	bıkute
Lepıtin	lepıti	lepıt	bılepıt	bılepıte
Lewıtin	lewıti	lewıt	bılewıt	bılewıte
Lvin	lvi	lıv	bılıv	bılıve
Meşan	meşa	meş	bımeş	bımeşe
Mezıxin	mezıxi	mezıx	bımezıx	bımezıxe
Nalin	nali	nal	bınal	bınale
Nêrin	nêri	nêr	bınêr	bınêre
Nvisin	nvisi	nvis	bınıvis	bınıvise
Peyıvin	peyıvi	peyıv	bıpeyıv	bıpeyıve
Pêçan	pêça	pêç	bıpêç	bıpêçe
Pjan	pja	pıj	bıpıj	bıpıje
Pırsin	pırsi	pırs	bıpırs	bıpırse
Rcıfin	rcıfi	rcıf	bırıcıf	bırıcıfe
Qefılin	qefıli	qefıl	bıqefıl	bıqefıle
Qehırin	qehıri	qehır	bıqehır	bıqehıre
Revin	revi	rev	bırev	bıreve
Rjan	rja	rıj	bırıj	bırıje
Rqin	rqi	rıq	bırıq	bırıqe
Şewıtin	şewıti	şewıt	bışewıt	bışewıte
Şemırin	şemıri	şemır	bışemır	bışemıre
Şeqıtin	şeqıti	şeqıt	bışeqıt	bışeqıte
Telıfin	telıfi	telıf	bıtelıf	bıtelıfe
Telışin	telışi	telış	bıtelış	bıtelışe
Temırin	temıri	temır	bıtemır	bıtemıre
Terıkin	terıki	terık	bıterık	bıterıke
Teyısin	teyısi	teyıs	bıteyıs	bıteyıse
Tırsan	tırsa	tırs	bıtırs	bıtırse

Institut kurde de Paris

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Weşan	weşa	weş	bıweş	bıweşe
Wêran	wêra	wêr	bıwêr	bıwêre
Xezıbin	xezıbi	xezıb	bıxezıb	bıxezıbe
Xenqin	xenqi	xenq	bıxenq	bıxenqe
Zanin	zani	zan	bızan	bızane
Zelıqin	zelıqi	zelıq	bızelıq	bızelıqe
Zvırin	zvıri	zvır	bızıvır	bızıvıre

Haj: Fermaniya prani wloye: Bızıvırın, bımeşın, bıkelıjın, bıbezın.

113. b-Bra duwem jı lêkerên sazi: Lêker bı tipek bêdeng dıqede û dengdêra kita dawi ji ne "a" ye, bı ketına bêdenga dawi lêkera fermani çêdıbe:

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Bıhistın	bıhist	bıhis	bıbıhis	bıbıhise
Cûtın	cût	cû	bıcû	
Geztın	gezt	gez	bıgez	bıgeze
Jendın	jend	jen	bıjen	bıjene
Gırtın	gırt	gır	bıgır	bıgıre
Guhertın	guhert	guher	bıguher	bıguhere
Leyıstın	leyıst	leyıs	bıleyız	bıleyıze
Miztın	mizt	miz	bımiz	bımize
Nhêrtın	nhêrt	nhêr	bınıhêr	bınıhêre
Kevtın	kevt	kev	bıkev	bıkeve

114. c. Bra sêyem jı lêkerên sazi: Lêker bı tipek bêdeng dıqede lê ew tip ne "d" ye. Dengdêra kita dawi ji "a" ye "a" dıbe "ê" û bêdenga dawi ji dıkeve:

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Bhartın	bhart	bhêr	bıbıhêr	bıbıhêre
Bjartın	bjart	bjêr	bıbıjêr	bıbıjêre
Braştın	braşt	brêş	bıbırêş	bıbırêşe
Bvaştın	bvaşt	bvêş	bıbıvêş	bıgıvêşe

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Gvaştın	gvaşt	gvêş	bıgıvêş	bıgıvêşe
Guhaztın	guhazt	guhêz	bıguhêz	bıguhêze
Hejmartın	hejmart	hejmêr	bıhejmêr	bıhejmêre
Hnartın	hnart	hnêr	bıhınêr	bıhınêre
Kezaxtın	kezaxt	kezêx	bıkezêx	bıkezêxe
Parastın	parast	parêz	bıparêz	bıparêze
Pelaxtın	pelaxt	pelêx	bıpelêx	bıpelêxe
Qelaştın	qelaşt	qelêş	bıqelêş	bıqelêşe
Qeşartın	qeşart	qeşêr	bıqeşêr	bıqeşêre
Qewartın	qewart	qewêr	bıqewêr	bıqewêre
Quraftın	quraft	qurêf	bıqurêf	bıqurêfe
Spartın	spart	spêr	bıspêr	bıspêre
Telaştın	telaşt	telêş	bıtelêş	bıtelêşe
Traştın	traşt	trêş	bıtrêş	bıtrêşe

115. ç-Bra çarem jı lêkerên sazi: Lêker bı tipek bêdeng dıqede û ew tip "d" ye. Dengdêra kita dawi ji "a" ye. "a" dıbe "i" û bêdenga dawi ji dıkev. Vi awayi lêkera fermani pêktê:

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Arhandın	arhand	arhin	barhin	barhine
Betılandın	betıland	betılin	bıbetılin	bıbetıline
Brıqandın	brıqand	brıqin	bıbırıqin	bıbırıqine
Cerıbandın	cerıband	cerıbin	bıcerıbin	bıcerıbine
Çandın	çand	çin	bıçin	bıçine
Çêrandın	çêrand	çêrin	bıçêrin	bıçêrine
Drandın	drand	drin	bıdırin	bıdırine
Ecıbandın	ecıband	ecıbin	bıecıbin	bıecıbine
Elımandın	elımand	elımin	bıelımin	bıelımine
Fetılandın	fetıland	fetılin	bıfetılin	bıfetıline
Guherandın	guherand	guherin	bıguherin	bıguherine
Hejandın	hejand	hejin	bıhejin	bıhejine
Helandın	heland	helin	bıhelin	bıheline
Hûnandın	hûnand	hûnin	bıhûnin	bıhûnine

Institut kurde de Paris

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Jiyandın	jiyand	jiyin	bıjiyin	bıjiyine
Kelandın	keland	kelin	bıkelin	bıkeline
Kenandın	kenand	kenin	bıkenin	bıkenine
Kşandın	kşand	kşin	bıkışin	bıkışine
Lerzandın	lerzand	lerzin	bılerzin	bılerzine
Lewıtandın	lewıtand	lewıtin	bılewıtin	bılewıtine
Meyızandın	meyızand	meyızin	bımeyızin	bımeyızine
Mrandın	mrand	mrin	bımırin	bımırine
Neqandın	neqand	neqin	bıneqin	bıneqine
Nvisandın	nvisand	nvisin	bınıvisin	bınıvisine
Pejırandın	pejırand	pejırin	bıpejırin	bıpejırine
Pelıxandın	pelıxand	pelıxin	bıpelıxin	bıpelıxine
Pjandın	pjand	pjin	bıpıjin	bıpıjine
Qedandın	qedand	qedin	bıqedin	bıqedine
Qehırandın	qehırand	qehırin	bıqehırin	bıqehırine
Qelışandın	qelışand	qelışin	bıqelışin	bıqelışine
Qelandın	qeland	qelin	bıqelin	bıqeline
Revandın	revand	revin	bırevin	bırevine
Rjanıdın	rjand	rjin	bırıjin	bırıjine
Rqandın	rqand	rqin	bırıqin	bırıqine
Strandın	strand	strin	bıstırin	bıstırine
Şewıtandın	şewıtan	şewıtin	bışewıtin	bışewıtine
Şemırandın	şemırand	şemırin	bışemırin	bışemırine
Tefandın	tefand	tefin	bıtefin	bıtefine
Telıfandın	telıfand	telıfin	bıtelıfin	bıtelıfine
Temırandın	temırand	temırin	bıtemırin	bıtemırine
Teqandın	teqand	teqin	bıteqin	bıteqine
Teyısandın	teyısand	teyısin	bıteyısin	bıteyısine
Tırsandın	tırsand	tırsin	bıtırsin	bıtırsine
Werandın	werand	werin	bıwerin	bıwerine
Weşandın	weşand	weşin	bıweşin	bıweşine
Xemılandın	xemıland	xemılin	bıxemılin	bıxemıline
Xesandın	xesand	xesin	bıxesin	bıxesine

Institut kurde de Paris

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Xaşandın	xaşand	xaşin	bıxaşin	bıxaşine
Xenıqandın	xenıqand	xenıqin	bıxenıqin	bıxenıqine
Xerandın	xerand	xerin	bıxerin	bıxerine
Xwışandın	xwışand	xwışin	bıxwışin	bıxwışine
Zelıqandın	zelıqand	zelıqin	bızelıqin	bızlıqine
Zewıcandın	zewıcand	zewıcin	bızewıcin	bızewıcine
Zvırandın	zvırand	zvırin	bızıvırin	bızıvırine

Haj: Lêkerên sazi ne ev qasın. Jıber ku heema pırtûka me hılnade û jı bo wekok ev çend lbên han hatın nvisandın. Çqas lêkerên sazi henın bı van herçar ewayan pêkıên. Lêkerên nesazi heta hêza me bıgıhê emê bısanıfının.

LÊKERÊN NESAZİ

116. B- Lêkerên nesazi: Ev lêker ewın ku jı lêkerê bı ewayek sazi lêkera fermani pêknayê. Lê bê guherın weki lêkerên sazi, dema nha û bê jı lêkera fermani bı ewayek sazi pêkıên. Lêkerên kêm ji jı vê beşê têne hejmarın. Beşek jı lêkerên nesazi xwedi du raderanın. Herweki radera dudan, dı hınde lêkeranda sazi dıxwıyên ji lê hêman ya yekane. Radera dudan ji em dınıvisın:

1. Rader	2. Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Ajotın		ajot	ajo	bajo	
Anin	inandın	ani	in	bin	bine
Avêtın		avêt	avêj	bavêj	bavêje
Axaftın		axaft	axêv	baxêv	baxêve
Brın		bır	b		bıbe
Çûn	çûyin	çû	ç	bıç	bıçe
Çûn	çûyin	çû		her	here
Ditın	binandın	dit	bin	bıbin	bıbine
Dotın	doşan	dot	doş	bıdoş	bıdoşe
Drûn		drû	drû	bıdırû	
Êxıstın	xıstın	êxıst	êx	bêx	bêxe
Frotın	froşan	frot	froş	bıfroş	bıfroşe
Grin		gri	gri	bıgıri	
Gotın		got	bêj	bıbêj	bıbêje

1. Rader	2. Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Hatın		hat	ê	bê	
Hatın		hat		wer	were
Hıştın	hêlan	hışt	hêl	bıhêl	bıhêle
Jin	jiyan	ji	ji	bıji	
Ketın	kevtın	ket	kev	bıkev	bıkeve
Kuştın	kujan	kuşt	kuj	bıkuj	bıkuje
Man	mayin	ma	min	bımin	bımine
Mêtın	mjan	mêt	mıj	bımıj	bımıje
Mrın		mır	mır	bımır	bımıre
Mıştın	malıştın	mışt	mal	bımal	bımale
Nvıstın	nvin	nvıst	nıv	bınıv	bınıve
Pehtın	pjan	peht	pêj	bıpêj	bıpêje
Pan		pa	pê	bıpê	
Razan		raza	razê	razê	
Reyin		reyi	rey	bırey	
Rêtın	rjan	rêt	rêj	bırêj	bırêje
Rûnıştın		rûnışt	rûn	rûn	rûne
Sotın	sojan	sot	soj	bısoj	bısoje
Şkestın	şkinandın	şkest	şkê	bışkê	
Şûştın		şûşt	şo	bışo	
Xwarın		xwar	xwe	bıx	bıxwe
Xwendın		xwend	xwin	bıxwin	bıxwine
Xwiyan		xwiya	xwiyê	bıxwiyê	
Zan	zayin	za	zê	bızê	

117. Rasnıvisa fermani: Çı lêkerên sazi çı nesazi, lêkera bı dengdêrê destpê bıke daçeka "bı, me" ya fermani dıkarın dengdêra xwe bêxın û xwe bı dengdêra lêkeranve bıgırın. Weki:

Alastın balês malês, avêtın bavêj mavêj

Axaftın baxêv maxêv, ajotın bajo majo

Lêkerên hevedudaniyên deçeki, heke hêmana wan sazi bın sazi, heke hêmana wan nesazi bın nesazine. Mina:

Institut kurde de Paris

Sazi

Rader	**Lêker**	**ferman**	**fermana nerım**
Veşartın	veşart	veşêr	veşêre
Hılbıjartın	hılbıjart	hılbıjêr	hılbıjêre
Wergırtın	wergırt	wergır	wergıre
Raweşandın	raweşand	raweşin	raweşine
Vemırandın	vemırand	vemırin	vemırine
Nesazi			
Razan	raza	razê	
Vexwarın	vexwar		vexwe
Rakırın	rakır	rak	rake
Hılketın	hılket	hılkev	hılkeve
Hılavêtın	hılavêt	hılavêj	hılavêje

Daçekên lêkeran daçeka fermani radıke. Daçekên neyini, daçeka neyini ya fermani û daçeka dema nho dıkevıne navbera daçekên lêkeran û lêkeran da, gış peve dızelıqın:

Raketın radıkeve, ranakeve, ranekeve, ramekeve
Vexwarın vedıxwe, venaxwe, venexwe, vemexwe

Institut kurde de Paris

WANE XVIII

DI LÊKERANDA NEYİNİ

118. Dı lêkeranda neyini: Neyini bı daçekan pêktê. Daçekên neyini yê ev herpêncın:

A- Bê, B- Nı, C- Na, Ç- Me, D- Ne

119. A- Jı daçekên neyini "bê": "bê" jıbo raderane û lı pêşi raderan eda tê danin:

Rakırın bê rakırın, şandın bê şandın
Çandın bê çandın, av dan bê av dan
Bê av dan sılk çênabe, bê kuştın gel nzgar nabe

120. B- Jı daçeken neyini "nı": "Nı" jıbo dema nho ya lêkera dızane û dıkareye. Daçeka dema nho "dı" dıkeve, lıciyê wê "nı" tê danin û têgıha demê ji neyini dınımine

Dızane	nızane
dıkare	nıkare

Nızane rehetiya cane, nıkare bê pare (Gotına mezınan)
Axa rêyan tev dızane lê rêya qenciya gel nızane

121. C- Jı daçekên neyini "na": Ev daçek jı bıl lêkera dızane, dıkare, dıwêre û lêkera bûn jıbo dema nhoye. Ev daçek ji "dı" ya daçeka dema nho têxe û xwe lı ciyê wê datine. Mina daçeka "nı"

têgiha demê bı neyini dınımine:

Dıxwine naxwine, dıperçıqe naperçıqe, dıke nake
Dıfetısine nafetısine, dıpelıxine napelıxine
Dıgıre nagıre, dışewıte naşewıte, dıçine naçine
Dıtırse natırse, dıkene nakene, dıpeyive napeyive

Bı awerteyi daçeka dema nho jıbo lêkera "wêri" "ne" ye: Dıwêre newêre dıwêre bıçe, newêre bıçe. Herçıqa hınde herêmê Kurdıstanê "nawêre" bıkartinın ji lê graniya Kurdıstanê "Newêre" dıxebıtinın.

Dı lêkerên hevedudaniyên daçekida, daçeka neyiniyê (na) mina daçeka erêniyê (dı) dıkeve navber pêşlêker û lêker, gişk pêve dızelıqın:

Vedıxwe-venaxwe-vedışêre-venaşêre, vedıke-venake
Hıldıkışe-hılnakışe, hıldıgıre-hılnagıre,
Radıbe-ranabe, radıhejine-ranahejine, radıde-ranade
Dadıgıre-danagıre, dadıkeve-danakeve, dadıçe-danaçe
Derdıde-dernade, derdıkeve-dernakeve, dertê-dernayê

Dı lêkerên hevedudaniyên arikerda, daçeka neyini mina daçeka erêni lı pêşi bı lêkerve, nav ji eda têne danin:

Dar dıke-dar nake, kevır dıke-kevır nake
Av dıde-av nade, can dıde-can nade
Hin dıbe-hin nabe, xweş dıbe-xweş nabe

Şxwe bê guher "na" bı ewayê neyini daçeka dema nhoye.

Heke lêker bı dengdêra "a" destpê bıke, jı daçeka neyini dengdêr dıkev û bêdenga daçekê xwe bı dengdêra lêkerve datine:

Avêtın	dıavêje	= tavêje navêje
Ajotın	dıajo	= tajo najo
Arhan	dıarhe	= tarhe narhe
Axaftın	dıaxêve	= taxêve naxêve

Agırê dlê dilan û dlê tengezar û bêzaran bı tıf û pıfan venamıre
Gel şiyar bû, êdi jı koledarên xwinmıj natırse
Serdesti û stema zorker û koledaran pır najo

122. Ç- Jı daçekên neyini "me": Ev daçek jıbo fermanêye. Hın-

Institut kurde de Paris

de herêm daçcka "ne" bıkartinın ji lê ya rast "me" ye. Evdaçck ji mina daçcka "na" dı lêkerên hevedudaniyên daçekida lı navber pêş lêker û lêker tê danin. Heke lêker bı dengdêra "a" destpê bıke, ji daçekê dengdêr dıkeve û bêdenga daçekê xwe bı dengdêra lêkerve datine û dı hemi curên lêkeranda, heke "bı" ya daçeka fermanê hebıt têxe, dıkeve chê wê:

Erêni	Neyini
Bıke	meke
Bışine	meşine
Bıkêş	mekêş
Vede	vemede
Rabe	ramebe
Dar ke	dar meke
Ava bıke	ava meke
Kevır bıke	kevır meke
Bavêj	mavêj
Balısês	malês

- -

Meçe şerê xal û xwarziyan, wê tu bıkevi hewar û gaziyan
Rastiyê vemeşêr û mebêj ezım şêr
Kasan malês bı alastınê zık têr nabe (Gotınên mezına)

123. D- Jı daçekên neyini "ne": Ev daçek jıbo hemi demên lêkera "bûn" jıbo dema bê, demên bori, kêşanên çiroki û raweyên daxwaziye. Ev daçek ji mina daçeka "na, me", dı lêkerên hevedudaniyên daçekida dıkeve navber pêşlêker û lêker, lêkerên bı dengdêra "a" destpê kri, dengdêr jı daçek dıkeve û bêdang xwe dengdêra lêkerve datine. Dı lêkeranda heke "bı" ya daçek hebe têxe û dıkeve ciyê wê. Ev daçek heke dengdêra xwe neyêxe, yan ji jı lêkeran daçek neyêxe eda tête danin:

Erênı	Neyini	Erêni	Neyini
Ewe	ne ewe	Kurde	ne Kurde
Dê bışine	dê neşine	dê bıbeze	dê nebeze
Şand	ne şand	bezi	ne bezi
Bışanda	neşanda	bıbeziya	nebeziya
Dıvê bışine	dıvê neşine	dıvê bıbeze	dıvê nebeze

Erêni	Neyini	Erêni	Neyini
Bla bışine	bla neşine	bla bıbeze	bla nebeze
Rabû	ranebû	av da	av ne da
Ajot	Najot	axaft	naxaft
Dıxwar	ne dıxwar	radıkır	ranedıkır

Dı lêkerên hevedudaniyên dında "ne" ya daçeka neyini eda lı pêşi lêkeran tê danin:

Ne hate şandın, ne da bırin
Ava ne kır, xwe ne girt
Jı hev ne hewan, lı hev ne xıstın

Balakêş: Daçekên neyini, heke dengdêrên xwe bêxın, ango jı lêkeran "dı" ya daçeka dema nho û "bı" ya daçeka fermani bêxın bı lêkeranve, eger ne, eda têne danin

- -

Dê axa jı mınra xwerek neşine, ku ne şand, ezê bı darê zorê bıstinım.
Heke mın emeka xwe ne daya zorkeran, nho ez ne dı bezima serê çiyan.
Dıvê êdi keda xwe nedım yên ne jı me, bla neji ji
Wi najote ser mın, mın ajote ser wi.
Dıvê nehêlım koledar biji, bla lı erda xwe ji neji.
Bav û kalên me vegirtox jı axa welat derexıstın, emê derxın.

DI LÊKERANDA AHENGİ

124. Dı lêkeranda ahengi: Ahengi du celebın:

A- Ahangiya lêker bı kırdera
B- Ahengiya lêker bı servera

125. A- Ahengiya lêker bı kırdera: Hemi demên lêkera bûn (lı mjara 247 an bınêrın), hemi demên lêkerên nedervazi û dema nho û bêya lêkerên dervazi, lêker bı kırdera ahenginın. Heke kırde yekanibe, lêker yekani, eger kırde pranibe, lêker prani dıbe û praniya serve bı tewangêye (bı kêşanêye):

Lêkera bûn:

Yekani	**prani**
Ez rındım	em rındın
Tu Kurdi	hûn Kurdın
Ew Tırke	ew Tırkın
Ez şoreşvanım	em şoreşvanın
Ew pêşmergeye	ew pêşmergene

Lêkerên nedervazi:

Keç bezi	keç bezin
Xort rabû	xort rabûn
Bûk xemıli	bûk xemılin
Karker şiyar bû	karker şiyar bûn

Dema nhoya lêkerên dervazi:

Keç çek hıldıde	keç çek hıldıdın
Keç çekan hıldıde	keç çekan hıldıdın
Qutabi pırtûk dıxwine	qutabi pırtûk dıxwinın
Qutabi pırtûkan dıxwine	qutabi pırtûkan dıxwinın

Dema bêya lêkerên dervazi:

Karker dê tvıng çêke	karker dê tvıng çêkın
Karker dê tvıngan çêke	karker dê tvıngan çêkın
Xort dê berık bine	xort dê berık binın
Xort dê berıkan bine	xort dê berıkan binın
Keç dê şer bıke	keç dê şer bıkın
Keç dê şeran bıke	keç dê şeran bıkın

Raweya blani:

Bla pêşmerge deri veke	bla pêşmerge deri vekın
Bla bano kınc bıkıre	bla bano kınc bıkırın
Bla bano kıncan bıkıre	bla bano kıncan bıkırın

Gelek paqıjım şoreşım (Cigerxwin)
Ew têre, ew têrın êşa zıkê bırçiyan nızanın.
Qutabi pırtûkan dıxwinın ku kêra gel û karkeran bên
Çqas **bextreş** pêşi bıgırın ji, dê gel şoreşa xwe bıkın û rızgar bıbın.

126. B- Ahengiya lêker bı servera: Hemi demên lêkera hebûn û

Institut kurde de Paris

demên bori yên lêkerên dervazi, lêker bı servera ahenginın. Eger serve yekani be, lêker yekani, eger serve prani be, lêker prani dıbe. Praniya kırdê bı tewangêye (bı kêşanêye):

Lêkera hebûn:

Yekani	**Prani**
Mın heye	mın hene
Te heye	te hene
Wi heye	wê hene
Me heye	me hene
We heye	we hene
Wan heye	wan hene
Mın keç heye	te kur hene
Me tvıng dê hebe	we benk dê hebın
Kurdan welat heye	Kurdan pêşmerge hene
Pêşmergan dê çek hebe	pêşmergan dê çek hebın
Leşker heye	leşker hene
Arteşen heye	arteşen hene
Jın heye	jın dê hebın

- -

Mın hebın sêsed hezar ezman û dev
Yek demê xafıl meminın roj û şev. (Melayê Bateyi)
Mın sê keç hebûn yek jı yadi çêtır û kurên mın ji.

Dema bori yên lêkera dervazi:

Mın kri	mın krin
Te frot	te frotın
Wi şand	wê şandın
Me razand	me razandın
We xwar	we xwarın
Wan çêkır	wan çêkırın
Mın zorker kuşt	mın zorker kuştın
Te koledar qewırand	te koledar qewırandın
Wê mjoker dit	wi mjoker ditın
Me dar bri	me dar brin
We xani çêkır	we xani çêkırın
Wan çek ani	wan çek anin

Institut kurde de Paris

Qutabi pırtûk xwendıye	qutabi pırtûk xwendıne
Pêşmergan ıvıng teqand	pêşmergan tvıng taqandın
Qotabiyan l.arker şiyar kır	qutabiyan karker şiyar kırın

- -

Şah bı qesta kuştına mın rım hejandın bê sebeb
Dame çeşmê qehr û xeşmê rım lı dıl da go edeb.

(Melayê Cziri)

Institut kurde de Paris

WANE XIX

DI LÊKERANDA DEM

127. Dı lêkeranda dem: Her bûyin, her krın dı nav demekda dıbore û tê krın. Bzav yan hatıye krın û qedaye, yan destpê krıye û dıdomine, yan ji hê ne hatıye krın, dê nû destpê bête krın. Nexu hate zanin ku dı zmanê Kurdida sê demên hêmani hene:

Dema bori : bzav qedaye
Dema nho : bzav dıdomine
Dema bê : bzav hê destpê ne kırıye

Dema bori dı nav xweda dıbe du bır:
Boriya têdayi (nizık). Boriya dûdar

Boriya têdayi:
Mın çêkır, te perçıqand, wê veşart, wi xwar
Me kri, we frot, wan şand, vezela, derket, rabi
Boriya dûdar:
Mın çêkırıye, te perçıqandıye, wi veşartıye
Me kriye, we frotıye, wan şandıye, vezelaye

Mın jıbo qutabiyên şoreşker êwırgahek çêkır.
Te çra arikariya qutabiyên şoreşker nekır.

Institut kurde de Paris

Dema nho:
Ez dıbezım, tu dırevi, ew dıxwine
Em dıbınn, hûn dıkêşın, ew dıçının

Ez dengek pır tehl dıbıhizım, gelo tu dızani çı denge?
Ne dıçım nwalên kûr, ne dıbinım xewnên hûr

(G. Mezınan)

Dema bê
Ezê razêm, tuyê vegeri ewê şemırine
Emê vekın, hûnê bıxwinın, ewê bıkenın
Ezê bıçıme mala hevalan
Tuyê jı biyaniyanra heta kengi bıxebıti?

Bı kurtasi vekıtandına van deman:

Boriya têdayi	: mın çêkır û frot
Boriya dudar	: mın çêkıriye û frotiye
Dema nho	: ez çêdıkım û dıfıroşım
Dema bê	: ezê çêkım û bıfıroşım

Dı zmanê meda dema nho û dema freh bı kêşanek pêktên (lı mjara 136 an bınêrın), Yani dema nho dema frehe ji.

Jı bıl van demên hêmani, raweyên çiroki ji henın lê bı van demanve peywendine. Dı raweyê daxwazida dem ne pır gringe. Heryek jı van, dı danekên xweda dabaş dê bêne kırın.

Institut kurde de Paris

DI LÊKERANDA KES Û HEYİN

128. Dı lêkeranda kes û heyin: Çqas kırın û bûyin hene, jı ali kesek û heyinekve dıbe yan ji tê kırın. Ew ji yan candarın yan bê can. Ku candarbın yan mrove yan ji heywan. Wekok:

Kevır hışke	kevır serê koledar dışkine
Hesp kumête	hesp giya dıxwe
Pêşmerge gemasın	pêşmergan şer kır

Dı van hevokên jorinda kevır, hesp û pêşmerge kırdene û dı eyni gavêda heyin û kesên lêkeranın ji. Kes û heyin yan yekani yan ji prani dıbın. Wekok:

Yekani	**Prani**
Kevır	kevıran
Hesp	hespan
Pêşmerge	pêşmergan

Yekani kesek, heyinek, prani jı yeki zêde kes û heyinan nişan dıdın. Heyin û kesên lêkeran, çawan ku bı navan pêktên, wsan bı cinavkan ji pêktên. Dı mjarı cinavkanda ji hatıbû dabaş krın (lı daneka 47 an bınêrın) ku dı zaravayê kurmancida du deste cinavk hene û heryek jı wan xwedi yekani û pranine:

Yekani	**Prani**
Ez mın	em me ewê dıpeyive
Tu te	hûn we yên guhdar
Ew wi, wê	ew wan yên dabaş jı wan tê krın

Desta ez, hemi demên lêkera "bûn", hemi demên lêkerên nedervazi û dema nho û bêya lêkerên dervazi pê tênе kêşan. Desta mın, jı hemi demên lêkera "hebûn, vên", dema bori yên lêkerên dervazira dıbın kırde.

Desta "ez" lı ciyê desta "mın" û desta "mın" ji lı ciyê desta "ez" nayên bıkaranin. Yani çewte dıciyê hev da nabın kırde:

Rast	**Çewt**
Ez rındım	mın rındım, mın rınde
Ez bezim	mın bezim, mın bezi
Hûn qencın	we qencın, we qence
Mın kuşt	ez kuştım, ez kuşt
Wan xwar	ew xwar, ew xwarın
Me şand	em şand, em şandın

Jı bıl ez kuştım, ew xwarın û em şandın, jı wanên çewt tu nayê fehm krın. Ez kuştım, ew xwarın û em şandın ji, ez ,ew, em ne kırdene, dıbın serve. Yani kesek dın ez kuştım, ew xwarın û em şandın.

DI LÊKERANDA RAWE

129. Dı lêkeranda rawe: Lêker gorê kes, dem û têgıhên xwe dıkevıne drûvên curbecur, jı her yek van drûvanra "rawe" tê gotın. Jı pêşkeri (agahdari) krına bûyeranra "raweyên pêşkeri" û jı bı daxwazi ifade krına bûyeranra "raweyên daxwazi" têne gotın.

Du celeb rawe hene: Raweyên daxwazi û raweyên pêşkeri. Raweyên daxwazi, dê lı daneka daxwazida bêne dabaş krın. Êdi lı vır ser sekının naxwaze

RAWEYÊN PÊŞKERİ

130. Raweyên pêşkeri: Ev rawe krınê yan jı bûyinê dı nav demanda bı tevlaya kes û heyinan dıdın diyar krın. Jıber van taybetiyan, jı wanra raweyên pêşkeri têne gotın.
Dı raweyên pêşkerida çar celeb kêşanên lêkeran hene:

Dema boriya têdayi
Dema boriya dûdar
Dema nho û freh
Dema bê

Heryek jı van kêşanan xwedi çiroki û şertiyên pêşkerine ji

- -

Jı xew şiyar bûm, qêrin û halan
Gurmin û nalin, kuştın û talan
Mın go çı bûye? Çiye bazdan?
Dengek hate mın dengek perişan
Kete ber lıngan ket ber destan
Dıjmın, dıjmın...
Dıjmın kete Kurdıstan (Cigerxwin)

PARÇEK XWENDINÊ NEVROZ

131. Nevroz cejna Kurdane. Bı teqwima Zayini (Miladi) bistûyek, teqwima Romi heşt û bı teqwima Kurdi Nevroz roja yekê Adarêye. İsal bı teqwima Kurdi Nevroz, roja Sêşem yekê Adarê û

sala duhezarûşehsedûheftêûheştane. Yani Nevroza isal bı teqwima Kurdi wha tê nvisandın. 1.1.2678. Lewra roja yekê Adarê sersale. (1)

Beri danina imparatoriya Medan Nevroz, cejna Kurdan ya oli bû. Pışti mezırandına imparatoriyê (700 hefsed sal beri zayinê) vêca bû cejna neteweyi ji. Jı wê rojê vırda hım oli, hım ji netewi, bı şahine (govend, dehol, zıme, blûr) û bı gişk pergalên gorani, bı agır krına çiyan û baniyan mrêzdarane tê piroz krın.

Nevroz mızginvanê baharêye û dawerê serkeftına rojên genm lı ser yên sar, frehi lı ser tengasi, xweşi lı ser nexweşi, xebat lı ser betali, têri lı ser bırçiti, mafi lı ser bêmafi, dadi lı ser stemkari û serkeftına dil, xzan, bırçi, cotkar û karkeran lı ser kedxwer, xwinmıj û koledarane. Nevroz, bı van taybetiyên xwe yên cvaki û abori, jı ali gelek gelên dınve ji hatıye piroz krın.

Piroz krına Nevrozê:

Bı kurtasi jı ali Kurdanve Nevroz, wha tê piroz krın:

Dusê meh beri, amadiya Nevrozê tê krın. Malxwiyên malan jı kıfletra kınc, pêlav û navmal dıkırın. Xort ji êzıngan dıkın xetile û dı ber arikên xaniyanra dıkın. Ew êzıng heta roja Nevrozê qenc hış kolek dıbın.

Roja Nevrozê çı jı ki bê xwe dı tewızinın, kıncên nû werdıgırın, xwarınên xweş dıpêjın û dıçın malên hev bı hevra xwarınê dıxwın û jı hevra "cejna we û ya maliyan piroz be" dıbêjın. Kıfletê malê ji wan kıncên berida amade gri werdıgırın, xwe dıxemılinın û bı kêfxweşi di fermana mêhvananda radıwestın. Pışti xwarın û vexwarınê, ew mêyweyên jıbo roja Nevrozê amade kri jı mêhvanara pêşkêşdıkın.

Keç û xort, Hevalek xwe bı kıncên sodret bıkartinın, dı drûva ecêbloskekda dıxemılinın, destek ri û sımbılê kalan jêra çêdıkın, tızbiyek drêjê lıbgır dıdın destan û bı dehol û zıme dı taxanda dıgerın. Bı qêrin û halan dıçın ber derê malan. Pışti hınde dehol û zıme

(1) Dıvê bête zanin ku hınde herêmên Kurdıstanê teqwima Kurdi jı fetha Ninuwayê (612 sal beri zayinê) dıhesıbinın. Ev teqwim ji gelek hatıye xebıtandın.

jendın û govend knnê, jı malvananra "Serê salê bnê salê, xwedê bıhêle pçûkê malê çı jı we tê bıdın vi kali" dıbêjın. Kevani bı kêfek xweş û dlek frch hêk, rûn, savar, kartol, bnnc, berparêz û meywan dıdın wan. Bı vi ewayi gelek xwerekan berhev dıkın û derdıkevın quntarên çiyan, curbecur xwarınan dıpêjın û gazi mezınan ji dıkın, bı hevra dıxwın û kêfxweş dıbın.

Hıngora şeva Nevrozê xort lı serê çiyayên bılınd agırê gur hıldıkın. Pışti agır hılkınna çiyan, tên û dıbın du deste. Destek jê gel lı dorê xwe kom dıkın û piyesa Kawayê hesınker dıleyzın û canê wi xweşmêri vedıjinın. Desta dın ji, wan xetilê amade kri vêdıxın, destê xwe dıgırın, dı taxanda bı merşên netewi, stran û bêrite dıgerın. Çekan dıteqinın û zompa hesınkeran daweriya Kawayê hesınker dıhejinın. Bı vi ewayi Nevrozê pêşkêş dıkın û canê şehidên Kurdan vedıjinın.

Dı demên kevında şahina Nevrozê lı gişk herêmên Kurdıstanê heftêyek dıdomand. Lê nho hınde herêm sê roj û hındeji mxabın rojek teni piroz dıkın.

Roja Çarşema beri Nevrozê heta roja çarşema pışti Nevrozê, yani dı nav ber herdu Çarşemanda Nevroz dıhate piroz krın. Heke Nevroz rasti roja Çarşemê bıhata, cejna mezın dıhate pejırandın û şahine jı Çarşema pêşi destpê dıkır, heta roja Nevrozê dıdomand lê ev Nevroz ne wek wanên dın, bı eweyek mrêz, şahinek pır mezın dıhate piroz krın. Dıvê iro ji wsan bıt.

Dı demên dewletên Botanda Nevroz bı dewleti dıhate piroz krın. Bınêrın mamostê mezın Ehmedê Xani dı Mem û Zinêda çı dıbêje?

Zanayê muemmerê kuhensal
Ev rengehe go jıbo me ehwal
    Go adetê pêşiyê zemanan
    Ev bû lı hemi ci û mekanan
Wextê weku şahsıwarê xawer
Tehmili dıkır dı mahê azer
    Yani ku dıhate bırcê sersal
    Qet kes ne dıma lı mesken û mal

Bılcımle dıçûn der jı malan
Hetta dıgıhişte pir û kalan
Roja ku dıbûye id û Nevroz
Tazim jıbo dema dılefroz
Sehra û çimen dıkırne mesken
Beyda û dimen dıkırne gulşen
Xasıma ezeb û keçê dı bakır
El qısse cwahırê dı nadır
Têkda dı mızeyyen û mılebes
Vêkra lı teferrıcê mrexxes

Geli duht û xortan! Qenc bala xwe bıdınê, hnek jı ruhbanên oli û dıgel nokerên burjuwa û xwinmıjan lê dıxebıtın ku vê roja granbaha ji mina hêjanên me yên cvaki û diroki bıdın wında krın.

Gumandarım ku jı iro paş her Kurdek lı vê roja hêjayi û dıgel hêjanên xwe yên dın dê xwediti bıke.

Institut kurde de Paris

WANE XX

RAWEYA PÊŞKERÎ DEMA BORÎYA TÊDAYÎ

Boriya nizık, boriya diti, boriya vebır.

132. Dema boriya nizık: Kırın qedaye, qedana wê nizıke, dıxwıyê û vebıre ji. Jıber vê yekê jêra lêkera dema boriya têdayi tê gotın.

Ev kêşan bê daçeke, rastbırast jı qurmê lêkaran pêktê. Jıbo kşandına vê lêkerê: Jı bıl yekaniya sısêyan qertafcinavk bı dawiya lêkerên nedervazive, cinavk eda lı pêşi lêkerên dervazi têne danin.

Balakêş: Dı hemi kêşananda, jıbo baş têgıhanê û bı hêsanî kşandına lêkeran çı peywıst be çı ne be, emê cinavkan ji bınıvisın:

Nedervazi		**Dervazi**
Ez ketım	ez bezim	mın çand mın çêkır
Tu keti	tu baziy	te çand te çêkır
Ew ket	ew bezi	wê çand wi çêkır
Em ketın	em bezin	me çand me çêkır
Hûn ketın	hûn bezin	we çand we çêkır
Ew ketın	ew bezin	wan çand wan çêkır

Neyini

Ez ne ketım, ez ne bezim, mın ne çand, mın çênekır

Institut kurde de Paris

Ez ketım newala, kort û kendala. (Cigerxwin)
Ez bezime koledar, koledar kır hewar.

RAWEYA PÊŞKERİ
ÇİROKİYA DEME BORİYA TÊDAYİ.

133. Çirokiya têdayi: Jıber ku dema boriya têdayi bı çiroki tê dabaş krın. Çirokiya dema boriya têdayi tê gotın.

Ev kêşan xwedi du demane. Demek jê krın têda hatıye hmatê û demek ji dabaş jê tê krın. Herdu dem ji dı boridanın.

Ev kêşan jı du lêkeran pêktê. Yek jê lêkera "bû" ye, ya dın ji lêkerek kêşandıye. Lêkera "bû" mina qertafekê lı dawi bı lêkera boriya têdayive tê danin û heke lêker bı bêdengê bıqede, dengdêra "ı" lı navber herdu lêkera tê danin. Weki: Şand şandıbû, frot frotıbû, bezand bezandıbû. Lêkerên nedervazi qertafeinavkan dıxwaze û bı lêkera "bû" ve têne danin:.

Nedervazi	Dervazi
Ez ketıbûm ez bezibûm	mın çandıbû, mın çêkırıbû
Tu ketıbûy tu bezibûy	te çandıbû te çêkırıbû
Ew ketıbû ew bezibû	wi çandıbû wê çêkırıbû
Em ketıbûn em bezibûn	me çandıbû me çêkırıbû
Hûn ketıbûn hûn bezibûn	we çandıbû we çêkırıbû
Ew ketıbûn ew bezibûn	wan çandıbû wan çêkırıbû

Neyini

Tu ne ketıbûy, tu ne bezibûy, te ne çandıbû, te çênekırı bû

Ya çepi danibû têda Zımrete (Ehmedê Bateyi)
Sbetırê Dınya hê sarıır bû. Rındê û Zizê çûbûn xebata xwe heta hıngorê ji xebıtibûn (C. Bedırxan)
Xecicê pırtûkek xwendıbû û rınd tê gıhabû.
Xemrevin hatıbû mal lê ez derketıbûm
Baran baribû lê hê berf ne helabû

Institut kurde de Paris

RAWEYA PÊŞKERİ DEMA BORİYA DÛDAR

Boriya dûr, boriya bıhisti.

134. Dema boriya dûdar: Kırın qedaye, qedana wê hım naxwıyê û hım ji jı dema têdayi dûrtıre, yan ji hatıye bıhistın. Jıber vê yekê jêra dema boriya dûdar tê gotın. Qertafa vê demê "e" ye. Teni kêşana yekaniya kesê dudan yên lêkerên nedervazi "i" ye.

Dı lêkerên nedervazida danina van "e, i" yan pışti qertafcinavkane. Yani pêşi qertafcinavk bı qurmê lêkeranve, paşi qertafên demê "e,i" ji bı qertafcinavkanve têne danin.

Eger lêker bı dengdêrê bıqede û gava bıxwaze "y" ya kelıjandınê û heke bı bêdengê bıqede "ı" ya kelıjandınê têne danin. Pışti van tevgeran vêca tablo tê bıkaranin:

Nedervazi	**Dervazi**
Ez ketıme ez bezime	mın çandıye mın çêkırıye
Tu ketıyi tu beziyi	te çandıye te çêkırıye
Ew ketıye ew beziye	wi çandıye wê çêkırıye
Em ketıne em bezine	me çandıye me çêkırıye
Hûn ketıne hûn bezine	we çandıye we çêkırıye
Ew ketıne ew bezine	wan çandıye wan çêkırıye

Neyini

Tu ne ketıyi, tu ne beziyi, te ne çandıye, te çênekırıye

- -

Qutabi pırtûk xwendıye û têgıhaye.
Mın dest avêtıye doza xwe, êdi zorker bı mın nıkare.
Mamoste pırtûka xwendınê aniye
Ew çûye hê ji ne hatıye

RAWEYA PÊŞKERİ.
ÇİROKİYA DEMA BORİYA DÛDAR

135. Çirokiya dûdar: Jıber dema boriya dûdar, bı çiroki dabaş jê tê kırın, çirokiya dema boriya dûdar tê gotın.

Çawan ku boriya dûdar, jı dema boriya têdayi dûrtır û ne vebır-

Institut kurde de Paris

tıre. Wsan çirokiya dûdar ji jı çirokiya têdayi durtır û ne vebırtıre.

Dı çirokiya dûdarda du dem hene: Yek jê krın têda hatıye kırnatê û demek ji dema dabaşa jêye. Yani dabaş jı dema boriya dûdare dı demek boriyê dında.

Ev çiroki ji mina çirokiya boriya têdayi jı du lêkeran pêktê. Yek jê lêkera "bû" ye. Ya dın lêkerek kêşandıye.

Qertafa çirokiya dûdar ji mina qertafa dema dûdar "e" ye. Teni jıbo yekaniya kesê dudan yên lêkerên nedervazi "i" ye. Ev qertaf bı lêkera "bû" ve têne danin û lêkera "bû" ji mina qertafek edeti bı lêkerve tê qertıfandın. Lêkerên nedervazi gava bıxwaze qertafcinavk, gava lêker bı bêdengê bıqede "ı" û gava du dengdêr rastê hev bên "y" a kelıjandanê neyên jı bir krın:

Nedervazi

Ez ketıbûme	ez bezibûme
Tu ketıbûyi	tu bezibûyi
Ew ketıbûye	ew bezibûye
Em ketıbûne	em bezibûne
Hûn ketıbûne	hûn bezibûne
Ew ketıbûne	ew bezibûne

Dervazi

Mın çandıbûye	mın çêkırıbûye
Te çandıbûye	te çêkırıbûye
Wi çandıbûye	wê çêkırıbûye
Me çandıbûye	me çêkırıbûye
We çandıbûye	we çêkırıbûye
Wan çandıbûye	wan çêkırıbûye

Neyini

Ez ne ketıbûme	ez ne bezibûme
Te ne çandıbûye	te çênekırıbûye

Balakêş: Bıkaranina vê kêşanê hındıke. Graniya xebata wê dı hevokên serve dawidane:

Ez çûbûme Diyarbekırê

Institut kurde de Paris

Tu çûbûyi şerê azadi
Wê çekên şoreşê dabûne serok.

Dıbêjın ku tu dı van çend salên dawida jıber ku jı chê xwe hatıbûyi dûr xıstın geleki lı ber xwe ketıyi

(Rabûn hejmar 1.)

Institut kurde de Paris

WANE XXI

RAWEYA PÊŞKERÎ DEMA NHO Û FREH

Lêkera dema nho dı eyni gavêda lêkera dema frahe ji.

136. Dema nho: Krınê destpê krıye û dıdomine. Dema freh krın dı hersê demandaye. Yani herdeme. Ev herdu dem ji bı vê kêşanê pêktê. Jıber vê yekê jêra dema nho û freh tê gotın.

Ev lêker jı lêkera fermanê tê kêşan. Daçeka wê ya demê "dı" ye. Jı lêkerên xwerû "bı" ya daçeka fermanê dıkeve û lı chê wê daçeka demê "dı" tê danin. Heke lêker bı dengdêrê destpê bıke, jı daçeka demê dengdêr dıkeve û bêdenga daçekê xwe bı dengdêra lêkerve dıgıre. Weki: Êşan dıêşe dêşê, avêtın dıavêje davêje, inan dıine dine û dıvan curên kêşananda "d" dıkare bıbe "t" ji. Weki: Dêşe têşê, davêje tavêje, dine tine...

Dı lêkerên hevedudaniyên daçekida, daçeka demê dıkeve navber pêşlêker û lêker û gişk peve dıgırın., Bı dawiya lêkerên dervazive ji qertafcinavak têne danin:

Nedervazi

Ez dıkevım	ez dıbezım
Tu dıkevi	tu dıbezi
Ew dıkeve	ew dıbeze

Em dıkevın	em dıbezın
Hûn dıkevın	hûn dıbezın
Ew dıkevın	ew dıbezın
Dervazi	
Ez dıçinım	ez çêdıkım
Tu dıçini	tu çêdıki
Ew dıçine	ew çêdıke
Em dıçinın	em çêdıkın
Hûn dıçinın	hûn çêdıkın
Ew dıçinın	ew çêdıkın
Neyini	
Ew nakeve	ew nabeze
Ew naçine	ew çênake

Balakêş: Xebıtandına lêkerê bı têgıha dema nho yan ji freh, jı henkina danekê tê zanin:

Karbıdestên maldar û koledaran bertil dıxwın, yên gelan naxwın. Reşo xwarın dıxwe. Dı hevokên pêşida "dıxwın, naxwın" herdeme, ya dawi dıxwe dema nhoye.

- -

Karker û cotar lı pêşber zorker û koladaran berxwedanê tajon.

Neteweyên serdest û refa mjoker, jehriya dubendiyê têxın nav netewe, gel û refa bındest.

RAWEYA PÊŞKERİ
ÇİROKİYA DEMA NHO Û FREH.

137. Çirokiya dema nho û freh: Jıber ku dı dema borida dabaş jı dema nho û frehê beri wê gavê tê kırın, jêra çirokiya dema nho û freh tê gotın. Nexu çirokiya deme nho û freh, dabaş jı dema nho û frehê boriye, dı dema borida. Mina mın dıkır, te dıfırot, wi dıbıriya. Yani ne nho, dı wê gava borida mın dıkır, te dıfırot, wi dıbıriya.

Ev lêker jı qurmê lêkerê tê kêşan. Daçeka demê "dı" lı pêşi bı lêkerve tê danin. Mina: dıgot, dışand, dıçıniya. Lêkerên hevedudaniyên daçeki, daçeka demê dıkeve navber pêşlêker û lêker û gişk bı heve têne zelıqandın. Mina: Hıldıda, radıkır, dadıda, vedıbû.

Lêkerên bı dengdêra "i" bıqedın danina "a" yek bı dawiya kêşanêve çêtıre. Mina: Dıbıriya, dıreviya, dıkeniya.

Dı lêkerên dında, danin û ne danina "a" yê mina heve. Mina: Radıza radızaya, dıçû dıçûya, dışemırand dışemıranda, vedıkır vedıkıra.

Divê dı lêkerên nedervazida, qertafcinavk û gava du dengdêr rastê hev bên "y" ya kelıjandınê neyê jı bir krın.

Nedervazi	
Ez dıketım	ez dıbezima
Tu dıketi	tu dıbeziya
Ew dıket	ew dıbeziya
Em dıketın	em dıbezina
Hûn dıketın	hûn dıbezina
Ew dıketın	ew dıbezina
Dervazi	
Mın dıçand	mın çêdıkır
Te dıçand	te çêdıkır
Wê dıçand	wi çêdıkır
Me dıçand	me çêdıkır
We dıçand	we çêdıkır
Wan dıçand	wan çêdıkır
Neyini	
Wan ne diçand	wan çênedıkır
We ne dışand	we venedıxwar

Balakêş: Hınde herêm: Tu dıbeziyayi, tu dıreviyayi bıkartinın

- -

Esker lı ciyê xwe melûl û dıl şkesti dıman, bê deng guh dıdan gotaran, bê dıl û bı sısti dıhıştın wan rêkın eniya şer (Ereb Şemo)

Jıbo şiyar bûna gelê Kurd, Ehmedê Xani dıxebıtiya û Melayê Cziri ji hılbeste çêdıkır.

RAWEYA PÊŞKERİ
ÇİROKİYA DEMA NHO Û FREHA HEVEDUDANİ

138. Çirokiya nhoya hevedudani: Jıber ku jı du lêkran pêktê he-

Institut kurde de Paris

vedudani û dabaş jı dema nho û frehe dı dema borida çirokiye ji. Jıber vê yekê jêra çirokiya dema nho û freha hevedudani tê gotın.

Şxwe têgıha çirokiyê ji hındık dıguherine. Yani demê hnek vebırtır û xwerûtır dıke.

Ev kêşan ne tevayiye, yani dı hınde lêkeranda dıxwıyê. Heta nho çar lêker (zanin zani, vêyan, vêya, wêrin wêri, karin kari) hatıne senıfandın (tesbit kırın).

Ev ji mina çirokiya dema nho û freh, jı qurmê lêkerê û daçeka demê tê kêşan. Teni lêkera "bû" lê tê zêde kırın. Daçek, lêker û lêkera "bû" bı heve têne danin:

Mın dıkaribû	mın dızanibû
Te dıkaribû	te dızanibû
Wi dıkaribû	wê dızanibû
Me dıkaribû	me dızanibû
We dıkaribû	we dızanibû
Wan dıkaribû	wan dıvêyabû
Te dıwêribû	te dızanibû
Mın dıwêribû	mın dıvêyabû
Wê dıwêribû	wi dıvêyabû
Me dıwêribû	me dıvêyabû
We dıwêribû	we dıvêyabû
Wan dıwêribû	wan dıvêyabû
Mın ne dızanibû	te ne dıkaribû
Wan ne dıwêribû	we ne dıvêyabû

Hınde herêmê Kurdıstanê "i" ya lı dawiya lêkeranve bı "ı" yê dıguherın. Hınga wha dıbe: Dıkerıbû, dızanıbû, dıwêrıbû...

Dı zanina mında herdu ewa ji dırıstın. Lewra têgıh naguhere.

Hınde herêm ji dıviyabû bıkartinın. Bı mın ev ji raste. Lewra viyan ji mina vêyanê radere û têgıha wan ji yeke.

- -

Kesi ne dızanibû ku lı serê wê qewımiye çı ecêba grane (Memê Alan)

Gelo bavê mın dı wextêda zlameki hıkûmetê bû, jıber ku dı emırda hatıbû gotın ku dıviyabû hemi mıxtar arikariya bavo bıkın. (Ereb Şemo)

Institut kurde de Paris

WANE XXII

RAWEYA PÊŞKERİ DEMA BÊ

Dema paşi, dema dû nho, dema paşeroj.

139. Dema bê: Knnê hê destpê neknye. Jıbo vê yekê jêra dema bê tê gotın.

Ev lêker jı lêkera fermanê tê kêşan.

Daçeka nmandına demê "ê" ye. Gorê devokên herêman "ê" ya daçek bı serê xwe ji tê bıkaranin. Weki: Ê bıxwe. Bı "w, d, t" yêve ji tê danin. Weki: Wê bıxwe, dê bıxwe, tê bıxwe...

Daçeka demê eda lı beriya lêker heta lı beriya kırdê ji disa eda tê danin. Weki: Reşo dê bıçe şerê axan, wê Reşo here şerê vegırtoxan. Ez tê çekan bıkınm, Wê ez çekan bıkınm, ez çekan dê bıkınm. Heke kırde cinavk be, "ê" ya daçeka demê pêve ji tê danin. Weki: Ezê herme dbıstana blınd, tuyê heri zanoşkê.

Daçeka fermanê "bı" lı ciyê xwe dımine. Dı hemi kêşanên lêkeranda, bı dawiya lêkeranve qertafcinavk têne danin:

Nedervazi

Ezê bıkevım	ezê bıbezım
Tuyê bıkevi	tuyê bıbeziy
Ewê bıkeve	ewê bıbeze

Emê bıkevın	emê bıbezın
Hûnê bıkevın	hûnê bıbezın
Ewê bıkevın	ewê bıbezın
Dervazi	
Ezê bıçinım	ezê çêkım
Tuyê bıçini	tuyê çêki
Ewê bıçine	ewê çêke
Emê bıçinın	emê çêkın
Hûnê bıçinın	hûnê çêkın
Ewê bıçinın	ewê çêkın
Neyini	
Ezê nekevım	ezê nebezım
Ezê neçinım	emê çênekın

Çawan dı tabloyêda ji dıxwıyê ku "ne" ya daçeka neyini, "bı" **ya daçek** êxıstıye û xwe lı ciyê wê daniye.

- -

Jıbo pêşve çûnê ezê pır bıxebıtım.
Ger wi bı vê rengê Mem rha kır
Derdêd dlê me wi dewa kır
Wer meyı msır lı ser inadê
Em dê bıgırin we reng cêhadê (Ehmedê Xani)

RAWEYA PÊŞKERİ
ÇİROKİYA DEMA BÊ.

140. Çirokiya dema bê: Jıber ku dı dema boride dabaş jı dema bê tê kırın, jêra çirokiya dema bê tê gotın.

Gotox xwe dıbe dema bori û jı dema bêya wan gavan dabaş dıke. Mina: Dê Azad bıxwenda, dê Reşo bıçûya şer, wê Zerifê bınıvisiya, Ferzende û Kendal dê bıhatına. Yani dı wê gavêda hê ne xwendıbû, ne çûbû, ne nvisibû û ne hatıbûn, dê bıxwenda, bıçûya, bınıvisiya û bıhatına. Bı vê rewşê ji bıbêjım: Mın dê wergırta, yani ne nho, wê gav bori mın dê wergırta.

Çirokiya dema bê, jı qurmê lêkerê tê keşan. Ev ji mina dema bê "ê" ya daçek bı serê xwe ji tê bıkaranin û bı "w, d, t" yêve ji dıgıre,

Institut kurde de Paris

lı pêşi lêkeran heta lı pêşi kırdan cda û heke kırde cinavkbe bı cinavkêve ji tê danin. "Bı" ya daçek lı pêşiya lêkerên xwerû dımine. Jı dema bê guherti, ev jı qurmê lêkerê tê kêşan û "a" ya çiroki bı dawiya kêşananve tê danin. Mina: Ezê bıxebıtima, dê Kurdo gerdo bıkuşta, mın dê rêzman bınıvisiya, Şeva Nevroza sala par, xort û keçên Kurdan lı çiyayên blınd dê agır bıkırına.

Dı lêkerên nedervazida qertafcinavk û navbera du dengdêran "y" ya kelıjandınê neyê jı bir krın:

Nedervazi

Ezê bıketıma	ezê bıbezima
Tuyê bıketa	tuyê bıbeziya
Ewê bıketa	ewê bıbeziya
Emê bıketına	emê bıbezina
Hûnê bıketına	hûnê bıbezina
Ewê bıketına	ewê bıbezina

Dervazi

Mınê bıçanda	mınê çêkıra
Teyê bıçanda	teyê çêkıra
Wêyê bıçanda	wiyê çêkıra
Meyê bıçanda	meyê çêkıra
Weyê bıçanda	weyê çêkıra
Wanê bıçanda	wanê çêkıra

Neyini

Wiyê neçanda	wêyê çênekıra
Emê neketına	emê venebûna

Balakêş: Dı lêkerên nedervazida yekaniya dudan: Tuyê bıketaya, tuyê bıbeziyaya, tuyê bıketıyaya ji têne bıkaranin û gava cinavkên desta mın (mın, te, wi, wê, me, we, wan) bıbın kırde, daçeka dema bê cda lı pêşi yan ji lı pê cinavkê bête danin çêtıre. Mina: Wan ê bavêta, dê me bıkıra, te dê rakıra, tê mın bıjenda...

RAWEYA PÊŞKERİ
DEMA BÊYA HEVEDUDANİ

141. Dema bêya hevedudani: Jıber ku jı du lêkeran pêktê û jı

dema bêye ji, jêra dema bêya hevedudani tê gotın.

Dı vê kêşanêda du dem hene, yani tevlêheviya dema bê û dema boriye û têgıha herdu deman ji têda dıxwıyên. Mina: Wê Reşo çûbe hewara karkeran, dê Azad dbıstana blınd xwendıbe, Karker û cotkarên welat misoger dê şiyar bıbın. Yani Reşo, Azad, karker û cotkar heta nho ne sekınine, wê hewara karkeran, xwendın û şiyar bûn pêkanibın.

Ev kêşan jı qurmê lêkerê û jı lêkara "bûn, be" pêktê, Lêkara "be" herwekê qertafekê edeti lı dawiya lêkerve dıgıre û daçeka dema bê "ê, wê, dê, tê" mina dema bê lı pêşi, heta lı pêşi servê û kırdê eda ku kırde cinavk be bı cinavkêve ji tê danin.

Dı lêkerên nedervazida xwezayi qertafcinavk hene. Lı navber lêkera bêdang qedayi û lêkera "be" "ı" ya kelıjandınê û gava du dengdêr rastê hev hatın "y" ya kelıjandınê neyê jı bir krın:

Nedervazi

Ezê ketıbım	ezê bezibım
Tuyê ketıbi	tuyê bezibi
Ewê ketıbe	ewê bezibe
Emê ketıbın	emê bezibın
Hûnê ketıbın	hûnê bezibın
Ewê ketıbın	ewê bezibın

Dervazi

Mınê çandıbe	mınê çêkırıbe
Teyê çandıbe	teyê çêkırıbe
Wêyê çandıbe	wiyê çêkırıbe
Meyê çandıbe	meyê çêkırıbe
Weyê çandıbe	weyê çêkırıbe
Wanê çandıbe	wanê çêkırıbe

Neyini

Meyê ne çandıbe	meyê çênekırıbe
Teyê ne çandıbe	teyê çênekırıbe
Hûnê ne kenibın	hûnê rûnenıştıbın

Dema bêya hevedudani ya lêkera zani, karı û wêri, çawan bı drûva jorin tê bıkaranin, bı vi ewayi jêrin ji tê xebıtandın:

Ezê bıkarıbım, tuyê bıkarıbi, ewê bıkarıbe...

Institut kurde de Paris

Dıvê bête zanin ku dı vê kêşanêda teni têgıha dema bê heye.

- -

Dê Reşo jı şoreşêra qumbere peyda krıbın
Dê Dıjwar çûbe nav karkerên karxanê

RAWEYA PÊŞKERİ
ÇİROKİYA DEMA BÊYA HEVEDUDANİ.

142. Çirokiya bêya hevedudani: Jıber ku jı du lêkeran pêktê hevedudani û dema bê ji bı çiroki tê dabaş krın çirokiye. Jıbo vê yekê jêra çirokiya dema bêya hevedudani tê gotın.

Çêbûna vê kêşanê nizıkê dema bêya hevedudaniye. Têgıha wê şxwe çirokiya deme bêya hevedudaniye.

Dıvê kêşanêda lêkara "be" dıbe "bû" û "a" ya çiroki ji bı dawiyêve tê danin.

Qertafeinavk û "ı, y" ya kelıjandınê neyê jı bir krın:

Nedervazi	
Ezê ketıbûma	ezê bezibûma
Tûyê ketıbûya	tuyê bezibûya
Ewê ketıbûya	ewê bezibûya
Emê ketıbûna	emê bezibûna
Hûnê ketıbûna	hûnê bezibûna
Ewê ketıbûna	ewê bezibûna
Dervazi	
Mınê çandıbûya	mınê çêkırıbûya
Teyê çandıbûya	teyê çekırıbûya
Wêyê çandıbûya	wiyê çêkırıbûya
Meyê çandıbûya	meyê çêkırıbûya
Weyê çandıbûya	weyê çêkırıbûya
Wanê çandıbûya	wanê çêkırıbûya
Neyini	
Teyê ne çandıbûya	teyê çênekırıbûya
Mınê venexwarıbûya	mınê venekuştıbûya
Weyê ne kelandıbûya	weyê veneşartıbûya

Çirokiya dema bêya hevedudani ya lêkera zani, kari, wêri bı vi

Institut kurde de Paris

ewayi ji tê bıkaranin:

Mınê bızanıbûya, mınê bıkanbûya, mınê bıwênbûya
Teyê bızanıbûya, teyê bıkanbûya, teyê bıwênbûya
Wêyê bızanıbûya, wiyê bıkanbûya, wêyê bıwênbûya

Balakêş: Mınê xwanba, teyê şandıba, weyê guhertıbûwa, meyê guhastıbûwa ji têne bıkarani.

Balakêş: Gişk rawe yani raweyên pêşkeri, şertiyên pêşkeri, raweyên daxwazi dıgel hemi çirokiyan bı 39 (sıh û neh) celeban hatın kşandın. Pzo gelek kêşanên hınde lêkeran hene ku bı serê xwe kêşan dıxwıyên ji lê jı ali mınve heya iro guhertınek gring ne hate ditın. Jıber vê yekê li dawiya kêşanên peywendên wan hatın vekıtandın.

Institut kurde de Paris

WANE XXIII

ŞERTİYÊN PÊŞKERİ, RAWEYA ŞERTİYÊN PÊŞKERİ

143. Şertiyên pêşkeri: Gava bûyin yanji krın, bı şertanve hate grê dan, jêra şerti û gava raweyên pêşkeri bıkevıne şertan, şertiyên pêşkeri têne gotın. Jıber vê yekê jı vê kêşanêra, raweya şertiyên pêşkeri yan ji şertiyên pêşkeri tê gotın.

Dı zmanê meda du celeb şerti hene:

Şertên raweyên peşkeri

Şertên raweyên daxwazi (şert-daxwaz)

Şertên raweyên daxwazi dê lı daneka wanda bête dabaş krın. Emê dabaşê binın lı ser şertên raweyên pêşkeri.

ŞERTÊN RAWEYÊN PÊŞKERİ

144. Şertên raweyên pêşkeri: Raweyên pêşkeri gorê dem û kesan têne kêşa, daçekek jı daçekên şerti (er, wer, ger, eger, heke, heker, heger, ku) lı pêşi lêkeran heta lı pêşi kırdan eda tê danin û raweyên pêşkeri dızıvırine raweyên şertiyên pêşkeri. Mina: Eger mın kır, heke te xwend, ku wan pırtûk nvisand, ger tu nexwini dê bımini.

Institut kurde de Paris

145. ŞERTÊ DEMA BORİYA TÊDAYİ:

Eger ez bezim,	heke te çêkır
Er tu beziy	wer te çênekır
Ku em bezin	er wê çêkır
Heker ez ne bezim	ku wi çênekır

146. ŞERTÊ ÇİROKİYA DEMA BORİYA TÊDAYİ:

Ger ez bezibûm	ger me çêkınbû
Wer tu bezibûy	wer we çêkınbû
Er ew bezibûn	heke mın çêkınbû
Ku tu ne bezibûy	heger te çênekınbû

147. ŞERTÊ DEMA BORİYA DÛDAR:

Eger ez bezime	heke te çêkınye
Heker em bezine	eger we çêkınye
Heke ew beziye	ku wê çêkınye
Heke ew ne bezine	eger wan çênekınye

148. ŞERTÊ ÇİROKİYA DEMA BORİYA DÛDAR:

Heke ez bezibûme	ku me çêkınbûye
Eger tu bezibûyi	eger we çêkınbûye
Heke ew bezibûye	eger wan çêkınbûye
Eger tu ne bezibûyi	heke te çênekınbûye

149. ŞERTÊ DEMA NHO Û FREH:

Eger ez dıbezım	heke tu çêdıki
Heke tu dıbeziy	eger hûn çêdıkın
Eger ew dıbezın	eger ew çêdıke
Heke ez nabezım	er hûn çênakın

Heke hate mlê mın, dê tu bıbıhizi dengê mın (gotın)

Institut Kurde de Paris

150. ŞERTÊ ÇİROKİYA DEMA NHO Û FREH:

Heke ez dıbezima — heke mın çêdıkır
Heke tu dıbcziya — eger te çedıkır
Er ew dıbezina — er hûn dıbezina
Eger em ne dıbezina — eger we çênedıkır

151. ŞERTÊ ÇİROKİYA DEMA NHO Û FREHA HEVEDUDANİ: (LÊKERA ZANİ, KARİ, VÊ YA, WÊRİ)

Heke mın dıkaribû — eger te dıvêyabû
Eger we dıkaribû — heke wan dıvêyabû
Ger me dıwêribû — eger we dızanibû
Heke mın ne dızanibû — heke we ne dızanıbû

Ger bı kuştın wer bı hıştın emr û fermane teye (Melayê Cziri)
Heke heye naqedinım, vi pilonê reş neqetinım (gotın)
Qiza Beko got: Dıvê tu bı mın di soz û bextê mêrane.
Eger Xwedê kır mrazê te bı Zina zêdane.
Tuyê destê mın bıgırı, bıbi bajarê mıxrıbyane.
Eger Zin serdılıka teye, wê bı mınve bıbın dıduyane. (Memê Alan)

152. ŞERTÊ DEMA BÊ:

Eger ezê bıbezım — eger ezê çêkım
Heke tuyê bıbezi — heke tuyê çêki
Eger ewê bıbeze — eger ewê çêneke
Heke emê ne bezın — heke emê çênekın

153. ŞERTÊ ÇİROKİYA DEMA BÊ:

Heke ezê bıbezima — ege mınê çêkıra
Heke tuyê bıbeziya — ku teyê çêkıra
Eger ewê bıbeziya — eger wêyê çêkıra
Heke ezê nebezima — heke wiyê çênekıra

154. ŞERTÊ DEMA BÊYA HEVE DUDANİ:

Eger ezê bezibım — eger mınê çêkınbe
Heger tuyê bezibi — heke dê we çêkınbe
Ku dê ew bezibın — ku wanê çêkınbe
Ku ezê ne bezibım — ku dê we çênekınbe

155. ŞERTÊ ÇİROKİYA DEMA BÊYA HEVE DUDANİ:

Ger dê ez bezibûma — ger dê me çekınbûya
Ger ewê bezibûya — ger weyê çêkınbûya
Heke ewê bezibûna — ku wiyê çêkırıbûya
Ku ezê ne bezibûma — ku dê wan çênekınbûya

Ger bızanım wez dı heşrêda nebinım dılberê
Cennetê dê jê çıkım pê wer bıkım xakûsterê.
　Ger wi bı vi rengi Mem rha kır
　Derdêd dlê me wi dewa kır
Wer mayi mısır lı ser inadê
Em dê bıgırın wereng çêhdê
　Ger dê wi nezer bıda me careк
　İksirê teweccuha mubarek (Ehemedê xani)
Eger koledaran xwina gelên belengaz ne mêtına, dê çawan zengin bıbûna?

Dıvê bête zanin ku dı hınde ciyanda, hınde hoker ji mina daçekên şerti têne bıkaranin û bersıv ji dıxwazın lê ne şertine:

Dema tu hati, wê ji bine. Ciyê axa hebe ez naçımê.

Hıngi gelê Kurd negıhije mafê xwe, dê têkoşina wi bıdomine.

Kengi tu hati ezê vê pırtûka hêjay bıdım te

Balakêş: Jıbo zêde ci ne gırtınê, şertiyên pêşkeri bı sê kesan û bı kesek ji neyini û bı du lêkeran hatın kşandın. Bı fermo hûn gişk lêkeran bı herşeş kesan bıkışının.

WANE XXIV

DI LÊKERANDA RAWE

156. Raweyên daxwazi: Raweyên daxwazi bûyinê, kirinê, ji demê gringtır bı daxwazê dınımının. Herçıqas ne gring be ji disa bı ewayek dem têda heye.

Raweyên daxwazi pêncın:

Fermani
Xwestıni
Blani
Vêni
Şert-daxwaz

Fermani, çawan dı mjara fermanêda ji dê bête dabaş krın ku jı-qurmê lêkera fermanê tê kêşan û jı dema bê ji ne tenhaye. Jıbo vê yekê lı ser wê sekınine naxwaze.

Jı bıl fermaniyê, heryek jı raweyên daxwazi (xwestini, blani, vêni, şert, daxwaz) du celebın:

Daxwazi
Daxwaziyên hevedudani

Jı daxwaziyên rûtra daxwazi, jı daxwaziyên hevedudanira daxwaziyên hevedudani tê gotın û gişk xwedi çirokine ji.

157. Daxwaziyên rût: Jı qurmê lekera fermanê pêktên û jı dema

Institut kurde de Paris

bê ji têne hejmartın. Şxwe edaya wan jı dema bê ewe ku daçeka dema bê (ê, wê, dê tê) negırın.

Xwestıni	Blani	Vêni	Şert-daxwaz
Bıbırım	bla bıbırım	dıvê bıbırım	heke bıbırım
Bıbırıt	bla bıbırıt	dıvê bıbırıt	heke bıbırıt

Çawan lı jorin ji dıxwıyê ku xwestıni bê daçekeke. Blani, vêni û şert-daxwazê ji heryek daçeka xwe (bla, dıvê, heke) gırtıne.

158. Daxwaziyên hevedudani: Ev kêşan jı qurmê lêkerê û jı lêkera "bû be" pêktên û jı dema bori têne hejmartın. Şxwe edaya wan jı dema bori, ewe ku lêkera "bû, be" dıgırın:

Xwestın	Blani	Vêni	Şert-daxwaz
Mın bribe	bla mın bribe	dıvê mın bribe	heke te bribe
Te bribe	bla te bribe	dıvê te bribe	ku te bribe

Wsan xwiya ku xwestıni bê daçeke. Blani, vêni û şert-daxwaz, heryek daçeka xwe û gişkan ji lêkera "be" gırtıne.

Balakêş: Lêkera dema bê, lêkera xwestıni, lêkara blani, lêkera vêni û lêkera şert-daxwaz, dıgel hevedudani û çirokiyên xwe gişk jı hêmanên hev têne kêşan. Pzo xwestıni jı bê daçekiya xwe û ewên dın ji heryek bı daçeka xwe jı hev eda dıbın û têne nasin. Dıvê nvisvan û xwendekar jı van hajdar bıbın ku neyêne tevlêhev krın:

Ezê	bınıvisım	dema bê
Ez	bınıvisım	xwestıni
Bla ez	bınıvisım	blani
Dıvê ez	bınıvisım	vêni
Ger ez	bınıvisım	şert-daxwaz
Mın dê	bınıvisiya	Çirokiya dema bê
Mın	bınıvisiya	çirokiya xwestıni
Bla mın	bınıvisiya	çirokiya blani
Dıvê te	bınıvisiya	çirokiya vêni
Eger te	bınıvisiya	çirokiya şert-daxwaz
Mınê	nvisibe	dema bêya hevedudani
Mın	nvisibe	xwestıniya hevedudani
Bla te	nvisibe	blaniya hevedudani
Dıvê te	nvisibe	vêniya havedudani

Ku me	nvisibe	şert-daxwaza hevedudani
Mınê	nvisibûya	çirokiya hevedudaniya dema bê
Me	nvisibûya	çirokiya hevedudaniya xwestıni
Bla te	nvisibûya	çirokiya hevedudaniya blani
Dıvê wi	nvisibûya	çirokiya hevedudaniya vêni
Eger wê	nvisibûya	çirokiya hevedudaniya şert-daxwaz

Bı vê rewşê hemi lêkerên zmanê me têne kêşan. Danina daçekan ji peywıstiye. Dıvê bête zanin ku ewên jı hêmana zmanê Kurdi tam agahdar nebın van herpênc lêkeran, tevlıhev dıkın û jı bın dernakevın.

FERMANİ
RAWEYA FERMANİ

159. Raweya fermani: Jıber ku bûyin yan ji krın bı fermanê pêktê, jêra fermani tê gotın. Weki: Rındbe, qencbe, bıkır. Bıfıroş.

Dı vê kêşanêda dem ne gringe. Ya gring têgıhe. Dı zamê Kurdida ferman, teni jıbo yakani û praniya dudane. Daçeka fermani "bı" ye. Ev daçek lı pêşi bı lêkerve tê danin.

Çawan dı mjara pêkhatına qurmê lêkeranda (lı mjara III an bınêrın) hatıbû ditın ku daçeka fermanê, dı lêkerên xwerûda weki xwarın bıxwe, frotın bıfıroş peywıstıye. Dı lêkerên arikerda weki ava krın ava ke ava bıke û lêkerên çêkırida weki xemılandın xemılin bıxemılin kêfiye. Dı lêkerên daçek da weki vexwarın vexwe û jı lêkerên kêm ji here, were bı vebır nayê bıkaranin.

Daçeka fermani ya neyini "me" ye. "Me" ya daçeka neyini bı ya daçeka erêni têxe û ciyê wê dıgıre. Dı gişk lêkeranda tê bıkaranin. Dı lêkerên hevedudaniyên daçekida, "me" ya daçek dıkeve navber pêşlêker û lêker gişk peve dızelıqın. Dı lêkerên dında, dıkeve pêşi û bı lêkeranve dızelıqe.

Dı hınde herêmê Kurdıstanêda, lı ciye "me" ya daçek "ne" bıkartinın lê ev çewte gelek bête şemırandın:

Nedervazi	**Dervazi**
Bıkev bıbez	bıçin çêke
Bıkevın bıbezın	bıçinın çêkın

Institut kurde de Paris

Neyini

Mekev mebez	meçin çêmeke
Mekevın mebezın	meçinın çêmekın

Jıbo nermayi û domina fermanê ya yakani, "e" yek lı dawiyê bı lêkerve tê danin:

Bıkeve bıbeze	bıçine çêke
Mekeve mebeze	meçine çêmeke

Balakêş: Eger qurmê lêkerê tipek teni be, "e" yek pêve danin çêtıre û êdi "e" yek dın naxwaze. Weki: Kırın "k" bıke. Çêkırın ji jı vê beşêye.

Balakêş: Gava "bı" ya daçeka fermanê, lı pêşi lêkera kêm "here" bête danin, têgıha wê dıguhere. Weki: Bıhere, yani vê tıştê bıhere, bıbe.

- -

Megır, ku te gırt bermede, ku te berda lı pê meçe (Gotına mezınan)

Karker û gelên bındest bıbın yek. (Lenin)

Gelên bındest! berê xwe bıdın xwinmıj û koledaran û bızanın ku gel û karkerên netewê serdest brayên wene.

XWESTINİ

Raweya xwestıni

160. Raweya xwestıni: Jıber ku bûyin yan ji kırın bı xwestınê pêktê, jêra raweya xwestıni tê gotın.

Ev kêşan, heke jı çêbûna xwe, heke jı têgıha xwe dı nav dema bêda tê dilın û xwestınê ifade dıke. Cama daçekên sedemi (da, ku) eda têne pêşi lêkera xwestıni têgıha wê zelalır dıke. Mina: Şûr kêşa da lêxe, Reşo tvıng bır ku axê bıkuje. Yani sedem Lêxıstınê şur kêşa û sedem kuştınê tvıng bır. Dıvê qenc bête zanin, ev "ku" ne şertiye, ne cinavke û ne ji grêke. Jı vê "ku" yêra "ku" ya sedemi tê gotın.

Raweya xwestıni jı qurmê lêkera fermanê tê kêşan. Dı lêkerên xwerûda, "bı" ya daçeka fermanê lı ciyê xwe dımine û dı gişk kêşananda qertaf cinavk têne danin. Gava kırde ne cinavk be, dı

Institut kurde de Paris

yekaniya sısêyanda bı lêkerve danina "t" yek çêtıre. Mina: Rabıt, bıbêjıt. Vi ewayi qenctır, xwestiniya sısêyan jı fermaniya dudan tê qetandın. Cama "t" dıbe "tın" ji. Mina: Bırevıtın, bıçıtın, rabıtın:

Nedervazi	
Ez bıkevım	ez bıbezım
Tu bıkevi	tu bıbezi
Ew bıkeve	ew bıbeze
Em bıkevın	em bıbezın
Hûn bıkevın	hûn bıbezın
Ew bıkevın	ew bıbezın
Dervazi	
Ez bıçinım	ez çêkım
Tu bıçini	tu çêki
Ew bıçine	ew çêke
Em bıçinın	em çêkın
Hûn bıçinın	hûn çêkın
Ew bıçinın	ew çêkın
Neyini	
Ez nerevinım	ez ranekevım
Tu nekeni	tu wemegıri

Gava ku dema me ji wek te hat
Em dest bıdın hev bı kar û xebat
Serê te ji wek serê xwedi mel
Jı hev belav bıkın tev bıkın qenal (Cigerxwin)
Dest davêje mawizerê ku lı wi bıxe (Rabûn)
Em dbıstanan bıxwinın kar û pişık hin bıbın
Bax û bostanan bıçinın çiçek û gul şin bıbın (Cigerxwin)
Em bı ser dıjmın wek pêt û brûskan bırıjın
Gerçı em dê bêne kuştın wi dıgel xwe bıkujın (Cigerxwin)

ÇİROKİYA XWESTİNİ

161. Çirokiya xwestıni: Jıber ku bı çiroki dabaş jı xwestınê tê krın. Jêra çirokiya xwestıni tê gotın.

Institut kurde de Paris

Jı qurmê lêkerê tê kêşan. "bı" ya daçeka fermanê lı ciyê xwe dımine. Lı dawiya kêşananve "a" ya çiroki tê danin.

Dı lêkerên nedervazida qertafcinavk û lı navber du dengdêran "y" ya kelıjandınê neyê jı bir krın:

Nedervazi

Ez bıketıma	ez bıbezima
Tu bıketaya	tu bıbeziya
Ew bıketa	ew bıbeziya
Em bıketına	em bıbezina
Hûn bıketına	hûn bıbezina
Ew bıketına	ew bıbezina

Dervazi

Mın bıçanda	mın çêkıra
Te bıçanda	te çêkıra
Wi bıçanda	wê çêkıra
Me bıçanda	me çêkıra
We bıçanda	we çêkıra
Wan bıçanda	wan çêkıra
Neyini	
Me negırwaya	me hılnekıra
We neşemıranda	we venexwara

Balakêş: Têgıha çirokiyê dı çirokiyên raweyên pêşkerida hatıbûn vekıtandın. Êdi dı vanda em ser nasekının.

Xwezya ku lı mın xezeb kıra mir
Manendê Memê bı qeyd û zencir
    Ez ji bışıhandıma wê çalê
    Rojek veketa lı mın jı salê
Carek bıdiya mın ew grıftar
Derman bıkıra mın ew brindar
    Emrê mın eger çı yek remeq bû
    Heqa ku mnn jı bo me heq bû   **(Ehmedê Xani)**

Institut kurde de Paris

XWESTINİYA HEVEDUDANİ

162. Xwestıniya hevedudani: Jıber ku bûyin yan ji kırın bı xwestınê tê nişan dan "xwestıni" û jı du lêkeran pêktê hevedudaniye ji. Jıbo vê yekê jêra xwestıniya hevedudani tê gotın.

Çawan xwestıni dı nav dema bêda tê ditın, xwestıniya hevedudani ji heke bı têgıha xwe û heke çêbûna xwe dı nav dema borida dıxwıyê.

Jı qurmê lêkerê û jı lêkera "bû, be" pêktê. Lêkera "be" herweki qertafeki edeti lı dawi bı lêkerve tê danin.

Dı lêkerên nedervazida qertafcinavk lı ciyê xwe radıwestın:

Nedervazi	
Ez ketıbım	ez bezibım
Tu ketıbi	tu bezibi
Ew ketıbe	ew bezibe
Em ketıbın	em bizibın
Hûn ketıbın	hûn bezibın
Ew ketıbın	ew bezibın
Dervazi	
Mın çandıbe	mın çêkırıbe
Te çandıbe	te çêkırıbe
Wê çandıbe	wi çêkırıbe
Me çandıbe	me çêkırıbe
We çandıbe	we çêkırıbe
Wan çandıbe	wan çêkırıbe
Neyini	
Te ne xwestıbe	te hılnedabe
We ne guherandıbe	te ranehejandıbe

Xwestıniya hevedudani ya lêkera zani, kari û wêri, bı vi ewayi ji tê bıkaranin:

Ez bızanıbım	tu bızanıbi	ew bızanıbe
Ez bıwêrıbım	tu bıwêrıbi	ew bıwêrıbe
Em bıkarıbın	hûn bıkarıbın	ew bıkarıbın

Zanıbe bawer bıke mılet jı dıjmın meztıre (Cigerxwin)

Institut kurde de Paris

ÇİROKİYA XWESTINİYA HEVEDUDANİ

163. Çirokiya xwestıniya hevedudani: Jıber ku xwestıniya hevedudani bı çiroki tê dabaş kırın, jêra çirokiya xwestıniya hevedudani tê gotın. Jı xwestıniya hevedudani guherti, "a" ya çiroki lı dawi lêkeran tê zêde kırın û lêkera "be" ji dıbe "bû". Mina" Ez xemılibûma, tu veşıribûya:

Nedervazi	
Ez ketıbûma	tu bezibûya
Tu ketıbûya	ez bezibûma
Ew ketıbûya	ew bezibûya
Em ketıbûna	em bezibûna
Hûn ketıbûna	hûn bezibûna
Ew ketıbûna	ew bezibûna
Dervazi	
Mın çandıbûya	mın çêkırıbûya
Te çandıbûya	te çêkırıbûya
Wi çandıbûya	wê çekırıbûya
Me çandıbûya	me çêkırıbûya
Neyini	
We ne kelıjandıbûya	wan veneçerıxandıbûya

164. Ev herdu kêşan (xwestıniya hevedudani û çirokiya wê) hındık têne bıkaranin. Gava têne bıkaranin ji herweki ku têgıha şert-daxwaz dıdın. Geleke bête zanin ku peywendiya xwestıni bı şert-daxwazra tune. Lewra bê daçek, şert-daxwaz nayê hzırin û nabeji.

Balakêş: Mın hejandıba, mın hejandıbûwa, mın razandıba û mın razandıbûwa ji têne xebıtantın.

WANE XXV

RAWEYA BLANİ

Blani, xwestına blani, fermana blani

165. Raweya blani: Ev rawe ji mina raweya xwestıni jı dema bê tê hejmartın.

Jıber ku bûyin yanji krın bı daçeka "bla" pêktê jêra blani tê gotın. Têgıha wê dı navber xwestın û fermanêdaye. Yani fermanek xwestıni yan ji xwestınek fermaniye. Wekok: Bla Reşo mir bıqute, bla Qerwaş xema xatûna xwe meke, bla tu bıçi şerê koledaran, bla ez bıçmê...

Jı qurmê lekera fermanê û daçeka "bra, bera, bere, bla" pêktê. Yek jı van daçekan lı pêşi lêker heta lı pêşi kırde eda tê danin û "bı" ya daçeka fermanê lı ciyê xwe dımine. Dı hemi kêşananda qertafcinavk têne danin:

Nedervazi

Bla ez bıkevım	bla ez bıbezım
Bla tu bıkevi	bla tu bıbezi
Bla ew bıkeve	bla ew bıbeze
Bla em bıkevın	bla em bıbezın
Bla hûn bıkevın	bla hûn bıbezın
Bla ew bıkevın	bla ew bıbezın

Dervazi

Bla ez bıçinım	bla ez çêkım
Bla tû bıçini	bla tu çêki
Bla ew bıçine	bla ew çêke
Bla em bıçinın	bla em çêkın
Bla hûn bıçinın	bla hûn çêkın
Bla ew bıçinın	bla ew çêkın

Neyini

Bla em neçının	bla em veneçının
Bla ew nekın	bla hûn venekın

Balakêş: Yekaniya sısêyan: Bla rındbıt,bla rakevıt, bla binıt, bla bıxwıt bête bıkaranin çêtıre.

Bla bıt saimê dehrê, bla iftari carek bıt (M. Cziri)

ÇİROKİYA BLANİ

166. Çirokiya blani: Jıber ku blani bı çiroki tê dabaş krın, jêra çirokiya blani tê gotın. Şxwe dı blanida têgıha wê hatbû vekıtandın. Ev ji çirokiya wêye.

Jı qurmê lêkerê tê kêşan û "bı" ya daçeka fermanê lı ciyê xwe dıminc. Lı dawiya lêkerve "a" ya çiroki tê zelıqandın, daçekek jı daçekên blani (bla, bra, bera, bere) eda lı pêşi lêker heta lı pêşi kırde tê danin. Bı dawiya lêkerên nedervazive qertıfandına qertafcinavkan dıxwaze û tipên kelıjandınê ji neyên jı bir krın:

Nedervazi

Bla ez bıketıma	bla ez bıbezima
Bla tu bı ketıya	bla tu bıbeziya
Bla ew bıketa	bla ew bıbeziya
Bla em bıketına	bla em bıbezina
Bla hûn bıketına	bla hûn bıbezina
Bla ew bıketına	bla ew bıbezina

Dervazi

Bla mın bıçanda	bla mın çêkıra
Bla te bıçanda	bla te çêkıra

Institut kurde de Paris

Bla wê bıçanda	bla wi çêkıra
Bla me bıçanda	bla me çêkıra
Bla we bıçanda	bla we çêkıra
Bla wan bıçanda	bla wan çêkıra
Neyini	
Bla te netewızanda	bla te veneqetanda
Bla te neşêlanda	bla tu ranekelıya

Balakêş: Gava bla me bıçandına, bla we bıçandına, bla wan bıçandına bête bıkaranin, serve praniye. Yani me zevi bıçandına. Zevi jı yeki pırtıre.

- -

Bla jê bıhata bla sıfte serê mın bışkinanda. (Gotına mezınan)
Bla bıxwenda paşi bıgota

BLANİYA HEVEDUDANİ

167. Blaniya hevedudani: Jıber ku jı daçeka bla û jı du lêkeran pêktê, jêra blaniya hevedudani tê gotın.

Çawan blani dı nav dema bêda, blaniya hevedudani ji dı nav dema borida tê ditın lê têgıha wan nizıkê hevın. şxwe hınde herêm dı ciyên hevda bıkartinın.

Jı qurmê lêkerê û jı lêkera "bû, be" pêktê. Lêkera "be" herweki qertafek lı dawi bı lêkerve tê zelıqandın. "bla" ya daçek ji lı pêşi lêker heta lı pêşi kırde eda tê danin. Dı lêkerên nedervazida, qertafcinavk bı lêkera "be" ve têne qertıfandın:

Nedervazi	
Bla ez ketıbım	bla ez bezibım
Bla tu ketıbi	bla tu bezibi
Bla ew ketıbe	bla ew bezibe
Bla em ketıbın	bla em bezibın
Bla hûn ketıbın	bla hûn bezibın
Bla ew ketıbın	bla ew bezibın
Dervazi	
Bla mın çandıbe	bla mın çêkırıbe
Bla te çandıbe	bla te çêkırıbe

Bla wê çandıbe	bla wi çêkırıbe
Bla me çandıbe	bla me çêkırıbe
Bla we çandıbe	bla we çêkırıbe
Bla wan çandıbe	bla wan çêkırıbe
Neyini	
Bala wan ne reşandıbe	bla wan venereşandıbe
Bla we ne gerandıbe	bla we venegerandıbe

Blaniya hevedudaniya lêkera zani, kari û wêri bı vê rewşê ji tê **bıkaranin**:

Bla ez bıkarıbım bla tu bıkarıbi bla ew bıkarıbe
Bla ez bızanıbım bla tu bızanıbi bla ew bızanıbe
Bla em bızanıbın bla hûn bızanıbın bla ew bızanıbın
Bla ez bıwêrıbım bla tu bıwêrıbi bla ew bıwerıbe

Bla mêbe şir qısmete
Bla şandıbe, bla hındıkbe (Gotın)

ÇİROKİYA BLANİYA HEVEDUDANİ

168. Çirokiya blaniya hevedudani: Jıber ku blaniya hevedudani, bı çiroki tê dabaş kırın jêra çirokiya blaniya hevedudani tê gotın.

Pêkhatına vê kêşanê jı blaniya hevedudani guhertı, "a" ya çiroki bı dawiya kêşananêve tê danin û "be" ya lêkerji dıbe "bû". Mina: Bla drûbûya, bla revibûya, bla dadabûya:

Nedervazi	
Bla ez ketıbûma	bla ez bezibûma
Bla tu ketıbûya	bla tu bezibûya
Bala ew ketıbûya	bla ew bezibûya
Bla ew ketıbûna	bla ew bezibûna
Bla hûn ketıbûna	bla hûn bezibûna
Bla ew ketıbûna	bla ew bezibûna
Dervazi	
Bla mın çandıbûya	bla mın çêkırıbûya
Bla te çandıbûya	bla te çêkırıbûya
Bla wi çandıbûya	bla wê çêkırıbûya

Institut kurde de Paris

Bla me çandıbûya	bla me çêkırıbûya
Bla we çandıbûya	bla we çêkırıbûya
Bla wan çandıbûya	bla wan çêkırıbûya

Neyini

Bla te ne dabûya	bla te venedabûya
Bla me ne qetandıbûya	bla me raneqetandıbûya
Bla we ne kırıbûya	bla we ranekırıbûya

Çirokiya blaniya hevedudani ya lêkera zani, kari û wêri bı vi ewayi ji tê kêşan:

Bla mın bızanibûya	bla te bızanibûya
Bla me bıkaribûya	bla we bıkaribûya
Bla wê bıwêribûya	bla wi bıwêribûya

Ev qayde jıbo xwestıni, vêni û şert-daxwaz ji dıbe:

Mın bızanibûya	te bızanibûya
Dıvê me bızanibûya	dıvê we bızanibûya
Eger wi bızanibûya	eger wê bıwêribûya

Balakêş: Bla kolaba, bla kolabûwa, bla bızanıba, bla bızanıbûwa ji têne bıkaranın û neyiniya wan ji wsan.

Institut kurde de Paris

WANE XXVI

RAWEYA VÊNİ

Luzomi, peywıstı, bıvênevi

169. Raweya vêni: Jıber ku bûyin yan ji kırın bı bıvênevi û bı luzomiyê pêktê jêra raweya vêni tê gotın û têgıha bıvêneviyê, peywıstiyê dıde. Wekok: Dıvê tu bıçi dbıstanê, dıvê tu pırtûkan pır bıxwini û dıvê tu waneyê xwe qenc bızani. Yani çûyina te ya dbıstanê, pır pırtûk xwendına te û zanina te ya waneyan peywıstiye.

Dem û pêkhatına vê rawê mina raweya blaniye (lı mjara 165 an bınêrın) teni dı ciyê "bla" ya daçekda "gereke, geleke, goti û dıvê" yek jı van daçekên vêni têne danin û têgıha vêni dıdın:

Nedervazi	
Dıvê ez bıkevım	dıvê ez bıbezım
Dıvê tu bıkevi	dıvê tu bıbezi
Dıvê ew bıkeve	dıvê ew bıbeze
Dıvê em bıbezın	dıvê em bıkevın
Dıvê hûn bıkevın	dıvê hûn bıbezın
Dıvê ew bıkevın	dıvê ew bıbezın
Dervazi	
Dıvê ez bıçinım	dıvê tû çêki
Dıvê tu bıçini	dıvê ez çêkım

Institut kurde de Paris

Dıvê em bıçinın	dıvê em çêkın
Dıvê hûn bıçinın	dıvê hûn çêkın
Dıvê ew bıçinın	dıvê ew çêkın
Dıvê ew bıçine	dıvê ew çêke
Neyini	
Dıvê ez neqewırinım	dıvê ez raneqewırinım
Dıvê tu newesti	dıvê tu ranewesti
Dıvê ew neseknne	dıvê ew veneseknne

ÇİROKİYA VÊNİ

170. Çirokiya vêni: Jıber ku vêni bı çiroki tê dabaş kırın, jêra çirokiya vêni tê gotın.

Mina çirokiya blani pêktê (lı mjara 166 an bınêrın). Teni daçekek jı daçekên vêni (gereke, geleke, goti, dıvê) dı ciyê "bla" da tê danin:

Nedervazi	
Dıvê ez bıketıma	dıvê ez bıbezima
Dıvê tu bıketiya	dıvê tu bıbeziya
Dıvê ew bıketa	dıvê ew bıbeziya
Dıvê em bıketına	dıvê em bıbezina
Dıvê hûn bıketına	dıvê hûn bıbezina
Dıvê ew bıketına	dıvê ew bıbezina
Dervazi	
Dıvê mın bıçanda	dıvê te çêkıra
Dıvê te bıçanda	dıvê mın çêkıra
Dıvê wê bıçanda	dıvê wi çêkıra
Dıvê me bıçanda	dıvê me çêkıre
Dıvê we bıçanda	dıvê we çêkıra
Dıvê wan bıçanda	dıvê wan çêkıra
Neyini	
Dıvê wê nekıra	dıvê wi ranekıra
Dıvê ew nebûna	dıvê ew venebûna
Dıvê ew neketa	dıvê ew veneketa

Balakêş: Herçıqas vin, vên, vêyan û gotın raderın ji û lêker ji jı-

Institut kurde de Paris

wan têne kşandın lê dı vır da bı daçeki têne bıkaranin. Heta bı vi rengi bêne bıkaranin daçekın.

VÊNİYA HEVEDUDANİ

171. Vêniya hevedudani: Jıber ku vêni bı du lêkeran pêktê, jêra vêniya hevedudani tê gotın.

Dem û pêkhatına vê rawê mina blaniya hevedudaniye. Teni dı ciyê "bla" da, yek jı daçekên vêni tê danin û têgıha vêni dıde:

Nedervazi

Goti ez ketıbım	goti ez bezibım
Dıvê tu ketıbi	dıvê tu bezibi
Goti ew ketıbe	goti ew bezibe
Goti em ketıbın	goti em bezibın
Dıvê hûn ketıbın	dıvê hûn bezibın
Goti ew ketıbın	goti ew bezibın

Dervazi

Gereke mın çandıbe	gereke mın çêkıribe
Geleke te çandıbe	gelek te çêkıribe
Geleke wê çandıbe	geleke wi çêkıribe
Gereke me çandıbe	gereke me çêkıribe
Gereke we çandıbe	gereke we çêkıribe
Geleke wan çandıbe	geleke wan çêkıribe

Neyini

Goti tu ne şemıtibi	goti tu veneşemıtibi
Geleke ew ne beyibe	geleke ew venebeyibe

Vêniya hevedudaniya lêkera zani, kari, wêri wlo ji dıbe:

Dıvê tu bızanıbi, dıvê tu bıkaribi, dıvê tu bıwêribi

ÇİROKİYA VÊNİYA HEVEDUDANİ

172. Çirokiya vêniya hevedudani: Jıber ku vêniya hevedudani bı çiroki dabaş jê tê kırın, jêra çirokiya vêniya hevedudani tê gotın. Mina çirokiya blaniya hevedudani pêktê. Teni daçekek jı daçekên vêni dı ciyê "bla" da tê danin û têgıha vêni dınımine:

Institut kurde de Paris

Nedervazi

Dıvê ez ketıbûma — geleke ez bezibûma
Goti tu ketıbûya — gelcke tu bezibûya
Gercke ew katıbûya — gelekc ew bezibûya
Gelcke em ketıbûna — dıvê hûn bezi bûna
Dıvê ew ketıbûna — dıvê ew bezibûna

Dervazi

Gercke mın çandıbûya — gelckc mın çêkırıbûya
Gercke te çandıbûya — gercke te çêkırıbûya
Gelcke wê çandıbûya — gelcke wi çêkırıbûya
Gercke me çandıbûya — gercke me çêkırıbûya
Gelcke we çandıbûya — gelcke we çêkırıbûya
Goti wan çandıbûya — goti wan çêkırıbûya

Neyini

Goti te ne jendıbûya — dıvê te venejendıbûya
Goti me ne kuştıbûya — goti me venekuştıbûya
Dıvê we ne kêşabûya — dıvê we venekêşabûya

Gercke tu çûbuya arikariya gel û karkeran.
Ey dost bı dıl be yarê qencan
Ya qenc bıbe neyarê qencan
Ew qencın ew qenciyê dızanın
Ew xeyrê qenciyê tu nızanın
Hındê ku bı wan bıki cefayê
Ew dê bıgırın bı dıl wefayê
Zınhar mebe muhubê xıraban
nedost ne dıjmınê kulaban
ger dostbi dê bıkın te murdar
wer dıjmıni dê bık.n bırindar (Ehmedê Xani)

WANE XXVII

ŞERT-DAXWAZ

Raweya şert-daxwaz, raweya şertê daxwazi

173. Raweya şert-daxwaz: Jıber ku Bûyin yanji kirin bı şertanve tê grêdan û jı hêmana daxwazê ji tê hmatê, jêra şert-daxwaz tê gotın.

Hevokek şert-daxwazi: Eger koledar bêne qewırandın dê gel rızgar bıbe, hekeme tentêl naguhere. Jı vê hevokê hate zanin, rızgariya gel bı şertê qewırandına koledarve û ne guhertın ji bı mayina wanve hatiye grê dan.

Guhertına şert-daxwazê jı şertiyên pêşkeri ewe ku jı hêmana daxwazê pêktê. (lı mjara 144 an bınêrın)

Dem û pêkhatına vê rewê mina raweya blaniye. (Lı mjara 165 an bınêrın) Teni dı ciyê "bla" ya daçekda, daçekek jı daçekên şerti (er, wer, ger, eger, heke, heker û ku) tê danin û têgaha şert-daxwazê pêktê:

Nedervazi

Eger ez bıkevım	eger ez bıbezım
Wer tu bıkevi	wer tu bıbezi
Heke ew bıkeve	heke ew bıbeze
Er em bıkevın	er em bıbezın
Ger ew bıkevın	ger ew bıbezın

Institut kurde de Paris

Ku hûn bıkevın	ku hûn bıbezın
Dervazi	
Heker ez bıçinım	heker ez çêkım
Heke tu bıçini	heke tu çêki
Ger ew bıçine	ger ew çêke
Eger em bıçinın	eger em çêkın
Er hûn bıçinın	er hûn çêkın
Wer ew bıçinın	wer ew çêkın
Neyini	
Eger ez negıhıjinım	eger ez ranegıhıjinım
Eger tu negıjgıjini	heke tu venegıjgıjini
Wer ew negıre	wer ew venegıre

ÇİROKİYA ŞERT-DAXWAZ

174. Çirokiya şert-daxwaz: Jıber ku şert -daxwaz bı çiroki tê dabaş krın, çirokiya şert-daxwaz tê gotın

Ev çiroki mina çirokiya bilani pêktê (lı 166 an bınêrın). Teni daçekek jı daçekên şerti dı ciyê "bla" da tê danin û têgıha çirokiya şert-daxwaz tê hmatê:

Nedervazi	
Heke ez bıketıma	heke ez bıbezima
Eger tu bıketıya	heke tu bıbeziya
Wer ew bıketa	wer ew bıbeziya
Ger em bıketına	ger em bıbezina
Er hûn bıketına	er hûn bıbezina
Ku ew bıketına	ku ew bıbezina
Dervazi	
Heke mın bıçanda	heke mın çêkıra
Eger te bıçanda	eger te çêkıra
Ger wê bıçanda	ger wi çêkıra
Wer me bıçanda	wer me çêkıra
Er we bıçanda	er we çêkıra
Ku wan bıçanda	ku wan çêkıra
Neyini	
Heke mın nekıra	heke mın ranekıra

Institut kurde de Paris

Eger ew nezabûya	eger ew ranezabûya
Ger te neweşanda	ger te raneweşanda

ŞERT-DAXWAZA HEVEDUDANİ

175. Şert-daxwaza hevedudani: Jıber ku şert-daxwaz jı du lêkeran pêktê, jêra şert-daxwaza hevedudani tê gotın.

Dem û pêkhatına vê, mina blaniya hevedudaniye. (Lı mjara 167 an bınêrın) Teni dı ciyê "bla" da daçekek jı daçekên şerti tê danin û têgıha şert-daxwaza hevedudani pêktê:

Nedervazi	
Heker ez ketıbım	heker ez bezibım
Heke tu ketıbi	heke tu bezibi
Eger ew ketıbe	eger ew bezibe
Ger em ketıbın	ger em bezibın
Er hûn ketıbın	er hûn bezibın
Wer ew ketıbın	wer ew bezibın
Dervazi	
Eger mın çandıbe	eger mın çêkırıbe
Ger te çandıbe	ger te çêkırıbe
Wer wê çandıbe	wer wê çêkırıbe
Heke me çandıbe	heke me çêkırıbe
Heker we çandıbe	heker we çêkırıbe
Ku wan çandıbe	ku wan çêkırıbe
Neyini	
Heke te ne xıstıbe	heke te vênexıstıbe
Eger wê ne jiyandıbe	eger wi venejiyandıbe
Ger ew ne mırıbe	ger ew venemırıbe

ÇİROKİYA ŞERT-DAXWAZA HEVEDUDANİ

176. Çirokiya şert-daxwaza hevedudani: Jıber ku şert-daxwaza hevedudani bı çiroki dabaş jê tê kırın, jêre çirokiya şert-daxwaza hevedudani tê gotın.

Mina çirokiya blaniya hevedudani pêktê. (Lı mjara 168 an bınêrın) Teni daçekek jı daçekên şerti dı ciyê daçeka "bla" da tê da-

nin û têgıha çirokiya şert-daxwaza hevedudani tê hmatê:

Nedervazi	
Heker ez ketıbûma	heker ez bezibûma
Heke tu ketıbûya	heke tu bezibûya
Eger ew ketıbûya	eger ew bezibûya
Ger em ketıbûna	ger em bezibûna
Ku hûn ketıbûna	ku hûn bezibûna
Wer ew ketıbûna	wer ew bezibûna
Dervazi	
Ger mın çandıbûya	ger mın çêkınbûya
Eger te çandıbûya	eger te çêkırıbûya
Heke wê çandıbûya	heke wi çêkınbûya
Wer me çandıbûya	wer me çêkınbûya
Ger we çandıbûya	ger we çêkırıbûya
Er wan çandıbûya	er wan çêkınbûya
Neyini	
Heke te ne rıstıbûya	heke te venerıstıbûya
Eger we ne bıjartıbûya	eger we hılnebıjartıbûya
Ku mın ne krıbûya	ku mın daneckınbûya

Hınde herêmê Kurdıstanê: heke pelıxandıba, heke pelıxandıbûwa, eger razandıba, eger razandıbûwa bıkartinın.

Balakêş: Jıbo bı hêsani hin bûn û ne şaş krına xwendevanan, dı gişk wekokên kêşana lêkeranda. lêkera "ket, bezi, çand û çêkır" hatın bıkaranin. Geleke qenc bête zanin ku çqas lêkerên Kurdi hene gişk bı qayda van herçar lêkeran têne kşandın.

Balakêş: Hevedudani û hevedudaniyên çiroki ya lêkera zani, kari û wêri, kêşana dema bê: Ezê bızanıbım, mınê bızanıbûya, xwestıni: Ez bızanıbım, mın bızanıbûya, blani: Bla ez bızanıbım, bla mın bızanıbûya, vêni: Dıvê ez bızanıbım, dıvê mın bızanibûya û şert-daxwaz: Heke ez bızanıbım, heke mın bızanıbûya, herweki raweyên serbıxwe dıxwıyên ji lê mın edayek gring dı navber van û hevdudani û hevedudaniyên çirokiyên dında ne dit. Sedem vê yekê me lı dawiya hevedudaniya dema bê (141), hevedudaniya çirokiye dema bê (142), lı dawiya xwestıniya hevedudani (162), lı dawiya blaniya hevedudani (167), çırokiya blaniya hevedudani (168) û lı dawiya vêniya hevedudani (171) dabaş kır û êdi lı ser ne sekının.

Institut kurde de Paris

Parçek xwendınê
WELAT

178. Welat erda bav û kalane. Mafê her kesekc ku jı welatê xwe hez bıke, ava bıke û bıparêze. Ewê jı welatê xwe hez neke û neparêze, tu heyinên xwe yên netewi, cvaki û kesi nıkare bıparêze. Berkêşan, mafe, dad, abori û gişk heyinên jı cvatanra dıvên dı nav welêtda pêktên. Hez kırına welêt wekheve welati. Welati brayên hevın û brayên gelên Dnine. Kar û ziyana wan yên hevın.

Kesê jı welatê xwe hez dıke, jı weletiyên xwe ji hezdıke û kesê jı welatiyên xwe hez dıke jı gelên Dni gişk hez dıke.

Hez kırına welêt, yê gel û yê refa serdest ne jı hevın. Refa serdest mina gurên devbıxwin welat û welatiyan talan dıkın, dımıjın û bı hovane mal û emaka wan dıxwın. Tu gavê refa serdest, bratiya gelan naxwaze û napejırinın ji. Refa serdest brayê biyaniyane û dı fermana rısta emperyalist û mjokerandane

Welatê me Kurdıstane, ciyê bav û kalane. Bav û kalên me têda hatıne Dni, jina xwe domandıne û têda mrıne. Jıbo parastına welêt şer kırıne, kuştıne û hatıne kuştın. Axa welêt bı xwina wan hatıye vestırandın û jı mera hatıye pêşkêş kırın. Dıvê em ji welatê xwe bıparêzın, ava bıkın, hım têda rûnın û hım ji welatek ava jı nesla bêra pêşkêş bıkin

Welatê me welatekí freh, mezın pır xweşe. Tevda çiya, deşt, mêrg, zozan, rêl û kanine. Gişk hêjanên sererd û bınerd têda hene. Nemaze tevda gewher û nıfte. Her celebên berkêşanê dıgıhıjine, lê tu lı vê sodretê bınêre ku dı vi welatê dewlemenda, welati bırçi tazi, dil û xzanın. Teni têda axa, şêx, dede, ajan û burjuwayên şolyekbûy têrın. Ev refa bextreş, dıjmınê gel û dı fermane emparyalist-mjokerdanın. Welat dımıjın, dıxwın bı dıjmınan dıdın xwarın. Şxwe gava jı wan tê pırsin "em ne Kurdın" dıbêjın. Pri wan njada xwe dıgıhinın mezınên oli yên Ereban û hnek jı wan ji "Tırkê esil emın, yên dı Anadolêda ne Tırkın" dıbêjın.

Hostayê mezın Cigerxwin, dewlemendiya welêt şerpezeti, bırçiti û belengaziya gelê Kurd dıbine û jı kovana dlê xwe wha dıqire:

Welatê me tev xêr û bêre

Tev medene, tev ziv û zêre
Çı kım iro maye jı xelqêre

Belê hosta rast dıbêje. Pıştê şerê parve krına emperyalistan yê yekem, Kurdıstan destê emperyalist û mjokeran hate belav krın û xıstın çar parçe.

Institut kurde de Paris

Raweyên pêşkeri — Tabloya tevayi

	Boriya têdayi	Boriya dûdar	Nho û freh	Dema bê
	mın zani te zani wê zani me zani we zani wan zani	mın zaniye te zaniye wi zaniye me zaniye we zaniye wan zaniye	ez dızanım tu dızani ew dızane em dızanın hûn dızanın ew dızanın	ezê bızanım tûyê bızani ewê bızane emê bızanın hûnê bızanın ewê bızanın
Neyini	mın ne zani	te ne zaniye	ew nızane	ewê nezane
Şerti	ku mın zani ku me zani	ku te zaniye ku wê zaniye	ku tu dızani ku ew dızanın	ku emê bızanın ku ewê bızanın
				Mınê zanibe teyê zanibe weyê zanibe meyê zanibe weyê zanibe wanê zanibe
Neyini				mınê ne zanibe
Şerti				ku meyê zanibe ku weyê zanibe
			mın dızaniya te dızaniya wê dızaniya me dızaniya we dızaniya wan dızaniya	mınê bızaniya teyê bızaniya wiyê bızaniya meyê bızaniya weyê bızaniya wanê bızaniya
Neyini			te ne dızaniya	meyê nezaniya
Şerti			ku me dızaniya ku we dızaniya	ku weyê bızaniya ku meyê bızaniya
	Mın zanibû te zanibû wê zanibû me zanibû we zanibû wan zanibû	mın zanibûye te zanibûye wi zanibûye me zanibûye we zanibûye wan zanibûye	mın dızanibû te dızanibû wê dızanibû me dızanibû we dızanibû wan dızanibû	Mınê zanibûya teyê zanibûya wiyê zanibûya meyê zanibûya weyê zanibûya wanê zanibûya
Neyini	te ne zanibû	me ne zanibêye	we ne dızanibû	mınê ne zanibûya
Şerti	ku mın zanibû ku te zanibû	ku te zanibûye ku me zanibûye	ku wê dızanibû ku wi dızanibû	ku teyê zanibûya ku meyêzanibêya

Balakêş: Sedem ci teng bûnê, neyini gorê kesek û şertiyên pêşkeri ji gorê du kesen hatın kışandın. Hûn bı her şeş kesan ji bıkışının

Raweyên daxwazi (inşai)

Xwestini	Blani	Vêni	Şert-daxwaz	Fermani
ez bızanım tu bızani ew bızane em bızanın hûn bızanın ew bızanın	bla ez bızanım bla tu bızani bla ew bızane bla em bızanın bla hûn bızanın bla ew bızanın	dıvê ez bızanım dıvê tu bızani dıvê ew bızane dıvê em bızanın dıvê hûn bızanın dıvê ew bızanın	ku ez bızanım ku tu bızani ku ew bızane ku em bızanın ku hûn bızanın ku ew bızanın	bızan bızanın
ez nezanım	bla ez nezanım	dıvê ez nezanım	ku tu nezani	mezan
mın zanibe te zanibe wê zanibe me zanibe we zanibe wan zanibe	bla mın zanibe bla te zanibe bla wi zanibe bla me zanibe bla we zanibe bla wan zanibe	dıvê mın zanibe dıvê te zanibe dıvê wê zanibe dıvê me zanibe dıvê we zanibe dıvê wan zanibe	ku mın zanibe ku te zanibe ku wi zanibe ku me zanibe ku we zanibe ku wan zanibe	
me ne zanibe	bla me ne zanibe	dıvê we ne zanibe	ku wan ne zanibe	
mın bızaniya te bızaniya wi bızaniya me bızaniya we bızaniya wan bızaniya	bla mın bızaniya bla te bızaniya bla wê bızaniya bla me bızaniya bla we bızaniya bla wan bızaniya	dıvê mın bızaniya dıvê te bızaniya dıvê wê bızaniya dıvê me bızaniya dıvê we bızaniya dıvê wan bızaniya	ku mın bızaniya ku te bızaniya ku wi bızaniya ku me bızaniya ku we bızaniya ku wan bızaniya	
mın nezaniya	bla me nezaniya	dıvê we nezaniya	ku wan nezaniya	
mın zanibûya te zanibûya wê zanibûya me zanibûya we zanibûya wan zanibûya	bla mın zanibûya bla te zanibûya bla wi zanibûya bla me zanibûya bla we zanibûya bla wan zanibûya	dıvê mın zanibûya dıvê te zanibûya dıvê wê zanibûya dıvê me zanibûya dıvê we zanibûya dıvê wan zanibûya	ku mın zanibûya ku te zanibûya ku wê zanibûya ku me zanibûya ku we zanibûya ku wan zanibûya	
me ne zanibûya	bla we ne zanibûya	dıvê te ne zanibûya	ku wan ne zanibûya	

Institut kurde de Paris

WANE XXVIII

BÛN

179.Lêkera bûn: Lêkera bûn, jı navdêr (nav, cinavk, rengdêrû hoker) an tê kêşan. Bı navdêranve qertıfandına qertaflêker (ın, ım, i, ın, bi, be, bû) an pêktê.

Lêkera bûn, dema fıreh, çirokiya têdayi, çirokiya dûdar, dema bê, çirokiya dema bê, raweyên daxwazi û çirokiyên wan jê tên kêşan. Mina:

Ez rındım, ez rındbûm, ez rındbûme, ezê rındbım
Ezê rındbûma, ez rındbım, ez rınbûma, bla ez rındbım
Bla ez rındbûmâ, dıvê ez rındbım, dıvê ez rındbûma
Heke ez rındbım, eger ez rındbûma, rındbe, rındbın

Nasina lêkera bûn jı lêkera hevdudaniya ariker ku bı lêkera "bû" pêktê. Emê jı kşandına lêkera "bûn" ra, lêkera "bûn" û jı lêkera arikera lêkera "bû" (lı mjara 98 an bınêrin) ra, lêkera" bûyin bıbêjın.

Dıvê çawan dı peyıvinêda lêkara bûn jı lêkera bûyinê tê nasin, ew ji bı drêj krına kita dawi pêktê, wsan geleke dı nvisandınêda ji bête nasin. Wekok: Ez rındbûm, ev kêşan çirokiya boriya têdayi ya lêkara bûne, yan pêşkêş krına drûva tentêla xwe ya lêkera bûyinêye? Gava lêkera "bû" bı navdêrve hate danin, çirokiya

Institut Kurde de Paris

têdayiye, yani kêşana lêkera bûne. Eger lêkera "bû" jı navdêrê eda hate danin, nmandına drûva tentêlêye. Dı hınde hevokanda, jıbo nmandına tentêlê, lêkera "bû" eda lı pêşi navdêr tê danin. Mina: Ez bûm karbıdest. Ez bûm serok, tu bûy pêşmerge lê ev ne tevayiye. Bêweku ez bûm serok, ez bûm şoreşker, ez bûm şvan dıbe lê ez bûm zengin, ez bûm rınd, ez bûm zer nabe.

Hınde herêm, kêşana lêkera bûn, dı ciyê "bû" da "û" teni bıkartının:

Bû	**û**
Rındbû	rındû
Darbû	darû
Nexweşbû	nexweşû
Sorbû	sorû
Karbıdestbû	karbıdestû

Dı destê wêda tvıngbû, dı destê wida tvıngû û êd.

Kêşana lekera bûn, raweyên pêşkeri mina pêşkeriyan û raweyên daxwazi ji mina daxwaziyan têne kşandın. yani kêşana lêkera bûn, bê guhertın mina lêkerên edetine, yan dı drûva raweyên pêşkeri yan ji dı drûva raweyên daxwazidanın. Hemi rawe ji heryek dı daneka xweda hatıne vekıtandın. Jıber vê yekê êdi vekıtandın naxwaze, teni tablo dê bêne danin.

Neyini: Heke pêxısti tunebe, yani pêxısti kırde pxwe be lı pêşi û heke pêxısti hebe lı pê kırde eda tê danin:

Ne ezım   ez ne karbıdestım,   ez ne rındım
Ne ezbûm ez ne karbıdestbûm ez ne rındbûm
Bla ne ezbûma bla ez ne karbıdestbûma

RAWEYÊN PÊŞKERİ
180. DEMA FREH:

Ezım	ez qencım	ez karkerım
Tuyi	tu qenci	tu karkeri
Ewe	ew qence	ew karkere
Emın	em qencın	em karkerın
Hûnın	hûn qencın	hûn karkerın

Institut kurde de Paris

Ewın	ew qencın	ew karkerın
Neyini		
Ne ezım	ez ne qencım	ez ne karkerım
Ne tuyi	tu ne rındi	tu ne pêşmergeyi

Hınde hêrêm neyiniyê bı vi ewayi bıkartinın:

Ez nınım	ez qenc nınım	ez karker nınım
Tu nıni	tu rınd nıni	tu pêşmerge nıni

Balakêş: Çawan pêşmergeme, spehime dıbe wsan ji pêşmergeyım, spehiyım ji dıbe û herdu ji jı hêmana zmên tên.

Balakêş: Praniya yekan û dudan teni danina cinavkan peywıstıye. Lewra yên dında qertaflêker, cinavkan ji dınıminın. Mina:

Qencım, qenci, qence, qencın, başım, başi, başe, başın

Dı devoka Buhtida praniya yekem ji danina cinavkê naxwaze Lewra qertaflêkera "in" cinavkê ji dınımine. Mina:

Rınd<u>in</u>, baş<u>in</u>, pêşmergey<u>in</u>, mêr<u>in</u>, jn<u>in</u>, şoreşker<u>in</u>

Dı vırda jıbo ne şewışinê em cinavkan ji gişk datinın.

181. ÇİROKİYA DEMA BORİYA TÊDAYİ:

Ezbûm	ez rındbûm	ez pêşmergebûm
Tubûy	tu rındbûy	tu pêşmergebûy
Ewbû	ew pêşmergebû	ew rındbû
Embûn	em rındbûn	em pêşmergebûn
Ewbûn	ew rındbûn	ew peşmergebûn
Hûnbûn	hûn pêşmergebûn	hûn rındbûn
Neyini		
Ne embûn	em ne gerdobûn	em ne bazırganbûn
Ne hûnbûn	hûn ne dewlemendbûn	hûn ne xzanbûn
Ne ewbûn	ew ne zarobûn	ew ne keçbûn

182. ÇİROKİYA DEMA BORİYA DÛDAR:

Ezbûme	ez pçûkbûme	ez xortbûme
Tubûyi	tu pçûkbûyi	tu xortbûyi
Ewbûye	ew pçûkbûye	ew xortbûye

Embûne	em pçûkbûne	em xortbûne
Hûnbûne	hûn pçûkbûne	hûn xortbûne
Ewbûne	ew pçûkbûne	ew xortbûne
Neyini		
Ne ezbûme	ez ne mjokerbûme	ez ne suxtebûme
Ne tubûyi	tu ne mjokerbûyi	tu ne suxtebûyi
Ne ewbûye	ew ne mjokerbûye	ew ne suxtebûye

183. DEMA BÊ:

Dê ezbım	ezê palebım	ezê serokbım
Dê tubi	tuyê palebi	tuyê serokbi
Dê ewbe	ewê palebe	ewê serokbe
Dê embın	emê palebın	emê serokbın
Dê hûnbın	hûnê palebın	hûnê serokbın
Dê ewbın	ewê palebın	ewê serokbın
Neyini		
Dê ne ezbım	ezê ne betalbım	ezê ne valabım
Dê ne tubi	tuyê ne betalbi	tuyê ne valabi
Dê ne ewbe	ewê ne betalbe	ewê ne valabe

Ezêbım, tuyêbi, ewêbe ewêbıt ewêbıtın û ez dê qencbım, tu dê qencbi, ew dê qencbe ji têne bıkaranin.

Balakêş: Ew rengdêrên ku bı daçeka neyini bûne rengdêr, daçek û navdêr bı heve tên danin. Mina:

Neqenc axayê neqenc	nexweş keçıka nexweş
Nemêr mêrê nemêr	nesazi lêkera nesazi

184. ÇİROKİYA DEMA BÊ:

Ezêbûma	ezê cotkarbûma	ezê xotaxbûma
Tuyêbûya	tuyê cotkarbûya	tuyê xotaxbûya
Ewêbûya	ewê cotkarbûya	ewê xotaxbûya
Emêbûna	emê cotkarbûna	emê xotaxbûna
Hûnêbûna	hûnê cotkarbûna	hûnê xotaxbûna
Ewêbûna	ewê cotkarbûna	ewê xotaxbûna

Institut kurde de Paris

Neyini

Dê ne ezbûma	ezê ne şvanbûma	ezê ne gavanbûma
Dê ne hûnbûna	hûnê ne şvanbûna	hûnê ne gavanbûna
Dê ne ewbûna	ewê ne şvanbûna	ewê ne gavanbûna

ŞERTİYÊN PÊŞKERİ

Şertiyên raweyên pêşkeri: Ev şerti, teni cda danina daçekek jı daçekên şerti (er, ger, wer, eger, heke, heker, ku) lı pêşi lêkeran tê hmatê. Mina:

Heke ezım, eger tuyi, er ewe, wer emın, ku hûnın

Eger ezbûm, heke tubûy, er ewbû, wer embûn, ku ewbûn

Zêde ser sekının naxwaze. Lewra raweyên pêşkeri hatıbûn danin, ev ji şertiyên wanın.

RAWEYÊN DAXWAZİ

185. RAWEYA FERMANİ:

Be qencbe	karkerbe	pêşmergebe
Bın qencbın	karkerbın	pêşmergebın

186. RAWEYA XWESTINİ:

Ezbım	ez gemasbım	ez maldarbım
Tubi	tu gemasbi	tu maldarbi
Ewbe	ew gemasbe	ew maldarbe
Embın	em gemasbın	em maldarbın
Hûnbın	hûn gemasbın	hûn maldarbın
Ewbın	ew gemasbın	ew maldarbın
Neyini		
Ne ezbım	ez ne kardarbım	ez ne nviskarbım
Ne embın	em ne kardarbın	em ne nviskarbın
Ne hûnbın	hûn ne kardarbın	hûn ne nviskarbın

Balakêş: Gava kırde ne cinavkbe, geleke "t, tın" ek bı dawiya lêkera yekaniya sısêyanve bête qertıfandın. Mina:

Institut kurde de Paris

Bıt bıtın	qencbıt	qencbıtın

Bı vi ewayi kêşana sısêyan jı fermani çêtır tê nasin.

186. A. ÇİROKİYA XWESTINİ:

Ezbûma	ez xwendevanbûma	ez mezınbûma
Tubûya	tu xwendevanbûya	tu mezın bûya
Ewbûya	ew xwendevanbûya	ew mezınbûya
Embûna	em xwendevanbûna	em mezınbûna
Hûnbûna	hûn mezınbûna	hûn xwendavanbûna
Ewbûna	ew mezınbûna	ew xwendevanbûna
Neyini		
Ne embûna	em ne xeşimbûna	em ne xeradbûna
Ne hûnbûna	hûn ne xeşimbûna	hûn ne xeradbûna
Ne ewbûna	ew ne xeşimbûna	ew ne xeradbûna

Jı wan berxan yek ji ezbûma xwezi. **(Kemal Badıllı)**

187. RAWEYA BLANİ:

Bla ezbım	bla ez bedewbım	bla ez mêrbım
Bla tubi	bla tu bedewbi	bla tu mêrbi
Bla ewbe	bla ew mêrbe	bla ew bedewbe
Bla embın	bla em bedewbın	bla em mêrbın
Bla hûnbın	bla hûn bedewbın	bla hûn mêrbın
Bla ewbın	bla ew bedewbın	bla ew mêrbın
Neyini		
Bla ne ezbım	bla ez ne jınbım	bla ez ne duhtbım
Bla ne tubi	bla tu ne jınbi	bla tu ne duhtbi
Bla ne ewbe	bla ew ne jınbe	bla ew ne duhtbe

188. ÇİROKİYA BLANİ:

Bla ezbûma	bla ez şengbûma	bla ez başbûma
Bla tubûya	bla tu şengbûya	bla tu başbûya

Bla ewbûya	bla ew şengbûya	bla ew başbûya
Bla embûna	bla em şengbûna	bla em başbûna
Bla hûnbûna	bla hûn şengbûna	bla hûn başbûna
Bla ewbûna	bla ew şengbûna	bla ew başbûna
Neyini		
Bla ne embûna	bla em ne kurbûna	bla em ne keçbûna
Bla ne ewbûna	bla ew ne kurbûna	bla ew ne keçbûna
Bla ne tubûya	bla tu ne kurbûya	bla tu ne keçbûya

189. RAWEYA VÊNİ:

Dıvê ezbım	dıvê ez jirbım	dıvê ez mirbım
Dıvê ne tubi	goti tu jirbi	dıvê tu mirbi
Dıvê ewbe	dıvê ew jirbe	dıvê ew mirbe
Dıvê embın	goti em jirbın	goti em mirbın
Goti hûnbın	goti hûn jirbın	goti hûn mirbın
Goti ewbın	goti ew jirbın	goti ew mirbın
Neyini		
Dıvê ne ezbım	dıvê ez ne jirbım	dıvê ez ne mirbım
Goti ne tubi	goti tu ne jirbi	goti tu ne mirbi
Dıvê ne ewbe	dıvê ew ne jirbe	dıvê ew ne mirbe

190. ÇİROKİYA VÊNİ:

Dıvê ezbûma	dıvê ez şêrbûma	dıvê ez zirbûma
Goti tubûya	goti tu şêrbûya	goti tu zirbûya
Goti ewbûya	goti ew şêrbûya	goti ew zirbûya
Goti embûne	goti em şêrbûna	goti em zirbûna
Dıvê hûnbûna	dıvê hûn şêrbûna	dıvê hûn zirbûna
Dıvê ewbûna	dıvê ew şêrbûna	dıvê ew zirbûna

Neyini

Dıvê ne embûna	dıvê em ne kalbûna
Dıvê ne hûnbûna	dıvê hûn ne kalbûna
Dıvê ne ewbûna	dıvê ew ne kalbûna

Çirokiya xwestıni, blani û vêni: Karkerba, karkerbûwa, bla karker-

Institut kurde de Paris

ba, bla karkerbûwa, bla karkerbûwan, geleke karkerba, geleke karkerbûwa, dıvê karkerbûwan ji têne bıkaranin.

191. RAWEYA ŞERT-DAXWAZ:

Eger ezbım	eger ez merdbım	eger ez pêşmergebım
Heke tubi	heke tu merdbi	heke tu pêşmergebi
Heke ewbe	heke ew merdbe	heke ew pêşmergebe
Eger embın	eger em merdbın	eger em pêşmergebın
Eger hûnbın	eger hûn merdbın	eger hûn pêşmergebın
Heke ewbın	heke ew merdbın	heke ew pêşmergebın
Neyini		
Ger ne ezbım	er ez ne melabım	ger ez ne axabım
Ku ne tubi	ku tu ne melabi	eger tu ne axabi
Er ne ewbe	er ew ne melabe	eger ew ne axabe

192. ÇİROKİYA ŞERT-DAXWAZ:

Heke ezbûma	eger ez wezabûma	eger ez jarbûma
Eger tubûya	heke tu wezabûya	heke tu jarbûya
Heke ewbûya	heke ew wezabûya	heke ew jarbûya
Eger embûna	eger em wezabûna	eger jarbûna
Ger hûnbûna	ger hûn wezabûna	ger hûn jarbûna
Wer ewbûna	wer ew wezabûna	wer ew jarbûna
Neyini		
Er ne ezbûma	ku ez ne zanabûma	er ez ne candarbûma
Ku ne tubûya	ku tu ne zanabûya	ku tu ne candarbûya
Er ne ewbûya	er ew ne zanabûya	er ew ne candarbûya

Heke qencba, heke qencban, heke qencbûwa, heke qencbûwan ji têne bıkaranin.

Balakêş: Jı lêkera bûn sê navdêr hatın kşandın. Dıvê bête zanin ku çqas navdêrên me hene gişk bı van qaydan têne kşandın.

Mın jı jinê daxwaz gula sor û geşe
Lê kerê reş bırçiye armanc û daxwaz kelbeşe

Institut kurde de Paris

Tım jı dêmên sorguli ez rûgeş û dılxweş dıbım
Ah û nalin mın jı tir û awêrên çavên reşe
Ger dıvê cejnêde carek lebşeker maçek bıdi
Tême govend û sema pır şad û cejna mın xweşe
Mın dema destê xwe dayê awêrek da dıl revayê
Dıl kete nav lerz û tayê badexwer û serxweşe

(Cigerxwin)

Institut kurde de Paris

WANE XXIX

HEBÛN

193. Kşandına lêkera hebûn: Ev lêker jı lêkera heyin "he" û jı qertaflêkeran pêktê.

Bı heve danina "he" û qertaflêkerek, lêkera hebûn tê hmatê.

Hêmana lêkera hebûn bı têgıha dema frehe. Çirokiya boriya têdayi û dûdar, dema bê û çirokiya wê, raweya fermani, raweyên daxwazi û çirokiyên wan ji têne kşandın.

Dı tentêla neyinida, daçeka neyini "he" yê têxe û xwe lı ciyê wê datine û heyini dıbe neyini:

Mın heye, mın neye, mın tuneye
Mın hebû, mın nebû, mın tunebû
Mın drav hebû, mın drav nebû
Mın drav tunebû...

Çawan lı daneka ahengiya lêkeranda hatıbû ditın ku dı lêkera hebûnda ahengiya lêker bı serveraye. (lı daneka 126 an bınêrın) Yani yekani û praniya serve bı lêkeran tê zanin:

Mın tvıng heye	mın tvıng hene
Mın xani heye	mın xani hene

Institut kurde de Paris

194. Dema freh:

Mın heye	mın pırtûk heye	mın pırtûk hene
Te heye	te pırtûk heye	te pırtûk hene
Wi heye	wê pırtûk heye	wi pırtûk hene
Me heye	me pırtûk heye	me pırtûk hene
We heye	we pırtûk heye	we pırtûk hene
Wan heye	wan pırtûk heye	wan pırtûk hene
Neyini		
Mı tuneye	mın pırtûk tuneye	mın pırtûk tunene

Dı neyini da, çawan lı jorin ji dıxwıyê, lı pêşi daçeka neyini "tu" yek bête danin çêtıre. Dı hınde herêmanda: Mın niye, mın pırtûk niye, mın nine, mın pırtûk nine. Serve prani ji. Mın ninın, mın pırtûk ninın tê bıkaranin û mın henın, mı neyın ji têne xebıtandın

- -

Go mın du kunk heyın dı mesûm
Bê bab û yetim û jar û mehrûm (**Ehmedê Xani**)

Mafê mrofên neteweyê bındest tune ku bendek jı bendên burjuwayê netewê serdest tercih bıkın

195. ÇÎROKÎYA DEMA BORÎYA TÊDAYÎ:

Mın hebû	mın dewlet hebû	mın dbıstan hebû
Te hebû	te dewlet hebû	te dbıstan hebû
Wê hebû	wê dewlet hebû	wê dbıstan hebû
Me hebû	me dewlet hebû	me dbıstan hebû
We hebû	we dewlet hebû	we dbıstan hebû
Wan hebû	wan dewlet hebû	wan dbıstan hebû
Prani		
Mın hebûn	mın dewlet hebûn	mın dbıstan hebûn
Neyini		
Mın nebû	mın dewlet nebû	mın dbıstan nebûn

Institut kurde de Paris

196. ÇİROKİYA DEMA BORİYA DÛDAR:

Mın hebûye	mın welet hebûye	mın zevi hebûye
Te hebûye	te welat hebûye	te zevi hebûye
Wê hebûye	wi welat hebûye	wê zevi hebûye
Me hebûye	me welat hebûye	me zevi hebûye
We hebûye	we welat hebûye	we zevi hebûye
Wan hebûye	wan welat hebûye	wan zevi hebûye
Prani		
Te hebûne	te welat hebûne	te zevi hebûne
Neyini		
Te nebûye	te welat nebûye	te zevi nebûne

197. DEMA BÊ:

Mınê hebe	mınê zman hebe	mınê stran hebe
Teyê hebe	teyê zman hebe	teyê stran hebe
Wêyê hebe	wiyê zman hebe	wêyê stran hebe
Meyê hebe	meyê zman hebe	meyê stran hebe
Weyê hebe	weyê zman hebe	weyê stran hebe
Wanê hebe	wanê zman hebe	wanê stran hebe
Prani		
Mınê hebın	mınê zman hebın	mınê stran hebın
Neyini		
Wêyê nebe	wiyê zman nebe	wêyê stran nebın

198. ÇİROKİYA DEMA BÊ

Mınê hebûya	mınê çiya hebûya	mınê zozan hebûya
Teyê hebûya	teyê zozan hebûya	teyê çiya hebûya
Wêyê hebûya	wiyê çiya hebûya	wêyê zozan hebûya
Meyê hebûya	meyê çiya hebûya	meyê zozan hebûya
Weyê hebûya	weyê zozan hebûya	weyê çiya hebûya
Wanê hebûya	wanê çiya hebûya	wanê zozan hebûya

Institut kurde de Paris

Prani

Meyê hebûna	meyê çiya hebûna	meyê zozan hebûna

Neyini

Meyê nebûya	meyê çiya nebûya	meyê zozan nebûya

Şertiyen raweyên pêşkeri, lı pêşi kêşanan eda danina daçekek jı daçekên şerti pêktên. Mina: Ku mın heye, heke mın hebû, er mın hebûye, eger mınê hebe, ger dê mın hebûya...

RAWEYÊN DAXWAZİ

199. Raweya fermani: Hebe, hebın. Neyini: Tunebe, tunebın...

200. RAWEYA XWESTINİ:

Mın hebe	mın pergal hebe	mın lêzım hebe
Te hebe	te pergal hebe	te lêzım hebe
Wê hebe	wê pergal hebe	wi lêzım hebe
Me hebe	me pergal hebe	me lêzım hebe
We hebe	we pergal hebe	we lêzım hebe
Wan hebe	wan pergal hebe	wan lêzım hebe
Prani		
We hebın	we pergal hebın	we lêzım hebın
Neyini		
We nebe	we pergal nebe	we lêzım nebın

Mın hebın sêsed hezar ezman û dev
Yek demê xafıl neminım roj û şev (Ehmedê Bateyi)

201. ÇİROKİYA XWESTINİ:

Mın hebûya	mın pez hebûya	mın bêrivan hebûya
Te hebûya	te pez hebûya	te bêrivan hebûya
Wê hebûya	wê pez hebûya	wi bêrivan hebûya
Me hebûya	me pez hebûya	me bêrivan hebûya
We hebûya	we pez hebûya	we bêrivan hebûya
Wan hebûya	wan pez hebûya	wan bêrivan hebûya

Institut kurde de Paris

Prani û neyini:

Wan hebûna	wan pez hebûna	wan lêzım nebûna

202. RAWEYA BLANİ:

Bla mın hebe	bla mın şûr hebe	bla mın tir hebe
Bla te hebe	bla te şûr hebe	bla te tir hebe
Bla wê hebe	bla wê şûr hebe	bla wi tir hebe
Bla me hebe	bla me şûr hebe	bla me tir hebe
Bla we hebe	bla we şûr hebe	bla we tir hebe
Bla wan hebe	bla wan şûr hebe	bla wan tir hebe
Prani û neyini:		
Bla mın hebın	bla mın şûr hebın	bla mın tir tunebın

203. ÇİROKİYA BLANİ:

Bla mın hebûya	bla mın kêr hebûya	bla mın rım hebûya
Bla te hebûya	bla te kêr hebûya	bla te rım hebûya
Bla wê hebûya	bla wi rım hebûya	bla wê kêr hebûya
Bla me hebûya	bla me kêr hebûya	bla me rım hebûya
Bla we hebûya	bla we kêr hebûya	bla we rım hebûya
Bla wan hebûya	bla wan kêr hebûya	bla wan rım hebûya
Prani û neyini:		
Bla te hebûna	bla te kêr hebûna	bla te rım nebûna

204. RAWEYA VÊNİ:

Dıvê mın hebe	dıvê mın sêv hebe	dıvê mın lêv hebe
Dıvê te hebe	dıvê te sêv hebe	dıvê te lêv hebe
Goti wê hebe	goti wi sêv hebe	goti wê lêv hebe
Goti me hebe	goti me sêv hebe	goti me lêv hebe
Goti we hebe	goti we sêv hebe	goti we lêv hebe
Dıvê wan hebe	dıvê wan sêv hebe	dıvê wan lêv hebe
Prani û neyini:		
Dıvê wê hebın	dıvê wi sêv hebın	dıvê wê lêv nebın

Institut kurde de Paris

205. ÇİROKİYA VÊNİ:

Dıvê mın hebûya	dıvê mın çav hebûya	dıvê mın nav hebûya
Goti te hebûya	goti te çav hebûya	goti te nav hebûya
Goti wê hebûya	goti wi çav hebûya	goti wê nav hebûya
Dıvê me hebûya	dıvê me çav hebûya	dıvê me nav hebûya
Goti we hebûya	goti we çav hebuya	goti we nav hebûya
Dıvê wan hebûya	dıvê wan çav hebûya	dıvê wan nav hebûya
Prani û neyini:		
Dıvê me hebûna	dıvê me çav hebûna	dıvê me nav nebûna

206. RAWEYA ŞERT-DAXWAZ:

Heke mın hebe	heke mın nan hebe	heke mın dan hebe
Heke te hebe	heke te nan hebe	heke te dan hebe
Eger wê hebe	eger wi nan hebe	eger wê dan hebe
Eger me hebe	eger me nan hebe	eger me dan hebe
Eger we hebe	eger we nan hebe	eger we dan hebe
Ger wan hebe	ger wan nan hebe	wer wan dan hebe
Prani û neyini:		
Eger me hebın	eger me nan hebın	eger me dan nebın

Institut Kurde de Paris

207. ÇİROKİYA ŞERT-DAXWAZ:

Eger mın hebûya	eger mın mêr hebûya	ger mın şêr hebûya
Eger te hebûya	eger te mêr hebûya	ger te şêr hebûya
Heke wê hebûya	heke wê mêr hebûya	heke wi şêr hebûya
Heke me hebûya	heke me mêr hebûya	heke me şêr hebûya
Heke we hebûya	heke we mêr hebûya	heke we şêr hebûya
Ger wan hebûya	ger wan mêr hebûya	wer wan şêr hebûya
Prani û neyini:		
Ger we hebûna	ger we mêr hebûna	ger we şêr tunebûna

Ger dê hebûya me ji xwıdanek
Ali keremek letife danek **(Ehmedê Xani)**

208. Gava lêkera hebûn mina lêkera bûn bête bıkaranin, jı hebûnê derdıkeve û dıbe "bûn". Cinavkên desta ez û qertaflêkeran dıgırın û mina lêkera "bûn" tê kêşan:

Ez heme	ez hebûm	ezê hebım	bla ez hebım
Tu heyi	tu hebûy	tuyê hebiy	bla tu hebiy
Ew heye	ew hebû	ewê hebe	bla ew hebe
Em hene	em hebûn	emê hebın	bla em hebın
Hûn hene	hûn hebûn	hûnê hebın	bla hûn hebın
Ew hene	ew hebûn	ewê hebın	bla ew hebın
Neyini			
Ez tuneme	tu tuneyi	ewê tunebın	bla ew tunebın

Institut kurde de Paris

WANE XXX

DI LÊKERANDA PIRSYARİ

209. Dı lêkeranda pırsyari: Jı bıl pırsina bı hokerên pırsiyari, dı zmanê meda graniya peyıvina pırsyari bı tonaja dengan pêktê. Yani bı drêj krına kita dawi pırsin tê hmatê. Xwezay dı nvisandınêda çarcki wha tune. Pzo danina işareta pırsiyari (?) lı dawiya lêker û hevokan, lêker yan ji hevok dıbın pırsiyari. Mina: Hûn bıçıne şerê azadi? Dê tu bıkari rêzıman bınıvisi? Tu dıkari nvisandına Kurdi bıxwini?

Hınde ewayên peyıvin û nvisandınê ji bı daçekan pêktên. Xwezay gava bı daçekan ji bête pırsin, disa dı nvisandınêda lı dawiya lêker û hevokan, geleke işareta pırsê bête danin.

Jıbo pırsinê hınde daçekên pırsiyari evın: Ma, qey, qay, gelo. "Ma" bı sere xwe ji tê bıkaranin. Mina: Ma tu naçi bajêr? Bı "qey, gelo" ve ji tê danin û bı hevra dıbın daçekek. Mina: Maqey tu naçi nav karkeran? Magelo refa perçıqi bı xwe hesaye?

Daçekên pırsiyari eda lı pêşi lêkeran, heta lı pêşi kırdan têne danin .

Graniya xebata "gelo" jıbo diyar krına kovanane. Mina: Gelo ezê rızgariya gel û karkeran bıbinım? Gelo ezê jı vê zındanê bıfılıtım? Gelo dermanê şiyar bûna gel û karkeran çıye? Ev hevokên

han dıdın diyar krın ku gotox dı kovan rızgariya gel û karkeran, flıtina jı zındanê û peyda krına dermanê şiyar bûna gel û karkerandaye.

Xwezay "gelo" dı her ciyêda teni kovanan diyar nake. Dı hınde ciyanda, weki daçekên dın ji pırsan pêktine.

- -

Gelo disa bıbinım ez çrayê wesletê hılbıt
Bısojım şubhê perwanê dı ber wê nar û şewqêda
Lı kelbê asêtanê xwe ne pırsi qet hebib carek
Gelo nayine birê em dı vê nêçir û ravêda

(Melayê Cziri)

Daçeka "ma, qey, qay" ji lêker û hevokan têxın tentêla pırsiyari. Mina: Ezê bıçım, ma tu nayê? Qey te nan xwarıye? Maqey fravina me ne xweş bû?

Bı hınde daçekên dın ji pırsiyari pêktên, dê lı daneka daçekên pırsyari û hevokanda bên dabaş krın.

- -

Agır û pêta evinê, ıllela dax û brinê
Xweş dıbıt ma ew bıdinê? Şerbeta lêvan mefaye (Melayê Cziri)
Gelo karê te çıye? Mrov entellektuelbe û dervcyê welat ji lı ser siyaset mjûl nebe, ew çı tışte? Maqey tu ne Kurdi? (Dr. Şvan)
Gelo Demırel jı wi ne pırsibû, yan jı wira ne gotıbû ku kijan weziryê bıde wi? (Roja welat)

HOKER

210. Hoker: Hoker navê wan peyvên çqasi, çawani, cıh, pırs û demên ku têne pêşi lêkeranın û bzava lêkeran kıfş dıkın. Çawan teni serê xwe rengdêr nebe. Wsan bı serê xwe teni hoker ji nayê ponıjin. Yani hoker ji mina rengdêran , gava bı tena xwebe, jı nav zêdetır ne tıştekc. Rengdêr navdêran reng û kıfş dıkın. Hoker ji henkina lêkeran teyin dıke û lepata wan dı nav dem, ci, çawanida kıfş dıkın. Bı ewayek dın bıbêjin hoker rengdêrên lêkeranın. Her çqas hoker dıkevıne pêşi navdêran û wan reng û kıfş dıkın ji disa têgıha

Institut kurde de Paris

wan bı lêkeranve grêdayine. Her hoker nave lê her nav ne hokere. Ew daçekên hokerane tên bıkaranin, jı hokeran têne hejmartın.

Dı zmanê mede hoker, nav û daçekên ku hokerane têne bıkaranin gelekın. Tesbita gişkan hım pır zore û hım ji hecma pırtûka me hılnade. Teni emê qaydê gişkan daynın û hemi celeban ji çendek jê bınıvisinın.

Hoker, yan bı serêxwe yan ji bı navdêrekra cda lı pêşi lêkeran têne danin, çawani, çendani, pırsiyari, û ciyan teyin û jı raweyên pêşkeri çêtır demên lêkeran kıfş û zelal dıkın.

Hoker dıbın pênc bır:

A- Hokerên demin
B- Hokerên chin
C- Hokerên çawani
D- Hokerên çqasi
E- Hokerên pırsiyari

211. A- Hokerên demin: Bûyinê yan ji krınê dı nav demanda nişan dıdın:

Dho ez çûme dıbıstanê, iro ji ezê bıçımê, Par bavo ez şandım têkoşera gelêr, isal ji ez dıponıjım.

Dho, iro, par û isal hokerın. Lewra bzava lêkeran dı demanda nmandıne.

Ewayek di bıbêjin, bersıv dana pırsa "kengi" hokerên demin têne nasin mina, kengi? dho, iro, par û isal.

Hnek jı hokerên demin:

Baharê	êvarê	nivro	sbê
Beri	ew roj	nıjkeve	sıfte
Betırpêr	havinê	par	şevadi
Betırpêrar	hema	pêr	şevadın
Dan	hêj, hêjan	pêrar	şevêdi
Dana sbê	hınga, hıngo	paşi, paşve	şevê, pşev
Dana êvarê	hıngorê	payizê	şevin
Demadi	iro	pêşda	zvıstanê
Dewra beri	isal	rojê	zû
Dho	mêj, mêjve	saledi	zûda
Dreng	nho, nha	saltıredi	zûve

Institut kurde de Paris

212. B- Hokerên chin: Ev hoker ci û derên bûyin û krınên lêkeran teyin dıkın. Ango berokên lêkera nişan dıdın. Mina:

Ez derketım derve. Tu berbımal dıçi, av serejêr dıçe .
Mın lı dormedarê koledar û mjokeran xweş dıgere.

Derve, berbımal, serejêr û dormedar hokerın, ci û berokên lêkeran nişan dıdın

Bersıv dana pırsa "lı kû, kûve" hokerên chin têne nasin. mina:

Ez derketım, lı kû? Bersıv: derve

Çendek jı hokerên chin:

Ali	Domedar	Kêlek	Rast
Bal	dor	navber	rastbırast
Berane	dormedar	navê	rex
Berjêr	dû	neqeb	serbıser
Bındest	dûr	nık	seranser
Berwar	ervaz	nşiv, nşov	serdest
Berjêr	hawêr	nivhend	serejêr
Bın	herder	nizık, nêzik	seropa
Cem	hêl	paş	tenışt
Çarnıkar	hundır	pêş	xar
Der, derek	jêr	pêşber	vır
Derve	jor	pêve.	wır

Hınde hoker hım têgıha "chin" û hım ji têgıha "demin" têda hene. Mina:

Dûr, nizık, paşi, pêşi...

Ew ji jı têgıha herıkina hevoka tê zanin.

213. C- Hokerên çawani: Ev hoker drûv û tentêla lêkeran nişan dıdın. Yani çawan bûye û çawan hatıye krın kıfş dıkın. Mina:

Reşo bı lez çû, Azad pırtûkan xweş dıxwine
Rêzan bı bayêbez xwe nivê şevê ghande şoreşê

Lez, xweş, bayêbez hokerın û çawaniya lêkeran nişan dıdın.

Jıbo nasina hokera çawani, pırsa "çawan" tê krın, bersıv hokera çawaniye. Mina: Çawan çû? Lez. Çawan xwend? xweş...

Hnek jı hokerên çawani:

Baş	freh	Qenc	teng
Bıh	gran	qewi	xweş

Çê, çêtır	hêdi	rınd	xrab
Drıst	hêdika	sıst	wha
Drêj	jêhati	sık	wsan, wlo
Eware	kurt	svık	zor

Dıvê bête zanin, navdêr dema navan reng û kıfş bıkın "rengdêr" ın û gava bzava lêkeran teyin bıkın "hoker" ın. Wekok:

Rengdêr	**Hoker**
Zerifa rınd xwend	Zerifê rınd xwend
Reşoyê gran hat	Reşo gran hat
Barana payizê bari	Baran payizê bari
Temoyê bıçek çû şer	Temo bıçek çû şer
Natorvanê rojê hat	Natorvan roj hat
Azad darê erzan kri	Azad dar erzan kri

Balakêş: Daçeka "tır" têgıha hokeran zêdedar dıke, "tırtır" duçendi dıke û "trin" ji hedê dawi dıde. Mina:

Kêm, kêmtır, kêmtırtır, kemtırin
Zêde, zêdetır, zêdetırtır, zêdetırin

214. D- Hokerên çqasi (çendani): Ev hoker Pır û hındıki, yani çendaniya bzava lêkeran kıfş û teyin dıkın. Mina:

Gelek caran jı mınra gotıbûn ku baweriya xwe bı şêx û axan meyne, hındık ji be dıwanda qenc demakevın.

Lewra ew pır malê sêwi, xzan û bê dest û peyan dıxwın

Gelek, hındık û pır hokerın û çendaniya bzava lêkeran nmandıne?

Jıbo nasina hokera çqasi, pırsa "çend, çqas" tê krın, bersıv hokera çqasiye. Mina: Çend car? gelek. Çqas qenc demakevın? hındıkbe ji.

Hnek jı hokerên çqasi:

Bes	hnan	hevçend	pır, pırtır
Cama	hne	hew	teni
Çendek	hındek	hewçend	zehf, zaf
Ew çend	hındekan	hewqa, hewqas	zehfcar
Gelek	hındık	kêm, kêmtır	zêde, zêdetır

Dıvê bête zanın ku hejmar ji, hokeri têne bıkaranin. Mina:

Karker şeş-şeş çûne xebetê. tu çar-çar hejmêre

Institut kurde de Paris

215. E- Hokerên pırsiyari: Ev hoker bı pırsiyari, bzava lêkera teyin dıkın. Mina:

Tu kengi xwe jı destê xwinmıjan rızgar bıki? Tu çra heta nha mayi? Te çawan kedxwerê xwe ne nasiye?

Kengi, çra û çawan hokerên pırsiyarinın.

Çendek jı hokerên pırsiyari:

Bı çı	çawan	çer	çı gav
Çanki	çend	çı dem	çma
Çra	kengi	ki	kijkan
Çto	kêjan	kijan	lı kû

Hınde hokerên pırsiyari hene ku dem û ciyan ji dınıminın. Ew hoker, jı hokerên dem û ciyan ji têne hejmartın. Mina: Kengi, lı kû.

- -

Tacdin ku dıgel bran bı meş hat
Kapên jı bo memê duşeş hat **(Ehmedê Xani)**

Institut kurde de Paris

WANE XXXI

DAÇEK

216. Daçek: Daçek bı serê xwe bê têgıhên taybetinın. Pzo gava daçek bı peyvanra bêne bıkaranin têgıh dıgının, yan ji têgıha peyvan zelal dıkın. Mina: Diyarbekır dı Diyarbekırda, Lı Diyarbekır, Jı Diyarbekır, bı Diyarbekırve. Mala mın dı Diyarbekırdaye, Ez lı Diyarbekırê rûdınım, Ez jı Diyarbekırê têm, Ez bı Diyarbekırve çûm...

Hınde, daçek, cama ciyê peyvek û hevokek dıgının û heke bı serê xwe têgıhek jar ifade bıkın ji, disa têgıha wan bı peyv û hevokanve grêdayine. Mina:

Qey tu êdi jı axanra dê pır bıxebıti? Na

Ma tu doza karker û cotkaran dıpejırini? Belê

Yani êdi ez jı axanra naxebıtım û doza karker û cotkaran ji dıpejırinım. Vaye "na, belê" daçekın û ciyê hevokên keti gırtıne.

Drûvê danina daçekan

217. Daçekên lêker çêkırox: Daçekên dı lêker çêkırmanda têne bıkaranin. Mina: Rakının, dakının, vekının û yên dı lêker kşananda têne xebıtandın, teni "bı, dı" mina bıke, dıke û neyiniyên daçek yan ji tip êxıstox, mina meke, nake, najo, navêje û neyiniyên lêkerên daçeki, mina vemeke, hılmeke, ranedıkır, venedıkır bı lêkeranve

Institut Kurde de Paris

têne danin.

Gava du daçek bı hevra bêne bıkaranin û bı daçeka "her" a daçekek, hejmarek, navdêrek, yek û du kite bên, bı heve danina wan çêtıre. Mina:

An go, ango, jı ber jıber. jı bo jıbo, yan ji yanji
Her weki Herweki, her dem herdem, her çar herçar...

Daçekên dın gişk eda têne danin.

218. Dı zmênda daçek: Dı zmanê meda daçek pırın. Şxwe mrov dıkare bêje ku zmanê Kurdi, bı daçekan tê peyıvin.

Hınde navdêr ji hene ku bı daçekane têne bıkaranin û gava navdêrek bı daçekane hate xebıtandın, jı daçekan tê hejmartın. Jıber vê yekê jı wan navdêranra ji emê daçek bıbêjın.

Celebên daçekan: Dı zmanê meda heft celeb daçek hene:

A- Daçekên lêkeri
B- Daçekên raweyi
C- Daçekên navdêri
D- Daçekên erêni û neyini
E- Daçekên pırsiyari
F- Daçekên sedemi
G- Daçekên vekıti

219. A- Daçekên lêkeri: Jı van daçekanra, daçekên lêkerçêker ji tê gotın. Lewra dı çêkırına lêkeranda têne bıkaranin:

Ba	der	lê	rê	têk
Ber	hıl	pê	rû	ve
Çê	hin	pêk	ser	vê
Da	jê	ra	tê	wer

Badan	hılkırın	pêkhatın	têketın
Berketın	hinkırın	rakırın	têkdan
Çêkırın	jêkırın	rêkırın	veketın
Dakırın	lêkırın	rûnıştın	vêketın
Derkırın	pêketın	serketın	wergırtın

Daçeka "ve" jı gişkan pırtır tê bıkaranin. Ev daçek dı gelek ciyanda bzava lêkerên tine niviyê. Mina:

Sekıni vesekıni, xebıti vexebıti, xwar vexwar
Bri vebıri, gırt vegırt, westa vewesta...

Yani tam ne sekıni, ne xebıti, ne xwar, ne bri, negırt û ne westa. Herweki sekıni, xebıti, xwar, bri, gırt û westa.

Daçekên dın ji lêkeran normal çêdıkın, hındık yan ji pır têgıhên

Institut kurde de Paris

lêkeran yên hêmani dıguherının.

Nıştıman bı çekan tê vegırtın û bı çekan tê standın (Gotına mezınan)

220. B- Daçekên raweyi: Jı vanra daçekên kêşana lêkeran ji tê gotın:

Dema nho û freh : dı
Dema bê : ê, dê, tê, wê
Raweya fermani : bı
Raweya blani : bla, bra, bera, bere
Raweya vêni : dıvê, geleke, goti
Raweyên şerti : er, wer, ger, ege, eger, heke, ku, heker.

Bı van daçekan lêker têne kşandın. (bı fermo lı raweyên pêşkeri û daxwazi bınêrın)

221. C- Daçekên navdêri: Jı vanra daçekên berin û daçekên tewanga navan ji tê gotın:

Lı pêşi navan Dı, jı, lı, bı
Dı maldame. jı mal têm, lı malım, bı malve çûm
Lı dawi navan ji
Jı wê ji dengek demeket.

222. D- Daçekên erêni û neyini:

Erêni: Bla, belê, erê, herê, hemın, şxwe
Neyini: Bê, ne, na, nı, me, no, nexêr

Bı van daçekan erêni û neyini yan ji pejırandın û ne pejırandın pêktên.

223. E- Dâçekên pırsiyari: Ev daçek ewın ku bı wan pırs têne krın:

Çanki, çawan, çer, çma, çra, çto, gelo, ka, kani
Ma, qay, qey, pra, praji, wa, weh, wey, ya

224. F- Daçekên sedemi:

Ber, da, daku, jıber, jıbo, bo, ku, seba, sedem
Ber vê yekê çû, bo mın bine, çov rakır da lêxe, ez hatım da ku tu neçi, ez jıber stemê derketım, jıbo te ani, hat ku tu ne tırsi, seba mın hat, sedem çı nayê

Institut kurde de Paris

225. G- Daçekên vekıti:

Ba, bal, belki, bes, bese, carci, cardi, cem, spas
Disa, êdi, gel, gor, gore, heçi, her, heta, şabaş
Heya, hıngi, lema, lew, lewma, lewra, manend, mina
Minanda, nık, pzo, qaşo, şubhi, şxwe, şxwıleve, teni
Tewri, weki, wha, wlo, wsa, xwezka, xwezi, xwezıl

Ba te	gel mıne	lewma xwar	şxwıleve briye
Bal mın	gor wan	lewra xwest	teni tu were
Belkê bêt	goreyê we	manendê te	tewri mezın
Bes tu weri	heçi ezım	mina şêr	weki mêran
Bese bıxwe	her camêr	minande wi	wha nabe
Carci were	heta êvarê	nık te	wlo dıbe
Cardi here	heya sbehê	pzo qedand	wsa ne rınde
Cem wêye	hıngi gayek	qaşo ne hatıye	xwezka bı mın
Disa hat	lema nayê	şubhi mın	xwezi bıkıra
Êdi nayê	lew çû	şxwe nayê	xwezıl bıhata

Spas jıbo şoreşkerê gelê Kurd, şabaş jı xwıdêra

BANEŞAN= Deng

226. Baneşan: Herçıqas baneşan jı daçekan têne hejmartın ji, jıber ku reng nadın peyvan û bı wan navdêr ji nayên kşandın, jı daçekan eda dıbın

Baneşan, gazi krın, kovan, enır, şahi û dılxweşiyan dıdın diyar krın.

227. Baneşanê gazi krınê:

Ey, geli, gdi, hey, lê, lêlê, lo, lolo, hewar
Ey camêr! Were vır, geli Kurdan rabın! Lê Zerifê!
Gdi we bıbinım! Lêlê lı mın bınêr! Lo Reşo! Lolo here
Heware! wenn arikariya gelê bındest û refa perçıqi.

Lê, lêlê jıbo mêyane. Lo, lolo jıbo nêrane. Yên dın pışkdariya herdu zayendanın. Gava lê, bête dawiya navên mêyan dıbe "ê" û gava lo, bête dawiya navên nêran dıbe "o". Mina

Zerifê, Belçımê, Xezalê, dotmamê, keçê, hevalê

Institut kurde de Paris

Azado, Hışyaro, Şevgero, pısmamo, kuro, hevalo

228. Baneşanên dılxweşi, enır û kovanan:

Ax, ay; êh, hah, hıh, of, ox, tûf, wax, wey, xweş
Ax rebenê! Ay lı mın! Eh kêfa mın hate cıh!
Hah te qenc kır! Hıh zorker neman! Of ez dêşım!
Ox dlê mın rehet bû! Tûf çı mrovek bed û qrêje!
Wax çı hate serê te! Wey lı mınê! Xweş bla webıt!

Balakêş: Gava baneşanek hate nvisandın, misoger işareta baneşani ji (!) bête nvisin.

GHANEK= Grêk

229. Ghanek: Herçqas ghanek jı hêmana daçekanın ji lê drûva xebat û peywırên wan, cdanın.

Ghanek du peyvan, du hevokan, peyv û hevokek û hevok û peyvek dıgıhinın hev û bı heve grê dıdın. Jıber vê yekê jı wanra ghanek yan ji grêk tê gotın.

Ghanekên bınyati yên xwerû:

Jı, ji, ku, lê, lo, û
Keça bedew jı mala xwe tê, ezê herme mal, tu ji hınde meywayan bıstin were. Ew kedxwera ku we dit revi çû,
Mamostek qence lê nexweşe, ezê herme gund lo tu mewe
Mın ev pırtûka rêzmani nvisand û jıbo çapandınê şand

Ghanekên bınyati yên dubare:

Carna... carne ji, çqas... ew qas ji, çawan... wsan ji
Hım... hım ji, hım... hım, ji...ji, ne...ne
Ne...ne ji, ya...ya, yan...yan ji
Carna qenc dıbe carna ji xerab. Çqas tu başi ew qas
ji bavê te. Çawan dûrbû wsan ji rêya wê ne xweşbû.
Hım ez nayêm hım ji nahêlım kes bê. Hım nastine hım
nade. Ez ji dıherım tu ji were. Ne dıkıre ne dıfıroşe
Ne tu ne brayê te. Ne tu xebatê dıki ne ji dıhewi
Ya here ya were. Yan yê mın bıgır yan ji yê xwe berde

230. Ghanekên daçeki: Hınde daçek hene ku bı ghaneki têne bıkaranin. Mina:

Dıgel, gel, lema, lewra, mina, weki
Gava mın ew dit dıgel bavê xwebû. Ew çû tu gel wi meçe
Ez hatım lema ew çû. Ew nexweşe lewra ne çû dewetê
Ew spiye mina berfê. Bla bıxebıte weki pêşmergan

Dıvê neyê jı bir krın ku hınde daçek hene ku gelek peywıran dıbinın.

Institut kurde de Paris

WANE XXXII

NIQTEŞANİ

231. Nıqteşani: Gava em dıpeyıvın, jı bona baş dane diyar krına alazi û şorên xwe, em bı ser, dest, bri û çavên xwe hınde işaretan dıdın. Dengê xwe blınd nzım, kêm zde, kurt drêj dıkın û cama ji dengê xwe dıbırın û bêhna xwe dıdın.

Dı nvisandınêda ji jı bûna bê kêmasi dane diyar krına alazi û şoran, dıvê işaret bêne danin. Vaye jı wan işaretanra nıqteşani tê gotın.

Dı nvisandın û xwendınêda, geleke herkes qenc guhê xwe bıde işaretan heker ne, alazi qenc nayên têgıhandın.

İşaretên nıqteşani evın:

Nqut, nıqte	(.)
Bêhnok	(,)
Nıqtebêhnok	(;)
Nıqtecot	(:)
Nıqtesê	(...)
Nıqtebang	(!)
Nıqtepırs	(?)
Bendık	(-)
Xêzek	(—)

Institut kurde de Paris

Dunık (")
Kevanek (())
Şê stêrk (***)

232. Nqut (.): Nqut lı dawiya hevokên tam qedandi tê danin:
Dı pêşengiya birobaweriya karkeranda, doza gelên bın dest serdıkeve.

233. Bêhnok (,): Ciyên bıkaraninên bêhnokê:

A- Lı ciyê daçeka "û" tê danin:
Roja cejna Nevrozê Azad, Reşo, Hışyar, Rındê, Fatê û Gewrê lı ber quntarê çiyê govend krın.

Çawan lı jorin ji dıxwıyê, geleke beri peyva dawi "û" bête danin.

B- Pıştê deng lê krınê tê danin:
Reşo, lı mın bınêr. Kurê mın, here Kurdıstanê

C- Gava kırde jı pêxısti dûr bıkeve, lı dawi kırde tê danin:
Temo, roja bistûpêncê meha sermewezê bı hevalanra, bı berk û çek çû şerê serxwebûnê.

D- Gava çend hevokek bı yek kırdê pêkbêt, lı dawi hevokên pêşi tê danin. Lı pêşi hevoka paşi ji "û" dıvê
Kurd baş guhdari dıkın, qenc û xraban jı hev dıqetinın, stembar û stemkaran dınasın û bıryara xwe paşi dıdın.

234. Nıqtebêhnok (;): Ciyên bıkaranina nıqtebêhnokê:

A- Lı navber wan hevokên ku bı hevra gızdarın tê danin:
Xweşmêr tving hılda çû; wsan dıxwıyê ku bûyer hene.

B- Jıbo jı hev qetandına wan komıkên peyvan ku her peyvên komıkek bı bêhnokê hatıne nvisandın tê danin:
Azad pırtûk, qelem, defter; Rındê ji selık, paçı, tûrık hebû.

235. Dı bêhnokanda hındık, dı nıqtebêhnokanda zêdetır û dı nıqtanda tam sekınandın dıxwaze.

236. Nıqtecot (:): Ciyên bıkaranina nıqtecotan:

A- Lı dawi hevokên ku vekıta wan para maye tê danin:

Institut Kurde de Paris

Mın dıvê tu wlobi: serbest û azad rûni welat.

B- Lı pêşi wan gotınên ku jı ciyek dın hatıbe hıldan tê danin:

Lenin, dı gotarên xweda: "Ew gelê ku gelek dın bıperçıqine pxwe ji ne azade" dıbêje.

C- Lı dawi wan hevokên ku pışt wan wekok hene tê danin:

Du celeb nav hene: yekani û prani.

